# HEVPEYVÎNA ÎBRAHÎM EHMET YA 1995’AN BI RÊBERTIYÊ RE

**Ev pirtûk ji aliye yekeya ziman û wergerê ve hatiye wergerandin.**

**Diroka Çapê: Çile 2015**

**Çapxaneya Azadî**

# NAVEROK


HEVPEYVÎNA ÎBRAHÎM EHMET YA 1995’AN BI RÊBERTIYÊ RE ............ 4

Vîna herî mezin tevlî nav şoreşê bû........................................... 115

Her tim alîgirê çareseriya siyasî ne ........................................... 118

# HEVPEYVÎNA ÎBRAHÎM EHMET YA 1995’AN BI RÊBERTIYÊ RE

Abdullah Ocalan: Hevalno! mêvanên me yên bi rûmet di destpêka tevgera netewe de mamosteyê ku karê mezin kirî Îbrahîm Ehmet û nivîskarê mezin Hawar’ê şoreşger di pêşberî we de silav dikim.

Di destpêka tevgera Kurd de têkoşîna PDK (Partiya Demokrata Kurdistan) weke tevgereke netewe û modern, piştî şerê cîhanê yê II. Min, heta beriya wê destpêkiribû. Balam ji ber gelek sedeman erka xwe ya mezin a destpêkê bi cî neanî. Kurdistan beriya şerê cîhanê yê II. Heta piştî şerê cîhanê yê I. Ji ber sedema hinek derfetan derbazî serdemeke din bû. Bi dawîbûna şerê cîhanê yê I. re gelek gelên bindest, bi Şoreşa Cotmehê re xwe gihandin derfetên xilasbûnê. Mirov dikara vê bilêv bike: Piştî bidawîbûna Împaratoriya Osmaniyan û şûnde, beriya hemû gelan di bin serokatiya M.

Kemal de tevgera neteweya Tirk jî di wê demê de ji Şoreşa Cotmehê gelek sûd wergirt.

Destpêkirina tevgera Kurd a Koçgirî, beriya tevgera M. Kemal tê. Di Başûrê Kurdistanê de jî tevgera ku di pêşengatiya Mahmut Berzencî de dimeşiya li hember emperyalîzma Îngilîzan destpêkir. Di vê demê de hîn M. Kemal derneketibû holê û ev navend ji Kurdan re gelek derfet dida. Lê piştî hilweşandina Împaratoriya Osmaniyan û şûnde Kurd ji holê rabûn. Dikare bê gotin ku tenê Kurd di bin yek sêwana dernekê de xwe birêxistin dikirin. Navê wê jî Cemiyeta Kurd Tealî bû. Ev, herî zêde cemiyeteke ku rewşenbîran dabû avakirin bû. Lê ev di her warî de lewaz bûn, rêxistinbûnên wan lewaz bûn; bîrdoziya wan jî ne bîrdoziyeke li gorî demê bû. Ya din jî neteweyîtiya wan gelek kêm bû. Li hember vê jî neteweyîtî û şovenizma kemalîzma Tirk jî gelek bihêz bû.

Bi vê ve girêdayî dema ku xwe dipesartin dewletekê, paşa û walî jî Tirk bûn. M. Kemal bi hinek paşa û waliyan re kete nav têkiliyê, dema ku dest bi têkoşînê kirin Kurd nû nû ser xwe ve dihatin. Cemiyeta Tealî ya Kurd jî dixwest xwe bigihîne Kurdistanê û hinek gavan jî avêtin. Li Bakurî Kurdistanê beriya kemalîstan di pişt îsyanên ku hatibûn destpêkirin de, li Dêrsim û hemû Bakurê Kurdistanê îsyan dikarîbû bihêz bibe. Tevgera li Başûr a ku di bin pêşengatiya Mahmut Berzincî de destpêkiribû, dikaribû li ser bingeha yekitiya Bakur-Başûr hemû Kurdistanê bigirtibana. Li Rojavayê Kurdistanê jî tevgerek di bin serokatiya Îsmaîl Simko de hatibû destpêkirin. Yanî di her sê parçeyan de jî tevgera Kurd derketibû holê.

Tevgerên ku di her sê parçeyan de destpêkiribûn Kurdistanî bûn, neteweyî bûn; bi qasî neteweyîbûn ew qas jî avakirina dewle-

tekê hedef digirtin. Lewra derketina kemalîzmê bû sedem ku fersenda ketibû destê Kurdan hêdî hêdî ji holê radibe. Ya rastin, îdeolojiya kemalîzmê û rêxistinbûyîna wan ji ya Kurdan bihêztir bû; a din jî di siyasetê de bihêztirbûn. Kemalîstan di sala 1920'an de bi Franse re peymana Enqerê îmza kirin. Bi vî rengî Başûr her tim ji kemalîstan re vekirî hêlan.

Di heman çaxê de tevgereke Kurd li Dîlokû Rihayê hebû. Lê ev tevger piştre ket bin kontrola kemalîstan. Di sala 1921'an de bi Moskovayê re îtîfaq çêkir. Bi sûdgirtina vê fersendê re, Qers û Erdexanbidest xist. Di wê demê de li Qers û Erzeromê jî tevgereke şoreşgeran a bi navê Şura hebû. Bi vî rengî ev jî ket bin venêrana kemalîzmê. Di heman çaxê de li Başûrê Kurdistanê tevgera Kurd di bin serokatiya Mahmut Berzencî de li hember Îngilîzan bidestxistina gelek pêşveçûnan karibûn xwe bikin dewlet.

Di vê demê de ji bo Îngilîzan pirsgirêka herî giring petrola Îraqê bû. Li gel vê wî jî dixwest li hember Sovyetê Rojava di dest xwe de bigire. Îngilîzan ji ber herdu sedeman têkiliyên xwe bi kemalîzmê re xurt kir. Lewra di vê demê de Îngilîzan ji bo kemalîzmê bitirsînin bi tevgera Kurdan leyîst, dixwest bikişîne gel xwe. Kemalîst li hember Îngilîzan bi tehdîta ku wê Şeyh Mahmut destek bikin tehdît kirin, Îngilîz jî li hember kemalîstan xwestin tevgera Kurd a li Bakur weke koz bikarbînin, tevî ev daxwazên wan, herdu alî jî tevgera Kurd destek nekirin pê leyîztin. Di herî dawî de kemalîstan petrola Musul, Kerkûk ji Îngiltereyê re hêla û karin ji xwe dur bidin hêlan.

Li beramberî vê Îngilîzan ji bo Kurd di bin serweriya kemalîstan de bimînin pejirand. Li ser vê hevkirinê parçekirina Kurdistanê temam kirin. Her wiha Îngilîzan hêdî hêdî kemalîstan xistin

bin bandora xwe; kemalîst ji bo efendiyên Îngilîzan li hember Sovyetê ket nava tevgerê. Piştî hingê peymanên hişkbûnê îfade dikin Baxdat û hema duv re CENTO ava kir. Ev peyman di cewher de peymanên li hember yekîtiya Sovyetê û Kurdan hatibûn avakirin.

Di vê demê de hinek partiyên Kurdan hatin avakirin. Partiyên Kurdan piştê 1920 û 1930 yanê beriya şerê cîhanê yê II. çawa avabû û çima rola xwe neleyîstin? Ya herî giring jî çima PDK di Cumhiriyeta Kurd a Muhabatê de rola xwe nelîst û di Başûrê Kurdistanê de nebû dewlet? Di wê demê de îsyana Dêrsim û bi heman awayî çima Bakurê Kurdistanê xeniqî?

Di Bakurê Kurdistanê de îqtîdara faşîst a ku kemalîstan avakiribû Kurdan kiribû bin serweriya xwe. Li Rojavayê Kurdastanê û Başûrê Kurdistanê jî tiştên bi heman awayî çêbûn. Siyaseta ku li van deran didan meşandin, dişibiya siyaseta kemalîstan ya di navbera salên 1920-40 ya li Bakurê Kurdistanê didan meşandin bû. Îranî jî li Rojhilatê Kurdistanê ji 1945 heya roja me ya îro didin meşandin. Li Îraqê jî îqtîdara ku piştî Şoreşa Tirmehê ya 1958 ava bibû, heman wekî kemalîstan bû; niha jî didome û weke kemalîstan hikûm dikin.

Tabî li vir mijara herî giring Kurd- yanî PDK-Îran,Iraq û Tirk jî çima rola xwe neliyîstin, serokatiya wê çibû? Ev mijarên giring in.

Di pişt şerê cihanê yê II. re çima di tevgera netewa Kurd de hinek cûdahî çêbûn? Ji ber di civaka Kurd de cûdabûn çêbibûn. Civaka kevin civakeke feodal eşîrî bû. PDK li ser vê bingehê ava bibû. Dema ku civaka Kurd ber bi nûbûnê ve guhertin çêkir çîna karker û kesima burjuwa ava bû. Di siyasetê de jî guhertinên li gorî vê derket holê. Lê feodalîzm û eşîrtî jî hîn didoma. Li ser vê bi taybet tevgera klasîk a Kurd piştî 1960'î bi awayê du partiyan dest bi rêxistinkirinê kirin. Yek ji van neteweperestiya îlkel temsîl dike û di bin

serokatiya Barzanî de dihat meşandin. A din jî nû, PDK ya modern bû. Serokê hêja Îbrahîm Ehmet, ji bo serkeftinê bidest bêxe piştî 1964’an xwest xeteke bide avakirin. Dîsa di 1975’an de YNK(Kürdistan Yurtseverler Birliği)ava bû. Di heman demê de PKK’e ava bû, heya roja îro têkoşîn û şerê xwe dide meşandin.

Niha tevgera Kurd a netewe di merheleyeke nû de ye. Bi hilweşandina Sovyetê re dengeyên cîhan û herêmê hate guhertin. Şerê Îran-Iraq ji bo Kurdan mercên objektîf gihiştî kir. Ya herî girîng jî li Bakurê Kurdistanê tevgera şoreşa PKK’ê pêşxist û pêşde bir, niha jî şereke pir mezin dide meşandin. Şerê tevgera netewe û siyaseta wê gelek pêşde bir û pêşxist. Dîsa Başûrê Kurdistanê di demeke giring de bû. Ji ber vê sedemê dikare bê gotin ku mercên objektîf yên li Kurdistanê gelek gihiştî bû. Ji ber ku weke berê peymanên Baxdat û CENTO yê nîne, ev belav bûn. Îro Îran û Tirkiye li dijberî hev in. Tirkiye û Iraq li baremberî hev in. DYE weke berê Kurdan wekî komînîstan nabîne. Ji ber Sovyet belav bû, leyîstokên dewletan yên mezin ku li ser tevgera Kurdan dihat meşandin niha nameşe. Ev hemû tiştên erênî ne.

Di hûndir de jî çetecîtî û fikrê wî, disa serokatiya wê paşde çû. Serokatiya Barzanî niha di rewşeke gelek tangav de ye. Li hember vê di tevgera şoreşa netewe de, di riya zanebûn û yekîtiya netewê de gelek mezin bû. Serokatiya kevin hema hema tine dibe. Li hember vê serokatiyeke modern, bi derfeteke mezin ve xwe bi xwe ava dike û ev serokatiya modern di hemû parçeyan de li ser bingeha yekîtiya netewe kete rewşa daxwaziyeke mezin. Her kes dixwaze bi vê serokatiyê re gavan bavêje. Ji bo xilasiya netewe bi tezbîtkirina stratejiyek xurt re dikare ev bide meşandin. Stratejî heye, tevger heye, her ku diçe yekîtiya tevgera Kurdan mezin dibe. Kurd di-

karin di hinek perçeyan de bigihin federesyonan, ev guncav e. Emadekariyên me heye, şerê me jî didome. Ji bo federasyonên netewe, li Bakur, Başûr û Rojava rola xwe bileyîzin.

Ji ber vê lazima teng neyê fikirandin. Divê pir kêfî û kesî jî neyê destgirtin û fikirandin. Di rojên ku mezin tê fikirandin de hewceye ku di riya siyasî û yekîtiyê de erk bên leyîstin. Em heya dawî emade ne. Birêz Îbrahîm Ehmet û Mamoste Hawar, bi kinahî ev mijarên ku min destnîşan kiriye, têkoşînê bi aliyên wê yên siyasî ve bi awayeke fireh û kur dikarin vekin. Bawer dikim ku tenê ne ji bo şagirtên Akademiya Mahsum Korkmaz, ev axiftin ji bo hemû dibistanên Kurdan, şoreşgeran û tevgerên şoreşger yên netewe wê riyeke baş û vekirî bide nîşan. Di warê dîroka Kurd de, lazima ceribandinên piştê şerê cîhanê yê I’emîn baş bidin dest û vekin, ev wê ji bo têkoşîn û roja me ya îro bibe çavkaniyeke hêzê. Em dikarin di derbarê hev de jî ji hev re pirsan pêşbixin. Bi vî rengî em ê dîrokê bidin dest û di roja îro de siyaseta rast, siyaseta netewe ronî bikin. Dîsa bi giringî em ê li ser siyaseta Kurd û divê îqtîdara wê çawa be bisekinin.

Belê Mamoste, hûn dikarin dîrokê bi kinahî bidin dest. Piştî şerê cîhanê yê I’emîn şansê Kurdan çibû û bêşansiya wan a di dîrokê de çawa çêbû? Ji bo destpêkê vekirina van xalan wê di cî de be. Yanî fersendên ku piştî şerê cîhanê yê I’emin û şûnde ketibûn destê Kurdan çawa çêbû û çima ji wan sûd wernegirtin? Sedemên vê yên hundir û derve çibûn? Herî zêde jî kaptalîzim çawa ava bû, çawa qetlîaman çêkir? Tevgerên Kurdan yên li Bakurê Kurdistanê û parçeyên din çawa perciqandin? Em çawa gihiştin şerê cîhanê yê II’emin? Her wiha we di wê demê de çi kir, mêzandina we çibû, çima bi ser neketin? Piştî şerê cîhanê yê II’emin avabûna PDK’ê heye. Ev çawa hat avakirin? Hûn dikarin van mijaran vekin.

İbrahim Ahmet: Weke hûn jî dizanin tevhera Kurd, di roja me ya îro de di pêvajoyeke giring re derbas dibe. Ji bo ku nekeve nav kêmahiyên berê di vê ji tevgerên Kurdan yên berê bê destpêkirin. Derketina tevgera Îttihat û Terakkî, bû sedema pêşveçûna hişmendiya netewan a di nava Împaratoriya Osmaniyan de. Di destpêkê de Kurd, Erep û netewên di nava împaratoriyan de civatên xwe ava kirin.

Encamên ku em ji rêgezên van civatan derxinin ev e: Ev civat di destpêkê de nedixwestin ji Împaratoriya Osmaniyan qut bibin. Ji dêla vê, slogana Îttihat û Terakki rêgeza yekitî, wekhevî û azadî armanc kiribûn. Lê Îttihat û Terakkî, ji bo netewên ku di nava Împaratoriya Osmaniyan de di nava xwe de bihelînin dikişandin. Ji ber vê bername, rêgez û têkoşîna wan hate guhertin. Di dema şerê cîhanê yê I'emin destpêkirî de tevgerên netewe yên di nava Împaratoriya Osmaniyan de cî digirtin di destpêka avakirina saziyên xwe de bûn. Ez wer bawer dikim ku tevgera Kurd di nava tevgerên din de, di warê netewe de ya herî lewaz bû. Lê di şerê cîhanê yê I'emin de Kurdan ji Tirkan bêtir xaka Împaratoriya Osmaniyan parastine.

Em dizanin ku piştî şerê cîhanê yê I'emin Almanya û Împaratoriya Osmaniyan di şer de windakirin, mûttefîkên wan jî bûn galîbê şer. Yanî di vî şerî de Îngilîz û Fransa bûn galîbê şer. Lewra hinek armancên Îngiliz, Fransa û Rusan ya li ser Rojhilata Navîn û herêma Rojhilat mijara gotinê bû. Beriya şerê cîhanê yê I'emin ev her sê welat di nava xwe de peymana Sykes-Picot kiribûn. Li gorî vê peymanê xaka Împaratoriya Osmaniyan ya ku weke zilamê nexweş bi nav dikirin di nava xwe de parve kiribûn. Dîsa li gorî vê peymanê Kurdistanê jî parçe kirin, beşa ku weke vilayeta Musul tê zanin biryara bidin Fransa dabûn. Di vê navberê de hinek feodalên Kurdan, hilweşîna Împaratoriya Osmaniyan di warê netewe de xwestin bikar bînin.

Di vê demê de yê ku serokatiya tevgera Kurdan dikir Şerîf Paşa,yê ku sefareta(büyükelçi) Împaratoriya Osmaniyan ya Îsveçê bû. Şerîf Paşa, bi mûttefikên ku di şer de serkeftî derketine, da ber çavan ku zêdetirîn tevgera netewe ya Ermeniyan destek bike, ji ber ku Ermenî Hiristiyan bûn-bi Ermeniyan re ket nava alîkarî û piştgiriyê. Şerîf Paşa bi serokê Ermeniyan re têkiliyên xwe pêş xist, mafê ewleyiya netewa Kurd û Ermeniyan ji mutefîkan xwest. Di peymana Sevrê de hinek mafê herdu netewan anî ziman. Li gorî vê peymanê ji Kurdan re hinek mafê nispî hate nasîn. Bendên peymana Sevrê ya 3.şiqê 62-63-64’an bi pirsgirêkên Kurdan re têkildar e. Li gorî avabûna dewleteke Kurdan li Başûrê Kurdistanê hate pejirandin. Lê dewleta Kurd a ku bihatibana avakirin, dihat dîtin ku wê demek di bin himayeya mûtefîkan de bûna. Mûtefîkan diyar dikirin ku dema Kurd hatin qonaxa ku xwe bi xwe rêve bibin û şûnde, wê xweserbûna wan bidinê. Lê di nava wîlayeta Musilê de, beşa ku bi Fransayê ve girêdayî ne xweserbûn otonomî dayînê li pêş dîtin. Kurdên ku di nava vê xweserbûnê de jiyan dikirin, dema ku rêveberina xwe bi xwe serxistin, wê bi Kurdistana xweser a ku li Bakur ava bibe re bibe yek.

Xalek din jî ev e: Dema ku li dîrokê tê nêrîn, tevgerên Kurdan ji derveyî xaka Kurdistanê, li Ewrupa ava bûne têne dîtin. Ji ber ku Kurdên ku di nava Împaratoriya Osmaniyan de jiyan dikirin, têkilî û girêdana wan dewam dikir. Kurdan gumana wê weke Împaratoriya Osmaniyan a kevin ku hatiye parçekirine lêbên radikirin. Ji ber ku tevgera Kurdan eşîrî û feodal bû, eşîran piştî hilweşandina halîfeya îslamê û şûnde, tevgera Kurd a netewe pêwîst nedîtin, ger bibe jî ev tevger ne ji bo Kurdan, pêwîstiya ji bo Împaratoriya Osmaniyan dîtin bawer dikirin. Yê ku vê baş dinasî M. Kemal, bi awayeke zanebûn vê xalê bi hustatî îstismar kir û jê fêde kir. Di paşnê (akabinde) M. Kemal de derbasî Kurdistanê dibe, bi şîara “bi navê Tirkan avabûna îslamê”dana pêş, li gelek cihan gerya û

civînan çêkir, di yekkirina şêx, reyîsên eşîretên Kurdan û yên li pêştên de ser ket. Xwe sipart vê hêzê û bi armanca ku him mutefîkan û him jî yên ku avabûneke dewleta Kurdan dixwazin bê bandor bike ji Kurdan hêzek ava kir ji bo armanc û serokatiya xwe da şerkirin.

M. Kemal tenê Kurdan bi wan re dana şerkirin nema, di heman demê de di nava nakokiya di navbera Tirk-Yunanan de jî da bikaranîn. Di vê demê de Yunanan dixwestin, Îzmîr û hevirdora vê bidest bixin û tevlî Yunanistan bikin. M. Kemal li hember wan, Kurdan da şerkirin. Tabî li hember vê M.Kemal hinek mafê ku sedî sed tê de ne zelal bû, bi awayeke federesyoneke xumam, bi awayeke ne zelal îfade kiribû. Kurd, di bin serokatiya M.Kemal de gelek li ber xwe dan û pir xwîn rijandin. Ev ew qas gihişt astên bilind ku dema bîrdariya(anıtı) leşker a nenas(meçhul) çêdikin, gotineke M. Kemal a binavûdeng heye: Dibêje, “ îhtîmaleke mezin leşkerê bîrdariya nenasKurd e.” Her çendî raste rast ne gotineke ku M.Kemal bixwe bilêv kiribe jî, lê yê bi navê M.Kemal hatî Sakarya ev gotin kiriye. Ev rewş li gel tinekirina tevgera me ya netewe, nepêkanîna peymana Sevrê jî winda kir û ev jî bû sedem ku baweriya xwe jî winda bike. Yanî pêkanîna peymana Sevrê kêm jî be, ji bo piştgirîkirin daxwazî hebû, ev firsend jî hat windakirin. Ev rewş ji bo Tirkan bû alîkar, loma ev bû sedem ku di şerên ti berjewendiyên Kurdan tê de nîne kişandin navê. Wekî îro tevî ku şerê tê kirin ne li gor berjewendiyê Kurdane jî xistin nav şerê ji bo Tirkan tê kirin.

Di mercên wan rojan de hêviyên me yên ku me winda kirin çi bû? Îngilîzan bi lîstikên ku bi zanabûn lîstin re dikarîn Fransayê îqna bikin. Hataya ku bi Surî ve girêdayî, li beramberî Îskenderun û hawirdora wê ji Fransa re berdan,bi berdana Musul dikarin serbikevin. Bi vê ve girêdayî, di parçeyên Kurdistanê yên din de, daxwazeke ya Kurdan ku Îngilîz dewleteke Kurdan a serbixwe ava

bikin nînbû. Piştî şerê cîhanê heya dema rawestandina şerê Madrid, Îngilîzan gelek deverên Kurdistanê xistibûn bin venêrîna xwe. Îngilîzan, piştî ku bi Şeyh Mahmut Berzencî re hinek lihevkirin û şûnde karîn bikevin Sûlêymaniyê. Piştre tevî ku ne mafê wan jî bû, Başûrê Kurdistanê beşên  eyaleta Musulê yên din dagir kirin. Di encama vê de di navbera Tirk û Îngilîzan de gelemşe destpêkir. Tirkan, ji Îngilîzan re digot: “ piştî şerê cîhanê yê I’emin û şûnde xaka ku we bidest nexistiye, piştî şer bidestxistina vê mafê we nîne.”

Îngilîzan, ji ber zêdebûna van nekokiyan, zanebûna netewe ya di nav Kurdan de îstismar kir, xwestin li hember Tirkan bixin nava tevgerê.  Şeyh Mahmudê welatparêz jî, dixwest parçeyê Kurdistanê yê ku ji Osmaniyan ve maye dewleteke serbixwe ya Kurdan bide avakirin. Ev dewlata Kurd a ku bê avakirin jî, nedixwest di bin venêrîna Îngilîzan de be. Di vê mijarê de di navbera Şeyh Mahmut û Îngilîzan de nakokî derketin, ev bû sedem di navbera hêzên Şeyh Mahmut û Îngilîzan de şer derbikeve. Di nava şerê ku derketî de bîzat Şeyh Mahmut hebû, di encama birîndariya wî de dil ket destê Îngilîzan. Piştre di dadgeheke leşkerî ya ku li Bexdatê çêbûyî de cezayê îdamê danê. Lewra ev ceza veguhertin cezayê bêdawî.  Dure wî bi hînek heval û malbata wî re mişextiyê(sürgün)Hindistanê kirin.

Piştî vê mişextîbûyînê û şûnde jî, li Başurê Kurdistanê daxwaza hinekan a hişmendiya netewe domand. Ev jî berdewankirina nakokiyan dida diyarkirin û Îngilîzan jî nakokiya Kurdan a heyî çareser nedikir. Her çendî bi hinek rêbazan re xwestin çareser bikin jî ser neketin. Ji ber vê sedemê Şeyh Mehmut cardin anîn Bexdadê û weke hikumdarê Kurdistanê qebûl kirin. Lê şerteke wan hebû: Xwestin Şeyh Mehmut musteşarê Îngilîzan qebûl bike. Şeyh Mehmut jî, di destpêkê de ev daxwaza Îngilîzan qebûl nekir. Vegeriya Sûleymaniyê hikumeteke ava kir. Xwe weke kral îlan kir û licneya

xwe ya wezîran ava kir. Piştre bi saziyên hikumetê yên cur be cur re al derxis û artêşa xwe ava kir; postexane ava kir û pûl derxist. Bi vî rengî dewleteke Kurdan avakir.

Dewleta Kurd ya ku hatî avakirin, xwezayî ket rewşeke li hember daxwaza Îngilîzan a avakirina dewleta Ereban û bercewendiyên wan. Li ser vê Îngilîz, li hember Kurdan wehşiyeteke mezin dan destpêkirin, bi hemû şekan ve êrîşê Kurdistanê kirin. Dikarim bêjîm ku Sûleymaniye bû şûna ceribandina cekên Îngilîzan yên nû. Bi vî rengî Îngilîz du caran ketin Sûleymaniyê. Artêşa Ereban jî cara yekem di sala 1924'an de ket Sûleymaniyê. Ev ketin bi alîkariya çek û leşkerên şêwirmendên Îngilîzan ve çêbû. Îngilîzan ev dagirkirin erê kirin.

Li ser vê, nakokiyê Tirk û Îngiltere yên li ser eyaleta Musilê zêdetir bû. Ji ber sedema van nekokiyan Îngilîzan nedixwest Kurd di carekê de bên perciqandin. Ji ber qarta Kurdan ji hêla wan ve li hember Tirkan bikaranîn mijara gotinê bû. Dema Şeyh Mehmut hikumdariya xwe li Kurdistanê didomand, di belavoka hevbeş ya Îngilîz-Iraqê de ya di 24 Mijdara 1922'an de hat diyarkirin ku ew dewleta Kurdan dinasin, lê pêwîste heyeteke Kurdan ji bo têkiliyên aborî, tîcarî û diyarkirina sînor bi Îngilîz û Iraqê re bên gel hev daxwaz dikirin. Rastî jî ev bû; dixwestin bi siyaseta di vê belavokê de Tirkan bitirsînin. Armanca wan bi vê siyasetê ve Tirkan ji vilayeta Musil dana dûrxistin bû. Tişta ku ket pratîkê jî ev bû. Siyaseta Tirkan tevlîhev bû. Bi mecbûrî, ji NY (Neteweyên Yekbûyî) heyetek xwestin, daxwaz kirin ku heyet vê derê venêrîn bike.

Tirk bi Îngilîzan re lihevkir û ev hişt ji hêla NY rastiya heyî bê lîkolînkirin. Heta di belgenameyên NY'ê, rapora ku dane de, hat nivîsîn ku Kurdên li Başurê Kurdistanê nexwazin bi Tirk û Iraqê re bijîn, dixwazin serbixwa jiyan bikin hatibû belgekirin. Lê dewletên

hingê di bin bandora Îngilîzan de bû. Çawa ku di roja me ya îro de DYE li ser NY serwer e, wê demê jî serwerî ya Îngilîzan bû. Ji ber vê sedemê, piştre di 25 Mijdara 1925'an de ji hêla civata dewletên cîhanê ve hat gotin ku Kurd di nava dewleta Iraqê de li ser bingeha hinek şertan, yanî ziman, çand û jiyana xwe biparazin, lê wê weke dewleteke serbixwe nemînin xistin bin biryarê.

Heman rojê bi mûnasebeta vê biryarê di civîna şahiyê ya Îngilîz-Iraqê de berpirsyarê heyeta Îngilîzan vê got: "Weke ku Tirk dixwazin Kurdan bikin Tirk, divê hûn Kurd nekin Ereb. Kurd wê li hember zordariya Tirkan ranagirin bibin Tirk, lê wêTirk jî nebin Ewrupî." Yanî weke ku dê bi ti awayî Kurd nebin Tirk, wê Tirk jî bi ti awayî nebin Ewrupî. Qiralê Iraqê Feysal, ev nerîna Ingilîzan di cî de dît, her tim got bila Ereb Kurdan weke Kurdan bibînin, Kurd jî bila bi kurdîniya xwe ve girêdayî bin, divê weke Kurdê heqîqî û resen bimînin da diyarkirin. Lê tişta ku em dizanin di vê riyê de Iraqeke yekgirtî û serbixwe ye. Me fêm kir ku ev rêgez çawa ketin jiyanê. Di vê demê de tevgera Şeyh Mehmut jî binket û xilas bû.

Xalek din jî, di madeyeke Peymana Lozanê de madeyeke ser rêveberiya Musilê bû. Weke ku rastiya dîrokê jî dibêje, di navbera Tirkan û Ingilîzan de lihevhatinek hebû. Li hember destjêneberdana dostaniya Tirkan a bi Rusan re, Ingilîz jî ji bo destê xwe ji alîkarîdayîna tevgera Kurd a netewe bikişînin lihev kiribûn. Kurdan fêmkirin ku hatine xapandin. Kurdan him li Bakur û him jî li Başurê Kurdistanê dest bi têkoşîna xwe kirin. Di van têkoşînan de her çendî hinek rewşenbîr cihê xwe tê de girtibin jî, pêşengên wan herî zêde Şex, mele û axa bûn. Yek ji van tevgeran jî tevgera Pîranî ya Şeyh Saît bû. Him vekirî hin jî di mercên modern yên roja me ya îro de, ji bo serkeftina armanca me, ez îtîraf dikim ku tiliya Îngilîzan di tevgera Şeyh Seît de hebû. Lê ev piştgirî, ji tevgerê gihandina serkeftinê zêdetir, ji bo windakirinê bû. Tevger destpêkê bê agahiya

Ingilîzan, bêyî ku destur ji wan bigirin destpêkir û bihêz bibû. Piştre Ingilîzan destlêwerdan kirin li wan dan windakirin.

Tenê ne di vê de, tiliya Ingilîzan di binkeftina hemû tevgerên ku li Kurdistanê rabûne û binkeftine de heye. Mixabin, di dawiya vê demê de, gelê Kurd ti maf û hêvî bidest nexist. Tevgera Kurd bi pergaleke din re dest bi têkoşînê kir. Ji hêla hinek rewşenbîran ve hinek partî hatin avakirin. Mixabin partiyên ku hatin avakirin, li hember rewşenbîran ji derve de bi hinek alîkarî û daxwazan ve partiyên ku hatibûn avakirin bûn. Bi taybet divê qala alîkarî û daxwazên Ingilîzan yên di vir de bêne kirin. Ji ber Ingilîz, muhtemelê ku tevgereke netewe ya Ereban li hember wan pêşbikeve dikirin, loma li Iraqê pêwîstî bikaranîna qarta Kurdan di destê xwe de bigire didît.

Di vê navberê de şerê cîhanê yê II’emin destpêkir. Di vê demê de tevgera Kurd lewaz bû. Lê ketina Sovyetê ya vî şerî, bû sedema guhertina hinek rewşan. Taybet bi ketina Îranê û xistina bin venêrîna xwe re yek Rus, bi ketina Ingilîzan a parçeyên din yên Kurdistanê re, carek din rê li ber bihêzbûna tevgera Kurd vekir. Ev dewlet ji ber bercewendiyên xwe hewl didin ku di herêmê de Kurdan îstismar bikin. Heta di wê demê de Alman jî xwe bi sipartina hinek Kurdan re xwestin wan bênin rewşa kirina mutefîkên xwe.

Li Iraqê çil partî hebû. Gelek ji van partiyên Kurdan bû û yek ji van partiyan jî partiya Hîva bû. Di nava van partiyan de her çendî welatparêz hebin jî, li gorî nerîna min serokatiya van bi Ingilîzan ve girêdayî bû. Ev serokatî bû sedemê parçekirina partiya Hîva. Di vê navberê de bi alîkarî û teşvîqa hinek elemanên di nava partiya Hîva de, li Îranê komaleyetek hat avakirin. Elemanên ku alîkarî didin vê komaleyê, ne girêdayî serokatiya ku bi Ingilîzan ve

girêdayî bû. Van li Îranê komaleya ku ji nû de Kurdistanê bidin jiyîn dan avakirin.

Di vê demê de ez hekimê Helepçeyê bûm û min rojnameya bi navê Gelewêj derdixist. Ji ber hinek sedeman ez ji erka dadgeriyê veqetam. Heya wê demê ez ne endamê ti partiyan bûm. Her çendî xwestin jî ez neketim nav partiya Hîva. Ez bi hinek kesên ku dixwestin bikevin partiya Hîva di heman malê de dimam. Wan xwestin ez jî bikevim nav partiya Hîva. Em derbasî qurfeyek bûn. Li wir li ser masê tebanceyek û yek jî Kuran-i Kerim hebû. Li jora me jî navê serokê partiya Hîva hebû. Li wir tişta ji min dihat xwestin ku bikim, li wêneyê mêze bikim destê xwe deynim ser Quran û tebanceyê sond bixim bû. "Sonda wan ez li Kurdan xiyanet nakim bû." Min da diyarkir ku ev sond ji bo Kurdan tohmet e, divê sonda we ne bi çek ne jî bi Quranê re be; ya divê hebe, sonda ku ji gel re bê dayîn e; min got ger hûn cihê xwe bivî rengî diyar bikin, ez ê heya dilopa xwîna xwe ya dawî ji gelê xwe re xizmet bikim.

Piştî ku min erka xwe ya dadgeriyê berda, di nav de tevî Partiya Komînîst gelek partî ji min re pêşniyara bûna endamtiyê kirin. Heta di Komeleya jiyandina Kurdan a li Îranê hatî avakirin de, hinek hatin ji min re gotin ku dixwazin komîteyeke nû yê vê bidin avakirin. Ev di 1944'an de bi riya postê bi min re danûstandin dan çêkirin. Min bernama wan xwend. Dema min herdu rêzên destpêkê yê bernameyê xwend, ez fikirim ku ev komele ne komeleya Îran,ne ya Iraq û ne jî ya Tirkiye ye; ev komale tenê komaleya Kurdistanê ye. Ev komale dixwaze di hemû parçeyên Kurdistanê de şûbe an jî komîteyên xwe ava bike. Min jî endamtiya wê qebûl kir. Dixwazim vê mijarê bihêlim û bêm ser meseleya Barzanî.

Tevgera Barzanî, di 1944-45 yanî di destpêkê de ne tevgereke welatparêz, tevgereke eşîrî bû. Di nava Hîva de kesên baş

hebû: Yên weke Emin Revanduzi, Îzzet Abduleziz, Xeyrullah û hwd. hebûn. Dixwestin vê tevgerê ji tevgereke eşîrî derbixin, bînin rewşa tevgereke welatparêz û neteweyî. Lê ev tevger belav bû. Ji ber ku aliyê wê yê eşîrî ji yê din bihêztir bû. Ji ber vê Mele Mustafa neçar ma ku bi zilamên xwe ve derbasî Îranê bibe. Dema ku Melle Mustefa di kêliya ku sînor derbas dike hinek ramanên wî hebû. Partiyeke bi navê PDK û avabûna komara Kurd hêvî dikir. Piştî çend meh din şûnde, Kurdên ku me qal kiribû yanî navê Komeleya Ji nû de Jiyandinê guhert kir PDK’e. Tevî ku di Başurê Kurdistanê de ez berpirsyarê wê Komeleyê yê yekem jî bûm, min nezanî ku guhertina ev nav çewa çêbû. Piştî demeke û şûnde, ev komeleya ku ji kesên baş û welatparêz yên bi rêgezên xwe ve girêdayî pêk dihat bû sedema bidawîbûna tevgereke Kurd.

Tê zanîn ku Qazî Muhemmet, her çend ji ber hinek sedemên xwe yên kesî jî be, Mele Mustafa bi mîsoger bi sîxûrtiya Îngilîzan ve sûçdar dikir. Hêzên Barzanî, li du gundên dora sînor bi avayeke tengav kom bibûn. Mercên wan yên jiyanê heya bêjî zehmet bû. Nexweşiyeke jêvegir(bulaşıcı) wan girtibû, heta hinek ji wan mirin. Mele Mustafa ji vir bi riya kesek ji min re nameyek rêkir Sûleymaniyê. Di nameyê de mercên herdu gundan îzah kiribû û ji min daxwaza li Sûleymaniyê alîkarî komkirin û ji wan re şandin kiribû. Li ser vê me ji Sûleymaniyê li herêma komîteya me du caran alîkarî kom kir û şand. Carek jî subayê Kurd Nurî Ahmet Taha yê ku tê nasîn û sala 1945 keseke bi navê Hamza Abdullah şand Sûleymaniyê.

Hamza Abdullah şoreşgereke Kurd û çepgir bû. Li hember zordestiya hikumeta Iraqê dûçar(maruz) mabû. Nasnameya Iraqê jê distînin wî mişextî Tirkiyê kiribûn. Piştre çûbû Îranê. Mele Mustafa bi riya wî nameya duwemin şand. Wekî din jî di nav nameya ku ji min re şandî de nameyeke bi navê kurê Şeyh Mahmut Berzencî

ku divê bidimê hebû û name vekirîbû. Min nameyê xwend. Di nameyê de ji bo ku Barzanî vegere gund û qada xwe, dixwest kurê Şeyh Mahmut biçe bi Qral Faysal re nevbertî bike. Ji ber li ser sedûyanzdeh kesên Barzaniyan biryara dardekirinê hebû. Dixwest ev dardekirin bê zivik-kirin û veguheze girtina bêdawî. Li hember kirina vê, dida diyarkirin ku Barzanî amadeye vegere Iraqê. Daxwaza wî ev bû.

Li ser vê komîteya me di asta jor de civînek çêkir. Hikumeta Îranê beriya niha reîsên eşîretan li hember Qazî Muhemmet derxistin- ev bi peran hatibûn kirin- me aliyê wan yê bi Îranê re dît. Ger Mele Mustafa jî vegere Iraqê, wê êdî kes nikaribe Komara Mahabatê biparêze. Ji ber vê sedemê nameya ku Barzanî şandibû me neda kurê Şeyh Mahmut. Me got bila li Îranê bimîne Komara Muhabatê biparêze. Ji derveyî vê jî mixabin hinek kesan li ser navê reyîsên eşîretan belgeyek amade kir û kurê Şeyh Mahmut yê duwemin Şeyh Latîf jî di nav de, me hemûyan îmze kir û vegerand belavokeke. Di belavokê de hat nivîsîn ku divê Mele Mustafa û yên li gel wî ji hêla hikumeta Iraqê ve bên efûkirin vegerin şûna xwe û me got em wî weke nûnerê Kurdan dibînin dabû diyarkirin. Di aliyê din de jî rewşa Qazî Muhemet ya lewaz,rê li ber kar û rewşa heyî ser û binê hev bibe kir û hêla gelek tahrîbat derkeve holê. Di nameya duwemin ku Barzanî şandî de, digot pêwîste ez alîkarî bidim Hamza Abdullah, ji ber dixwaze partiyeke weke PDK ya li Îranê li Iraqê jî bide avakirin diyar dikir. Yekemîn ev partiya bi navê PDK red kir.

Ji ber PDK ya Barzanî ne Kurdistanî bû.

– PDK, berê li Îranê ava bû? Civîna xwe ya yekem çawa çêkir? Armanca wî ya demdirêj û dem kurt çibû? Bernama wê nebû. Ev partî li kur hat avakirin, armanca wê çibû? Ji Kurdên li

Bakurê Kurdistanê kes hebû? Piştre çima li Bakur PDK hat avakirin, çibû, hûn bi çi re rû bi rû hatin ku ev hate avakirin? Ev yek kes ava kir? Yan jî civînek çêbû? Dema ku ev partî hat avakirin bandora derdor çibû? Daxwaza we çi bû? Hûn çawa gihiştin vê fikrê, di avakirina vê de bandora mercên abjektîf çibû?

– Di nameya ku Barzanî ji min re şandî de,dixwest ez alîkariya Hamza Abdullah bikim. Dîsa di nameyê de hinek nav diyarkiribû û dixwest ev nav di nav partiya ku bê avakirin de cihê xwe bigirin. Min dît ku ev partî ne partiyeke Kurdistanê ye. Yanî partî partiyeke Iraqê bû, ji ber vê min nexwest di vê partiyê de cihê xwe bigirim.

Mele Mustafa dixwest bibe serokê vê partiyê. Kurê Şeyh Mahmut Şeyh Latif û Gege Ziyatê Koysancak yek ji eşîretên Kurdan yên li pêş dihat- dixwestin alîkarên wan çêbibe û komîteyeke merkezê bê avakirin. Lê ev partî ti armanc, bername û rêgezên ku di oxira wê de têkoşîn bikin nînbû. Lê bi hinek gotinên xweşik ku bilêv dikirin re, digotin ev partî ji ber berjewendiyên gelê Kurd hatiye avakirin. Di wê demê de partiyên weke partiya Şoreş û Rizgarî hebû. Ev hemû gotin ku em dixwezin di vê partiyê de cî bigirin. Lê hinek kesên awarte yên Kurd, gotin ev partî partiyeke eşîriye û dan diyarkirin ku di nav vê partiyê de cihê xwe nagirin. Partî bi vî rengî di 11’ê Tebaxa 1946’an de li Iraqê hat avakirin.

– Ma Komara Mahabad a Kurd rûxîya bû?

– Na, hîn nerûxîya bû.

– Ma avakirina partîyek wiha baweriya xwe ya bingehîn ji Komara Mahabad digirt?

– Mele Mustafa, weke Qazi Muhammet li Mahabadê ji avakirina PDK'ê best digre (esinlenerek), dixwaze partiyeke wiha ava bike û weke Qazi Muhammet bibe serokê partiyê.

– Mirov dixwaze fêm bike ku partî çawa ava bûye.

– Ez di Kongreya 1. de amadebûm. Berfirehiya wê vebikim.

– Ma tu endam bûyî?

– Ez ne endambûm, lê amadebûm. Ji min xwestin bibim endam. Lê min diyar kir ku heta ji komîteya navendî ya partiya me biryarek neyê, nebim endam, em ê komîteya xwe ya li Sileymaniyê fes nekin û di partiyeke din de nebim endam.

– Yanî him li Iraqê PDK heye û him jî bi vê ve girêdayî komîteya (Laq) a ku hûn jî di nav de cih digrin heye. Di navbera komîteya wê û PDK-I de cudahiyek çawa hebû?

– Cudahiya me, partiya me partiyeke ku tevahiya Kurdistanê digirt nava xwe bû. Li perçeyên Sûrî û Tirkiyê jî me dixwest komîteyên giredayî vê bêne avakirin. PDK'a Barzanî jî partiyek ji bo Iraqê bû. Yanî tevahiya Kurdistanê ne digirt nava xwe. Ev cudahiya bingehîn a di navbera me de bû. PDK'a Barzanî bi Partiya Komînîst a Iraqê re kete nav peywendiyê, di dema Qiral Faysal de bi hev re hin xebatên weke meş û mîtîng jî dane meşandin. Di vê demê de ji komînîstan hin girtin çêbûn. Li ser bingehê mikurhatina van ji tevahî partiyan girtin çêbûn.

Piştî hilweşîna Komara Mahabadê, komîteya ku me li Başûr ava kir li holê ma. Me di civîna ku çêkir de diyar kir ku li pêşiya me du vebijêrk (seçenek) hene. Ya em ê tevlî komînîstan yan jî tevlî PDK'a Iraqê bibana. Di encamê de piranî di hêla beşdarbûna PDK'ê de nêrîn dan. Li ser vî bingehî di Nîsan û Gulana 1947'an de em

tevlî PDK’ê bûn. Di mikurhatina komînîstan de yekî ku navê wî derbas dibû jî ez bûm û hatim girtin.

– Ji tevlîbûna PDK’ê zêdetir çima we komîta xwe pêşnexist û xurtir nekir.

– Piştî hilweşîna Komara Mahabat a Kurd, ti firsend û derfeta me nemabû. Em neçar man û tevlî PDK’ê bûn.

– Ma piştî hilweşîna Komara Mahabad a Kurd li İranê hebûna PDK’ê domiya?

– Na, hebûna wê nema, paşê cardin hate avakirin. Sedema hilweşîna Komara Mahabadê, ne tenê paşvekişîna Rûsan û dest ji me berdana wan bû. Sedema bingehîn çavkaniya xwe ji hûndir digirt. Ji ber ku tevgera heyî di bingehîn de ne tevgereke rizgariya netewî bû, li gel vê ne tevgereke Kurdistanî jî bû. Di wê demê de min bi xwe ji bo wan jî nivîsî bû. Min diyar kir ku ji bo parastina Mahabadê ji artêşa Iraqê pênsed kes bi çekên xwe ji vê mirinê re amade ne. Wekî din gelek rewşenbîr, karmend û welatparêz hebûn. Ev jî mirovên ku bi xwîna xwe ve ji bo parastina komarê amadebûn. Lê di bersiva ji bo me şandin de diyar kirin ku ji me tiştekî naxwazin û gotin; “ger hebe ji bo me pirtûkên dibistanan û bijîjkekî bişînin.’’ Heta hinan ji wan gotin; ev komar ji bo ku Kurdên Başur werin destdeynin ser, avanekirine. Yanî digotin; “dixwazin kursiyên me ji me bigrin.’’

Dema ez li dadgehê bûm, şahîd hatibû amadekirin ji bo min diyar kir ku em dixwazin Kurdistana Başûr jî tevlî Mahabadê bikin û dewleteke serbûxwe ava bikin. Ev şahid, endamê Komîta Navendî yê Partiya Komînîst ê Iraqê bû.Tişteke ku ez ê qet ji bîr nekim jî got; “roja ku artêşa Îranê Tebrîzê dagir kir, ez li mala Îbrahîm Ehmet bûm.’’ Rast digot, wê şevê li mala min bû. Ev kes endamê cigîr

(yedek) ê navendî yê komînîstan bû û di asta hevalê Şex Latîf de bû. Wê şevê li mala min jîvana (randevuya) herduyan hebû. Diyar kir ku roja Tebrîz ketiye ez giriya me û di nava giryanê de min gotiye ku em çi bêbextin, Komara me ya Mahabadê hîn di dema keçîniya xwe de ye mir. Di encamê de dadgehê ji bo min û girtiyên din cezayê dusal girtîgeh û dusal jî çavderiya polîsan da.

– Ma îtîrafkar, hevkarê Iraq an Îranê bû?

– Na, li Iraqê li gel hikumetê mikur hatibû. Weke ku ez Endamê Partiya Komînîst im, dihatim destgirtin, li ser wî bingehî jî min ceza girt. Dema ez li girtîgehê bûn yên hatin serdanê gotin; li gel partî Partiya Komînîst û partiyên din jî di rewşeke zehmet de ne û lewaz ketine. Ji ber ku radestbûn û mikurhatinên endamên navenda komînîst nêvengê (ortamê) serûbin kiribû. Her çi qas rewşa giştî ev be jî bi rastî jî yên berxwedaniyên mezin nîşan didan jî hebûn. Divê vê jî diyar bikin. Li girtîgehê li gel me yên din jî hebûn. Bi yên dihatin serdanê re jî me li hev kir, dema em derketibana derve menê konferansek çêkiriba. Paşê me konferans çêkir. Di konferansê de li hember endamên komîta navêndî rabûn çêbûn. Di encam de navendeke nû hate hilbijartin. Xwestin ku ji endamên navendê yên berê hisab bê pirsîn û ji bo ku li ser bingehê zanistî bernameyek partiyê bê avakirin, xebat çêbûn.

Ji ber vê Hemza Evdillayê ku heta wê demê sekreteriya partiyê dikir û li gel wî bi qasî deh-pazdeh kes ji partiyê veqetiyan. Hemza Evdillah digot; “ji ber ku ez vekîlê Mele Mustafa me, endamê esîl im.” Di despêka 1953’yan de navê partiyê yê berê “Partiya Demokratîk a Kurd” bû. Me guhert û kir “Partiya Demokratîk a Kurdistan.” Me bi vê re armanc kiribû ku em him netewperestiya teng derbas bikin û him jî girseyeke berfirehtir bigrin nava xwe.

Wekî din me diyar kir ku me ji Mao û Stalîn sûd wergirtiye, nêrîna me ya cihanê ramaneke sosyalîzma zanistiye û me têkoşîn kir.

Têkoşîna me weke ya partiyên din ji meş, mîtîng û belavkirina belavokan pêkdihat. Wê demê di navbera gelek partiyên Iraqê de eniyên yekîtiyê avadibû. Lê weke partî em ji enî û yekîtiyan re nedihatin pejirandin. Dema ku bi çavê partiya Kurdan û partiya Kurdistanî li me mêze dikin, ji bo ku me bi awayeke cîhawazî didan dest, mêzandina cûdakariyan ya li vê bereyê- digotin ku ji bo Iraqê pêwîste hildin nav yêkîneya eniyê. Têkiliyên me yên di navbera pirtiya PDK û partiya Komînistan de jî carna baş dimeşiya, carna jî xirap didomiya. Cûdahiya bingehîn, di mijara ku Kurd biwayeke netew mafê wan heye qedera xwe bixwe diyar bikin, an jî nekin de bû. Partiya Komînîst jî vê qebûl nedikir.

Di vê demê de partiya me weke dibistanekê bû. Yên ku dihatin tevlî me dibûn, piştî ku perwerda xwe didîtin û şûnde dişûn diketin nav Partiya Komînistan. Lê piştî sala 1953 û şûnde ev rewş hat guhertin, heta endamên merkeza Partiya Komînîstan dihatin bi awayeke endamên asayî tevlî nav partiya me dibûn. Xwezayî giraniya Partiya Kurdan dihat avakirin. Ya din jî heye Tevgera Netewe ya Ereban jî partiya me weke xeteriyeke mezin didîtin. Ev rewş heya 14 Tirmeha 1958’an domand.

– Mamosta, tu hingê bûyî sekreterê partiyê?

– Bêyî ku fermî be, ez 1951’an sekreterê partiyê bûm. Lê bi awayeke fermî, piştî Konferansa 1953’an heya veqetîna min ya 1964’an sekreterê partiyê bûm- domand. Dema ku em veqetan jî herdu partî heman navî bikar tanîn. Yanî ji 1953’an heya 1970’î ez sekreterê partiyê bûm.

– Di dema sekreteriya te de di îdeolojiyê de çi guhertin çêbû?

– ema me bernameya xwe di Konferansa 1953'an de avakir, Partiya Komînîst ji bo me gotin “ev jî bûn komînîst, lê çima di welatekê de du partiyên komînîst çêbû” li hember derketin û têkoşîn kirin. Yanî digotin îdeolojiya me komînîst e. Heman weke ya wan.

– Di vê demê de rewşa yên weke têkildarî Barzanîne dihatin nasîn çibû?

– Di vê demê de ji ber Barzanî li Rusyayê bû, bi wan re ne têkiliyeke me ne jî agahiyeke me mijara gotinê bû. Heta kesê şûnê wan nedizanî.

– Bi malbat û eşîretê re jî, bi welat re jî ti têkiliyeke wî nînbû?

– Bi ti kesî re, bi welat, eşîret û heta bi malbatê re jî ti têkiliyeke wî nînbû. Ew li Asyaya Navîn bû.

Di 1956 û 1957'an de li Moskova Konferansa Ciwanan ya Netewe hat çêkirin. Me jî ser navê partiya xwe Celal Telebanî rêkir. Di dema vê konferansê de, li Moskovayê bi Mele Mustafa re hevdîtin çêkiribû. Dema ku Celal Telebanî şûnde hat, du nameyên Mele Mustafa û wêneyên wî anîbû. Yek ji wan nameyan- kesî-ya din jî ser nafê partiyê şandibû. Barzanî di nameyên xwe de dixwest em bi Hemza Abdullah re li hev bikin û wî carekdin hildin nav partiyê.

– Hemza Abdullah wê demê çûbû ku derê?

– Wê demê Hemza Abdullah herî zêde xwe nêzî komînîstan didît.

– Nameya duwemîn çibû?

– Dema ku min nameya din vekir ez bi erjengî (dehşetle)hilpekim. Dema ez ciwam bûm, Şeyh Mehmut jî li Hindistanê li mişextiyê bû, şêx û murîdan di meş û xwepêşandanan de ji Îngilîzan daxwaza vegera Şeyh Mahmut dikirin. Dûrişmeyên xwe jî bi awayê nalenal"kudan Xudah" vedigotin. Di nameya Mele Mustafa de tiştek nînbû. Bi mantiqê murîdeke rica dikir ku digot " vê nameyê bidin birayê min Şeyh Ehmet." Weke murîdeke ji min daxwaz dikir ku ez nameya duwemin bidim Şeyh Ehmet yê di girtîgeha Bajarê Basrayê de. Li ser vê em bi komîteya merkezê re kom bûn û me nîqaş kir. Ji ber ger ev name bikeve destê dewletê wê Şeyh Ehmet îdam bikin. Di aliyê din de bi haşmetî re yê ku tê zanîn Mele Mustafa Barzanî, general Barzanî, weke murîdeke name nivîsîbû. Ya rastî di belavokên ku me belav kirin de digot; " Bijî azadî, bijî general Barzanî."

Di wê dem û salan de netewexwazên Ereban bi me re ketin nav têkiliyê û pêwendiyên me çêbûn.  Salek berê Şoreşa 14'ê Tirmehê, di nameyeke netewexwazên Ereban ji min re şandin de, didan diyarkirin ku di rewşeke li hember rejîma Kral Faysal derketin de, wê Cemal Abdulnasir alîkariya çekan bide me. Netewexwazên Ereban ji min xwestin ku biçim Bexdatê û ji wir jî biçim bi Cemal Abdulnasir re hevdîtin çêbikim. Heman kes piştî 14'ê Tîrmehê bû wezîr. Lê ji ber li ser min biryara dadê hebû, derketina ji Iraqê negengaz( nemûmkûn)bû û destûr nînbû. Li ser vê ji wezîrê karê hundir- ji ber Kurd bû- rica kir. Li gorî rapora bijîş a di destê min de dida diyarkirin ku nexweşiyeke min nêzî penceşêrê heye. Ji bo tedawî bibim, min destûra pasaport û ya derketinê xwest.  Wezîrê karê hundir bi awayeke vekirî ji min re got ku du mehan sebir bike. Du îhtîmal hebûn: A yekemin, weke ku ez ê piştî du mehan bê pasaport û bê destûr biçim bû, ya duwem jî da diyarkirin ku ez ê ti

caran nikaribim ji Iraqê derbikevim bû. Bi rastî jî piştî mehek û şûnde, daxwaza artêşa Iraqê a li ser Ûrdûnê re bişine Beyrutê, Beyrutê bêxe destê xwe derket holê. Plan ev bû. Lê artêşa ku hatibû avakirin ji dêla biçe Beyrutê, ser Bexdatê de çû û ferîştebûna wî hilweşiya. Şoreşa 14’ê Tîrmehê pêk anî.

–Ev şoreş di bingeh de kê kir?

– Serbaz û leşkeran, bûn netewexwaz, aşitîxwez û azadîxwaz bûn, yanî gelek alî hebûn.

– Ma Kurd jî hebûn?

– Kurd jî hebûn. Piştî avabûna şoreşê û şûnde, di nameya min ji hikumeta şoreşê re şandî re, min diyarkiribû ku divê lihevkirina peymana Baxdatê bê redkirin, ger ev bibe em ê jî di hindirê Iraqê de îqtîdareke demokratîk ku xwe dispêre mafê wekheviya hemû mirovan piştgirî bikin. Piştî du rojan û şûnde, Polîtbûroya me kombû û lihev şêwirî, biryara avabûna heyeteke hat girtin û ev heyeta ku çêbibe divê biçe Bexdayê bi serokê hikûmetê re hevdîtin çêbike. Ez û endamê Polîtbûro Elî Abdullah çûn. Daxwaz û şarta yekem ku me ji hikumeta Şoreşê xwestî ev bû; wegera Barzanî, berdana girtiyan û ya Şeyh Ahmet bû. Şeyh Ehmet berdan û li Bexdatê bi cî kirin. Mele Mustafa, li cihê ku lê bû nameyeke ya pîrozbahiyê ji serokê şoreşê re şand, daxwaza hatina Iraqê kir.

Ez û Nuri Ehmet Taha, bi pasaporta sexte çûn paytexta Çekoslovakya Prag’a. Sextebûna pasaportê hikumeta Iraqê xwestibû. Beriya derbikevin derve wezîrê karê hundir-di heman demê de alîkarê serokwezir bû- dema me ziyaret kir- armaca me ya destpêkê anîna Mele Mustafa bû-, “min got: divê di cihê vekirî yê zagona bingehîn de Kurd û Ereb li ser vê xakê hevbeş bin û hiquqa Kurdan bikeve bin ewlayiyê.”

Di derbarê beriya ku em ji Bexdatê derbikevin, di xala duwemin ku min dixwest bînim ser ziman, hevalên li Kurdistanê hewcebû li her derê xwepêşandanan bidabana çêkirin. Ji ber ku di zagonê de tenê qala biratiya Kurd û Ereban hatibû kirin. Wisa kî Kurd bikaribin hinek mafan bigirin. Ya din jî ji yên heyî û partiyên ku di şoreşê de rist dileyîzin, ji bo di zagona bingehîn de ji bo Kurdan xweserî bê dayîn serî lê da. Lê ji van partiyan yekî jî vê nerîna me nepejirandin.

Wezîrê hundirîn ji me re got: "Dema ku hûn bi Mele Mustafa re vegeriyan, di ser Tirkiyê re newin, di Misrê re werin, ya din jî Cemal Ebdulnasir bibînin û mafên xwe jê bixwazin. Ger Nasir mafê we qebûl bike em ê jî qebûl bikin." Em çûn Pranga. Dema ku em ê bi Mele Mustafa re vegeribana, rayedarên Sovyetê ji me re gotin ku divê hûn ser riya Tirkiyê re neçin, ji ber dibe ku balefirên Tirkan bêxin. Em gihiştin Misrê. Em çûn Konsolosa Iraqê me agahiya Nasir ji hatina xwe ya wir çêkir. Wî ji me re got "hûn mîvanê dewletê ne." Piştre Nasir me pêşwazî kir. Di wê hevdîtinê de me ji Nasir re qala mafên xwe û gelê Kurd kir. Ji tiştên ku me jê re gotî nerazîbûn neda nîşan. Lê beriya ku em ji Bexdatê veqetin ji ber hinek tevgeran têkiliya di navbera Iraq û Misrê de xira bibû.

Rojek dema ku ez bi elçî re rûniştibûm, hevalê min yê li gel min hat ji min re got elçiyê Tirkan aciz bûye û naxwaze we bibîne. Min jî diyar kir ku ti hevdîtineke me pê re nîne, lê ger bisekine dikarim bibînim. Di vê kêliyê de elçiyê Tirk ji nişkave ked hundir; hat pêşiya min sekinî û bi awayeke tund muzakereyek da min, bi gotin jî, "got ji ber sedema te xwe têkilî karê me yê hundir kiriye ez li ser navê dewletê te protesta dikim." Min pirs gir ka bêje karê me xwe têkil kirî çî ye. Ji min re got: "Meseleya Kurd e." Min got me mudaxele nekiriye, têkiliya we ya bi meseleya Kurd re çî ye û min domand. Ji min re got "na." Baş e di radyo, rojname û tv yan de ti

gotineke Kurd derbas nabe. Di heman demê de di ti mijarên we de peyva Kurd derbas nabe. Ji min re di dewleta we de peyveke ya Kurd nîşan bidin ka em bizanibim me çawa xwe têkilî karê we yê hundirîn kiriye. Li ser vê elçiyê Tirk aciz bû û çû carek din jî nehat.

Tirk çima evqas meseleya Kurdistanê, bi taybet jî meseleya Bakurê Kurdistanê giring dibînin? Ji ber ku dewleta Tirkan di derbarê Kurdan de polîtîkayeke xwe ya hişk û înkarê heye. Hikûmeta Tirk tenê ne dijminatiya Kurdên li Bakurê Kurdistanê dike, dijminatiya hemû Kurdan û Kurdên li parçan jî dike.

Tirk, dijminê Kurdan yê esasiye, ji ber ku heya niha ne nasnameya Kurdan ne jî karîne navê wan qebûl bikin. Ji ber vê, Kurdeke welatparêz, divê rastiya Kurdê resen û heqîqî baş derxe zanebûnê û binase. Di rewşa ku Kurdên li Bakur mafê xwe ji Tirkan girtin û heya Kurdên li Bakur mafê xwe bidest nexin, di parçeyek din de dewleteke serbixwe bê avakirin û hemû cîhan me destek bike jî, heya li Bakurê Kurdistanê pirsgirêka Kurd neyê çareserkirin-pirsgirêka esasî Bakurê Kurdistanê ye- hilweşandina dewleta Kurd a ku bê avakirin jênereve. Dewletên din kêm jî bin, navê Kurdan û nasnameya wan dinasin. Lê dema ku Tirk nasname û navê Kurdan qebûl nekin, ji bo Kurdên di parçeyên din de weke ku wê ti mafeke wan nebe û nikaribin bijîn, heta wê mafê wan yê jiyankirinê jî nebe. Ji ber vê sedemê baweriya min ev e ku, hemû Kurdên bişeref, durist,birûmet, ne tenê pirştgirî dayîna vê tevgerê,ev tevgera ji bo gelê Kurd a modern ya ji bo gelê Kurd ku di pêşengatiya PKK’ê de dimeşe û serokatiya wê serokê binirx Abdullah Ocalan dike bimeşe û bixebite.

Serkeftina xilasiya netewa tevgera Kurd Bakurê Kurdistanê ye, di destê Kurdên li Bakurê Kurdistanê de ye û ev diyarker e. Beriya du mehan min li Londrayê di bin vê sernivîsê de semînerek jî da.

– Tu dikarî heya 1970’yan bêyî, dikarî nirxandinên xwe bidomînî.

– Piştî ku min serok û hevalê xwe yê weke we dît û şûnde, ez bûn yek ji we û bûm endam. Ez xwe ne weke yêkî 80’î salî, xwe gelek ciwan hîsdikim. Dikarin bi demjimêran baxivin. Dizanim, hûn xwîna xwe dirijînin fedekartî dikin, ez jî dikarim ji xwe fedekartî bikim.

– Tişta ku mirov dide axiftin çî ye? Dema ku armanc mezin be, mirov dikare heya sibehê bidomîne. Yanê heke şûnek din ba, we yê nikariba sondeke bi vî rengî bidin û wisa ciwan bibin.

– Rast e.

– Hûn ser armanceke mezin meşiyan û mirov heya dawiya cihanê jî biçe teng nabe.

– Tiştê ku we kirin, rê li ber hêvî û xiyalên min bên cî vekir û hêla ez xwe ciwan hîsbikim.

– Armanca we çi bû? Kurdistan bû. Ji ber vê beriya 1947’an partiyek tê avakirin, belav dibe, kom dibe. Bêguman hemû ji bo vê armancê bû. Niha jî tê dîtin ku, PKK derî û kilîda Kurdistanê ye, gelê Kurdistanê bi xwe ye. Mamoste Hawar û heval jî baş dizanin. Dibe ku gavên biçûk hatibin avêtin, lê bi rastî mezinahiya PKK’ê çî ye? Ji bo Bakurê Kurdistanê gaveke biçûk e, ev tê wateya ji bo hemû Kurdistanê serkeftinek mezin e. Di Bakurê Kurdistanê de gavek avêtin û pêşdeçûyîn, tê wateya li Başurê Kurdistan û li

Rojavayê Kurdistanê hezar metre pêşdeçûyîn e. Yanî ev qas girîng û bi bandor e.

Di mijareke din de, bi avabûna şoreşa mezin a li Bakurê Kurdistanê re, Tirk niha amadene ku bi hemû Kurdan re alîkarî bikin, dewleta federal jî qebûl kirin. Ev xaleke giring e.Lê tenê Kurdên di Parçeyên din de qebûl dikin. Li ser şoreşa Bakur şereke taybet tê meşandin. Lê PDK qebûl dike, alîkarî dide. Federesyona li Başur qebûl dike û alîkarî dide Mesut û Celal. Ger di Bakur de nasname û şoreşa me binase, hûn ê li Başur bibin dewlet. Wê li Rojavayê Kurdistanê dewlet çêbibe. Ji ber vê dibêjim ku, ger hûn dixwazin bibin dewlet, piştgirî bidin şoreşa Bakurê Kurdistanê. Pêngava ku niha em li Başurê Kurdistanê dikin, ji bo şoreşa Bakurê Kurdistanê ye; ne ji bo mûdaxeleya Başurê Kurdistanê ye. Ger dixwazî alîkarî bikî, ev şere bimeşîne. Ger em vê Şoreşê bihêz bikin, wê meseleya Başur bê çareserkirin. Mamoste Îbrahîm Ehmet vê meseleyê baş dizane. Li ser vê bingehê hewceye li ser kurahiya wê bê sekinandin. Mamosta Hawar jî dikare di van mijaran de nerînên xwe bide. Divê em gelek li ser vê babetê bisekinin.

Em hatin dîroka 1960’î, yanî destpêka şoreşê...

Piştî Şoreşa 14’ê Tîrmehê û şûnde, ji bo gelê Başurê Kurdistanê firsendeke derdikeve holê. Lê ev parçe, di vê dîrokê de di demeke kin de weke ku meseleya Kurd çareser nekir, girantir dike. Bi destpêkirina Şoreşa 1961’an re ji ber derxistina nexweşiya sewapê, xirabiya dijberiya ku bê avakirin ji başiyan zêdetir e. Sedema vê jî serok e. Gelek textîkên nebaş jî hene. Di encam de li Iraqê dîktatorî serwer bû. Tevgera Kurd gelek lewaz ket, heya niha jî ev lewaztî didome. Di vê wateyê de ziyan da hemû Kurdistanê. Li ser tevgera Kurd dîktatorî çêbû. Li Iraqê jî dîktatorî hat avakirin. Ev herdu hikumetên dîktator û bi alîkariya hêzên derve re, di encam

de Kurdan gelek ziyan dît. Di nava 4-5 salan de ev ziyana ku li Kurdistanê hatî kirin, dikarim bêjim ku ji ziyana şerê cîhanê yê duwemin zêdetir bû. Kurdistan ji 1945-1960'î ve ziyaneke bi vî rengî nedîtibû. Piştî 1960'î serokatiya Barzanî her tiştî teng dike.

Mamoste jî di van salan de têkoşîn kir. Çima wisa çêbû? Şaşitî çibû, rastî çibû? Çima serwer nebû? Serokatiya Kurd a burjuwa û partî di çi rewşê de bû? Di encam de ev dîktatoriya li Iraqê avabûye û tevgera Kurd çima tine bû? Çima ev nexweşiya di serokatiya Kurdan de ev qes mezin bû?

– Tevgera Kurd di dema Evdilkerim Kasım de, meseleya Kurd tenê ne li Başur, di parçeyên Kurdistanê yên din de jî bû yek ji pirsgirikên demê yên bingehîn. Ji ber yek ji pirsgirêkên cîhanê û herêmê bû, pêdiviya li ser sekinandinê derket holê. Heta di cîhanê û herêmê de dewletên têkiliyên wan bi Iraqê re, konsolostiya Iraqê, bi tevgera Kurdan re xweser eleqedar dibû. Li gel PDK tevgereke siyasî bû, weke temsîla geleke jî didîtin. Hikumeta Iraqê cara yek di derbarê xaka Iraqê de îtiraf kir ku ev xak ya Kurd û Ereban e. PDK'ê jî weke partiyeke siyasî ya Kurdan qebûl kir. Li ser vê li Bexdatê rojnemeya weşanxaneya PDK'ê ya bi navê Xebat me di dema Ebdulkerim Kasim de dest bi weşana wê kir. Ev weşanxane, nivîsên di derbarê Kurdên li Îran û Tirkiyê de bi awayeke vekirî û azad di vê weşanê de dihat weşandin.

Asta azadiyê ya ku tevgera Kurd li Iraqê gihiştiyê, şoreşa Ebdulkerim Kasim li herêmê li hember metîngeriyan, ji ber ziyanê da welatên weke Iraq, Tirkiye û Ereban ev bû sedem ku ev welat li hember vê şareşê helwest bigirin. Dewletên navê wam derbas bûyî di vê demê de li hember Kurdan, Ereban û li hember Komara Iraqê dest bi komplo û lîstikan kirin. Ev dewlet, di hundir de di dema Kral Faysal de xwe dispêra bercewendiyên xwe yên li gel hinek eşîrên

Kurd û Ereban, dixwest rejîma melîkiyê şûnde bînin. Ji ber ku bercewendiyên ev hawirdor, ji hêla A.Kerim Kasim ve dihatin cî. Ev dijberî, li gel welatên mîtinger, ji hêla DYE yê ve jî piştgirî dihat dayîn. DYE, li hember rejîma Kasim, ji Musilê destpêkir, planeke hêdî hêdî hemû Iraqê bigire nava xwe hedef girt. Beriya derbeyeke wisa destpê bike, bi taybet jî bi Kurdan re guftugo çêkir. Ya din jî bi PDK'ê re ketin nav têkiliyê û gotin; " partiya we tevgera ku li hember Kasim bide çêkirin, em ê di warê madî, manevî û çek de destek bikin." Heta ji me dost û endamên me xwestin bişînin Lûbnanê- gel tevgerek Hirîstiyan ya Lûbnanê- perwerde bikin, heta gotin em ê wan biçek bikin û bişînin. Ev jî xwestin li hember Kasim bikevin tevgerê.

Tabî weke me vê qebûl nekirî, em çûn me vê planê ji A. Kerim Qasim re got. Bi mîsoger ev plan tenê li hember Qasim nebû, di heman demê de li hember tevgera Kurd jî bû. Eşîretên Kurdan li hember Qasim dijberiya xwe domandin. Li Musilê li hember derbeya bi navê Savat PDK û Gelê Kurd piştgirî dan Qasim. Dema ku rewş hinek hat guhertin, A. Kerîm Qasim li Iraqê destur da avakirina sazûmanên nû. Em ji yek ji yên yekem serlêdan kiribûn. Ji bo PDK ser navê Kurdan bê avakirin me serlêdan kir, lê hikumeta Iraqê daxwaza me nepejirand. Me heyetek ji merkeza partiyê ava kir ku biçin ji Qasim re bêjîn serlêdan bikin. Li vir ji çend Polîtbûroyên ji serokatiya Barzanî û min têde cî digirt.

Hikumeta Iraqê hinek beşên bernameya partiya me qebûl nekir ango li hember rabibû. Liber rabûna wan ev bû: Ya yekem, di bernameya me de tişteke wisa derbas dibû: Çawa ku her kîjan Ereb tê Iraqê nasnameya hemwelatiyê digire, her kîjan Kurd jî dema hat Iraqê bikaribe nasnameya Iraqê bigire. Xala duwemin ku dijber derketin ev bû, weke PDK li her parçeyê ku Kurd lê dijîn, wê parastina mafê wan bi riya dîplomatîk esas bigire. Weke partî daxwazeke me

din jî, bi awayeke fermî hikumet di derbarê Kurdan de otonomiyê qebûl bike bû. A.Kerîm Qasim ser navê partiyê liber rabû, dixwest peyva partiyê ya bi nabê Kurdistan bê rakirin, ji dêla wê bikin Başur. Me jî herî zêde ti sedem nedidît ku navê partiyê bidin guhertin. Piştî gelek nîqaşan û şûnde Qasim got: "Hûn azadin ji bo armancên di bernameya xwe de têkoşîn bikin, lê divê hûn ji derveyî fermiyet û zagonê tevnegerin. Got "bila ev nekevin zagonê." Bi vî rengî destûr dan partiya me siyasî bibe.

Me cara yekem li metrepolên metîngeran civîneke legal çêkir. Wê demê Mele Mustafa li Barzanê bû. Her çendî me xwest bê bejdarî vê konferansê bibe jî red kir. Wezîrê parastina Iraqê ji me re gotin konferansa xwe bidomînin. Yê ku vê agahiyê ji me re anî jî wezîreke Kurd bû. Me got, em ê emrê Qasim bicî bînin û me heyetek avakir şand Barzanê. Me hewlda ku Barzanî îqna bikin, bênin konferansê. Di dawiya hemû hewldanên me de me karî tevlî rûniştina dawî ya konferansê bikin. Di vê rûniştinê de,hilbijartin ji bo komîteya merkezê û politbûro- ya nû- dihat çêkirin. Dema me di konferansê de axiftinek ji wî xwest, bi xîtabeke gelek nexweş, bi nêzîkatiyeke li hember konferansê jî di asta bêrêziyê de û bi şêwayeke ku li Mele Mistafa jî neyê, got; "ez nehan (tenezûl) nabînim bibim serokê vê partiyê." Me reyîsên eşîran yên di bîroyên Kurdistanê de dixebitin derxist, divê em tevbigerin, got me wan êşandiye. Li gel van, ji min re got; "hûn dibêjin serokê partiyê, lê ger we ji min re dijun bikiriba ji vê baştir bû" û partî bê wate bû. Li ser vê axiftinê civîna me paşde hat xistin.

Roja 9'ê Gulanê bi wesîleya roja sazûmaniya Çekoslovakya yê em çûn Konsolosluxa Çekê. A. Kerîm Qasim jî li wir bû. A. Kerîm Qasim hat gel min bi awayeke vekirî, got; "di konferansa ku we lidar xistî de, bi awayeke giştî xeta te bi temamî destek dikin û

gotinên we hemû dizanin." Ya din jî bi awayeke veşartî reqema telefona xwe da min û got; " di kîjan demjimêr û demê de bixwazibî bi min re biaxivî ez amade me. Ev axiftina ku Qasim bi min re kirî bi awayeke ecêpmayî, bi yên derûdora xwe re şêwîrim. Min got em sibe civînek lidar bixin. Ji ber ku ji Behdînan hinek heval dixwestin wê şevê biçin Behdînan. Bi qasî ku min ji Ebdulkerim Qasim fêm kir, pîlana ku li ser partiyên din dayî meşandin dixwest li ser me jî bide meşandin, tiştên ku dayî wan dixwest bide me jî.

Ebdulkerîm Qasim mirovekî pir zana bû. Bi taybet di tasfîyekirina rêxistinan de û li beramberî hev rû bi rû hatinê de husta bû. Mînak, rêxistina komînîstan kir du beş û yek jî bi xwe ve girê da.Yanî di van mijaran de gelek husta bû. Partiya tinê mayî rêxistina me bû. Dixwest vê leystokê bi me jî bike û me bike du beş. Lê xebata me ya di mijara yekbûyîna rêxistinê de, bi awayeke serkeftî bidawî bû. Lê her tim hinek tiştan di rojevê de digirt. Di nava rêxistinê de demokrasî nînbû, me jî ji bo rêxistin belav nebe, hinek tişt bi mecbûrî qebûl dikir. Hindek ji me jî li ber vê rewşê disekinin. Em di fikra ev kar, ne kareke demokratîk e de bûn.

Mele Mustafa dixwest hinek mirovan hilbijêre û bêxe nav merkeza partiya me. Lê li hember van hat derketin û ev mirov ji partiyê hatin avêtin. Ji ber ku ev mirov ne mirovên ku ev kar bidin ser milê xwe bûn. Dema ku rexek bi vî rengî bû, di aliyê din de jî hinek agahiyên ku gihiştin destê me hebû. Ev jî têkiliyên Mele Mistefa bi eşîretên li hember Ebdulkerim Qasim re û piştgirî dayîn bû. Ji bo rastiya van îddîayan bê zanîn, min xwest bi Mele Mistefa re hevdîtin çêbikim. Mele Mistafa jî digot; "ev rewş ji bo me baş e, divê ev bê nirxandin." Min got sedema vê çî ye, hûn çima piştgirî dikin. Ji min re got; "Ebdulkerîm Qasim bawerî nade leşkerên xwe." Ditirse ku ger çek bide leşkeran wê li hember wî bidin bikaranin. Di rewşeke bî vî rengî de, Ebdulkerim Qasim tehdît kir û xwe

sipart eşîretên Kurdan yên dijber, got ji bo Kurdan em dikarin ji Ebdulkerim Qasim hinek tawîzan bigirin.” Min jî jê re vê got: Ne artêşa Iraqê û ne jî Ereb ji Ebdulkerim Qasim hez dikin. Ji ber ku li Iraqê serokomarê cara yekem û bi awayeke fermî hebûna Kurd û mafê wan qebûl dikeye. Bawer dikirin ku wê Ebdulkerim Qasim Iraqê parçe bike. Şêx û fermandarên Iraqê li hember Kurdan amadene ku heya dawiyê van çekan bikar bînin. Yanî bi yek mermiyê dixwestin li nîşanê bixin. Ew yekem dijminê li hember xwe Kurd dibînin û bi çekan dixwazin Kurdan tine bikin. Min got; ya yekem, Ebdulkerim Qasim li piştê Kurdan derket; ya duwem, yê ku cara yekem Kurdan xirst nava hikumeta xwe Ebdulkerim Qasim bûye û dizanin ku Kurd Ebdulkerim Qasim destek dikin.

Mele Mustafa ev nerînên min qebûl nekir. Ev nerîn jî ne nerînên min, nerînên partiyê bû. Piştî hingê Mele Mustefa carekdin vegeriya minteqa Barzan û bi eşîrên Kurdan yên li hember Qasim re têkiliyên xwe pêşdetir bir û ji bo têkoşînkirinê dest bi amadekariyan kirin. Me jî carek din dest bi têkilî bi Partiya Komînîst û ligel hinek partiyên din kir. Bi taybet me jî dixwest, mafê ji Kurdan re hatiye dayîn bênasîn û biryarên ji bo wan hatine girtin bên dayîn û ji bo wan gav bên avêtin. Dîsa me li hember yên dijbertiya Kurdan dikirin, yên li hember doza wanin ketin nav hewldanan. Me di komîteya xwe ya merkezê de biryarek derxist ku li hember Qasim şer neyê kirin. Ji derveyî du kesan herkesî ev biryar pejirand. Me got li hember Ebdulkerim Qasim şerkirin tê wateya mafê ji Kurdan re hatiye dayîn redkirin e. Disa bi şerkirina li hember Ebdulkerim Qasim re, em ê rê li ber afirandina navenda azad û demokratîk ku dixwazin bidin afirandin bigirin; lê ger Qasim şertên me qebûl neke, em ê wê demê şer bikin. Em ê daxwaza bikaranîna demokrasiyê bikin, ger li hember eşîreta Barzan jî şer bike, em ê bersiv bidin. Ji bo ev biryara me bê erêkirin me bi riya nameyek ji Mele Mistefa re

rêkir, qebûl kir. Tenê xalek nepejirandibû. Ew ji mijara parastina eşîreteke din bû.

Bombebarankirina General Qasim ya gundê Mele Mistafa û li hember wî şerê Barzanî.

Kesê ku nameye Mele Mistafa bir, dixwaze biçe gel eşîreta din mizgênî bide wan. Lê lirashatinek wisa ye ku di wê kêliyê de di mala wî sermiyanê eşîretê de civînek mezin çêdibe. Serokên eşîran hemû li wir bûn. Heval, dixwaze biryara Mele Mistafa ragihîne. Ji sermiyanê (reis) eşîretê re dibêje; “ ev çi civînin, divê tu berdî, peyama Mele Mistefa ji te re heye” û bivî rengî peyamê radigihîne. Sermiyanê eşîretê ji berîka xwe nameyek derdixe û dide hevalê me yê name biribû. Mele Mistefa di vê nameyê de ji serokê eşîretan re gotibû; ti caran bawerî nedin hevalên me yên partiyê, guh nedin meseleyên partiyê, karê xwe bidomînin, xwedê bi we re be.” Derket holê û hat dîtin ku ev tevgera li hember Ebdulkerim Qasim e, him ji derve de piştgirî digire û him jî di bin venêrîna reîsên eşîretan de ye. Ev jî ji derveyî bercewendiyên xwe yên kesî tiştek din nedifikirîn.

Me dîsa xwest vê binirxînin. Weke gava yekem me xwest giraniya tevgerê ji çiyan û gundan bînin bajêr. Ya yekem, bi xebata ku em di bajaran de bikin, di hemû bajarên Kurdistanê de di 6 Îlonê de- dîroka 6 Îlona 1961’an salvegera qetilkirina ji pêncî zêdetir Kurdan bû- me got ji bo bîranîna wan xwepêşandanek lidar bêxin. Dirûşmeya tevgeran, mafê ku ji Kurdan re hatiye dayîn jiyanî bibe û federasyona Kurd-Ereban bê pêkanîn bû. Ev xwepêşandana me bi awayeke serkeftî bi dawî bû. Merkeza partiyê ji ber armanca rewşa derketî holê bê destgirtin, biryara kombûnê da û em kom bûn. Di wê demê de hinek tiştên ne di cih de ku rejîma Qasim kiribû hebû.

Dema ku şêx û axa li hember Qasim derdiketin, hinek karker,gund û xebatkar jî li hember Qasim cî girtin.

Dema me van rewşan dît, em bi hinek Partiyên Komînîst yên Iraqê re û bi hinek partiyên din re axivîn. Me got li hember rewşên ku dema pêş derbikevin de divê em amadebin û ji civakê re pêşengatî bikin. Lê mixabin kesî bersivek neda me û xebata me vale derket. Dîsa ji bo mafê Kurdan min ji Ebdulkerim Qasim re name dişand. Lê weke ku Qasim divê mijarê de ti gav navêtî, partiya me jî qedexe kir, helwesteke ji derveyî demokrasiyê girt. Heta hinek girtin jî çêbûn. Min jî di wê demê de xwe veşart. Berteka Ebdulkerim Qasim li hember min jî hebû. Di dema Kraltiyê de ji eşîreta Xoşnav kuştina keseke nêzî Qasim digot tiliya min di nav de heye. Ji bo girtina rojnemeya Xebat jî biryar derxistibû.

Ji bo bejdarî kongrê bibim vegeriyam Sûleymaniyê. Roja ez gihiştim Sûleymaniyê, Ebdulkerim Qasim bi balefiran Sûleymaniyê bombabaran kirin. Tevî ku bajar di bin venêrîna rejîmê de jî bû, Sûleymaniyê bombabaran dikir. Di heman demê de balefirên Iraqê ji hewayê de belavok davêtin. Di belavokê de, dihat gotin ku “ Ehmet û Mele Mistafa ne daxîlê hikûmeta Iraqêne û dijberê şoreşa Iraqê ne.” Me jî ji bo em ji Mele Mistafa rewşê fêm bikin, me hinek hevalên xwe şand gel. Me dixwest tiştên ku Qasim dibêjîn raste yan jî nerast e fêm bikin. Di şerê di navbera eşîrên Kurdan yên ji derve de tên rêvebirin û hêzên Qasim de, di pevçûnên şeva yekem derketî de, hêzên eşîran nikarin li ber xwe bidin ji herêma şer rewîn. Qasim jî liberxwenedana wan firsend dît û gundên Barzanî bombabaran kir. Ger Ebdulkerim Qasim gundê Mele Mistafa bombabaran nekiriba, Barzanî li hember wî şer nedikir.

Me kongreya partiyê li gundeke nêzî Sûleymaniyê lidar xist. Me ji partiyên Iraqê xwest ku ji bo ev şer bê rawestandin, bi

Ebdulkerim Qasim re hevdîtinan çêbikin. Me nedixwest di navbera hikûmeta wî û Kurdan de şerek derbikeve. Wê demê Ebdulkerim Qasim efuyek giştî derxist. Dixwest eşîrên Kurdan yên li hember wî derketin teslîmê artêşê bibin. Ez di wê konreyê de bûm. Ji Mele Mistafa nameyek hat. Di nameyê de digot, jiyana min di xeteriyê de ye, dixwest em hinek kesan bişînin gel. Me jî sed kesên biçek şand gel Mele Mistefa. Me jî got ger Ebdulkerim Qasim hêrîşî ciheke din Kurdistanê bike em ê li hember derkevin û şer bikin. Me xwe birêxistin kir, di demeke kin de me hemû qadan xist destê xwe. Li gorî biryara ku me girtî, di navbera du mehan de li her gundekê komîteyek ji pênç kesan bên avakirin. Ev komîte wê gundan bi rêxistin bikin û hemû karan bidin meşandin. Me dadgehên ji pênç kesan ava kir. Her yek ji van wê li 25 gundan mêze bike, ger yên di rewşên sûcan û yên sûc kirîn de hebe dê ceza bike.

Bi careserkirina hemû meseleyên siyasi re, me heyetek ava kir. Dîsa me heyeteke ku ji derve de raya giştî amade bike çêkir. Erka vê, daxwaza me ya ku em desthilatiya xwe li Kurdistanê bidin avakirin li cîhanê belavkirin bû. Me pirsgirêkên xwe hêdî hêdî çareser dikir û pêşve diçûn. Di aliyê din de, pirştgiriya gel her roja ku diçû zêde dibû. Me ji kesê yek qurîş negirt. Her tiştê me bi alîkariya gel dida me pêk dihat. Di demê de tenê ji Kerkûkê her meh şazdeh hezar digihişt destê me. Em li çar aliyên gundên Kurdistanê belav bûn. Bi gundiyan re têkiliyên me gelek baş bûn, me bi gel re pir xweş derbas dikir. Dema Mele Mistafa vê bihîst gelek aciz bû. Ji ber navenda wî li cihek din bû.

Li Kurdistanê partiyên cuda jî hebû, ev li ser navê partiyên xwe dixwestin artêşê bidin avakirin. Me jî ji wan re got mesele çiye, ger bixwazin em dikarin tê de cî bigirin. Mele Mistefa, pênç Barzanî bi nameyê ve ji me re şand. Ez van mijaran ji bo têkiliyên di navbera Mele Mistefa û komîteya merkeza partiyê de bê zanîn dibêjim. Di

hinek mijaran de em li hember Barzanî bûn. Me nedixwest ne Partiya Komînîst ne jî partiyek din di Kurdistanê de bi cî bibe. Me nameyê redkir û ji wan pênc kesan re got divê hûn vegerin.

Ji du gundan nêzî bîst kesan hatin gazincên xwe ji pênç Berzenciyên ku çûne li malên wan bûne mîvan kirin. Yanî ev pênç Berzenciyên çûne malên wan zorî li wan kirine ku ew van pênç kesan îkramî malên xwe bikin, tangav kirine. Di ser de jî ji gundiyan re heqaret kirine. Me heman zilam rêkir wan pênç Berzenciyan kişandin. Me ji wan re got: "em weke pêşmerge mafê me heye em du tiştan ji gel bixwazin: ev jî nan û av e, ji derveyî vê ti mafeke din yê pêşmergeyan nîne." Di wê qadê de rewşa pêşmergeyan ji ya gundiyan baştir bû. Rêzkariya (disiplin)me ji bo xilasiya gel û gundiyan bû, ne ji bo raydayîn(gösteriş) bû. Ev polîtîkaya me ne reyîsên pêşmergeyan, ne dewletên metînger, ne jî Îsraîl dipejirand.

Di têkiliyên me yên derve de jî rewşa me bivî rengî bû: ji bo têkiliya me ya bi Îranê re jî me Omer Mistafa û Elî Esker şandibû. Me ji Îran dixwest ku ji bo têkoşîna me ya li hember Ebdulkerîm Qasim alîkarî bide me. Halbûkî Ebdulkerim Qasim bixwe dijminahiya rejîma Îranê nedikir. Em li benda bersiva ji Îranê bên bûn. Bersiva Îranê bû ev: "Rêveberiya Îranê nikare alîkarî bide tevgereke komînîst; Îbrahîm Ehmet û Fevzî jî komînîst in. Jixwe keseke Mele Mistefa nîne. Ger hûn ji me alîkarî dixwazin se, divê hûn dest ji van fikrên xwe berdin. Wê demê em ê alîkariya hûn dixwazin bidin." Li ser vê, Mele Mistafa min şand gel Şahê Îranê û xwest ez Şahê Îranê qaneh bikim.

Wê demê min her tişt qebûl dikir, lê min dîtina Şahê Îranê qebûl nedikir. Min got ez naçim gel Şahê Îranê bila yek din biçe. Dema ev nehat qebûlkirin, min îstifaya xwe him ji sekretertiya partiyê û hin jî ji komîteya merkezê danî. Dema zêde israr kirin, min

got ez ê îstifaya xwe ji partiyê jî bidim. Ev agahî gihişt Mele Mistefa. Wî jî bi riya Salih nameyeke ji min re şand. Mele Mistefa di nameya xwe de vê digot: “Te gotiye ez amademe heta jiyana xwe di ber ogira gel de feda bikim. Em îro di demeke pir zehmet de ne. Ger kesayetên ku dibêjin ez Kurd im û welatparêz im fedekartiyên mezin nedin bercavên xwe, wê tevgera me nikaribe çembera ku rejîma Îranê daniye dora me bişkîne û bigihe serkeftinê.” Him ji ber vê sedemê û him jî hevalên min hemû biryar dabûn ku ez biçim. Ez jî bi neçarî çûm. Li Îranê bi dêrindêzek (törenle) mezin ve hatim pêşwazîkirin.

Di nava rojên ku ez li wir mayîm de, wezîrek,di heman demê de alîkarê wezîr bi min re hevdîtin çêkir. Ji min re got “tu êvarî mîvanê min î. Em ê biçin Şah bibînin, pirştre bi hev re bixwîn,vexwîn û baxivîn.” Em di qurfa wî de rûniştîbûn. Li gel me di asta jor de çend kes din jî hebûn. Em di derbarê şer de daxivin. Ji min re got, “nivîsa di rojnameya Xebat de ya li hember Şah hatî nivîsandin kê nivîsandibû?” Di wan deman de Îhsan Nurî ji Paşa Mistefa re nameyek şandibû. Bi taybet di derbarê nivîsa Mistefa,ya li ser Şahê Îranê ku Şah li ser Kurdên Îranê zextê çêdike, weke bersiv dayîna nameya wî min, sê nivîsên berfireh nivîsand. Min piştre lêkolîn kir ku nameya Îhsan Nurî Paşa di mercên asayî de nehatiye nivîsandin, bi zorê pê dane nivîsandin. Wezîr ji min re got; “ger Şah li ser nivîsê pirs bipirse tu yê çi bêjî?” Min jî jê re got, ez ê bêjîm min nivîsandiye. Wî jî got, tu him hatî alîkarî dixwazî, him jî dibêjî min li hember Şah nivîs nivîsî.” Min jê re got di vir de tiştek ecep nîne. Ez ê ji Şah re vê bêjîm: Dema Kurdek dikûje bila bizanibe ez wî destek nakim. Na, ger Şah ji bo derketina Kurdan a ji bin zilmê destek bike, wê demê ez ê jî wî takdîr bikim. Em li hember we dijminahî nakin. Em dijminahiya Tirkan û Farsan nakin. Em li hember yên me dikûjin, zilmê dikin dijminahî dikin. Ya din jî min got, ez ê ji Şah bipirsim ka wê piştgirî bide me an na.

Wê demê bi Şah re telefonê axivî. Alîkarê wezîrê derve yê DYE hatibû Îranê. Di wan demjimêran de li gel Şah bû, ji ber vê sedemê bi Şahê Îranê re hevdîtina me çênebû. Ez pazdeh rojan li Îranê mam, lê wê kengî Şah min bibîne nedigotin. Tenê tişta gotin ev bû, pêncî çek, bist hezar dînar bû. Li ser vê hêvî dikirin ku ez ji wan re sîpasî bikim. Min ji wan re got alîkariya ku hûn bi partiyê re dikin bila serê we bixwe û ez vegeriyam Kurdistanê. Min ew çek û pere ji Mele Mistefa re şand. Min ji nêzîkatiyên Îran û ji yê Şahê Îranê vê derxist: heta ku komînîstên weke min alîkarî bide Mele Mistefa, ne munkûne piştgirî bidin tevgera Kurdan. Tişteke ku me guhdar nakîn nîn bû, me guhdar dikir. Lê dema ku Mele Mistefa ket bin bandora Şahê Îranê û şûnde, tam bû mêze(maşa). Mele Mistefa ji sedî sed ket bin bandora Îranê. Yên girêdayî me bûn ji sadî pêncî kitin bin bandora Îranê.

Hinek rêxistinên Iraqê bi me re îtîfaq danîn. Piştre yên girêdayî kralyetê yan jî komên li Iraqê xwe kralcî bi nav dikin xwestin bi me re hevalbendiyê(ittifak) bidin avakirin. Lê kralciyan nedixwestin ji derveyî tiştên di dema kraltiyê de dane Kurdan tiştek din bidin wan. Rêxistinên din dixwestin hinek tiştan bidin. Bi van re axiftinên me yên cur be cur çêbûn. Amadekariyên van yên ku li hember Ebdulkerim Qasim bikevin nav tevgerê jî hebûn. Tişta ku ji me dixwestin ev bû, em piştgirî nedin Ebdulkerim Qasim. Dixwestin ji gelê Kurd piştgirî bigirin. Şartê wan yê pêşîn, digotin ger şoreşa me bigihe serî, em ê meseleyên otonomiyê bi awayeke fermî çareser bikin. Mele Mistafa jî wê bibûya berpirsyarê herêma xweser. Di hikûmetê de çar wezîrxane(bakanlık) ayîdê Kurdan bû. Bi gihiştina serkeftinê re dibûya di navbera Kurd û Ereban de jî aşîtî çêbibûbaya.

Me ji Mele Mistafa re agahî şand. Me jê xwest çend kesên din ji bo wezîrtiya hikûmeta nû ya bê avakirin amade bike. Di 8’ê

Reşemiya 1963’an de hêzên Iraqê yên şoreşger li hember dîktatortiya Ebdulkerim Qasim serkeftinê bidest xistibûn. Me radyoya Bexdayê guhdar kir, di ti belavokên wan de navê Kurdan derbas nedibû. Radyoya Bexdayê ya bi navê Salih Yusuf Fuat belavoka pîrozkirina derebeyê dixwend. Li ser vê me weke komîteya merkeza partiyê civînek çêkir. Me ji Mele Mistafa re agahî şand, me got divê bi awayeke lezgîn em hemû bajarên Kurdan bixin destê xwe.

Em, Mele Mistafa, bi baweriya ku wê alîgirên Ebdulkerim Qasim yên ji îqtîdarê danîn û hinek rêxistinên din jî alîkarî bidin û ji bo bajarên Kurdistanê bidest bixin fersendek hebû.Me got em tevgereke wisa di bajarek de destpê bikin, ger şartên me qebûl bikin em ê piştgirî bidin wan, bi vî rengî em ê li Kurdistanê otonomî bidin rûnişkandin; ger qebûl jî nekin em ê li hember wan şer bikin; me got wê alîgirên Ebdulkerîm Qasim jî alîkarî bidin me. Mele Mistefa li me guhdar kir got ev fersenda dîrokî em ê binirxînin, li pêşiya gel bi awayeke vekirî digot; “ Îbrahîm Ehmet destpêkê xwest em li hember Ebdulkerîm Qasim şer bikin, em ji Ebdulkerîm Qasim xilas bûn, niha jî dixwaze em li hember îqtîdara nû şer bikin.” Lê, vê weke daxwaza komîteya merkezê rave nake, dibêje ev nerîna Îbrahîm Ehmed e. Me çima li hember Ebdulkerîm Qasim şer kir, tenê ji bo binkeftina wî bû?Tabî ji bo berjewendiyê netewe bû. Ev helwesta Mele Mistefa ya nebaş, bû sedem ku ev fersenda mezin ji destê me derbikeve.

Di wê demê de derfeta me ya ku em artêşên Sosyalîstan bînin Iraqê hebû. Ji ber yên hatine ser îqtîdarê li hember komînîstan qetlîamên mezin kiribûn. Ev mantiqê eşîrî û tarzê feodal bû sedem ku şansê hinek fersendên mezin ne tenê deh caran sed caran ji destê me derbikeve. Her tim li pêşiya tevgera neteweya Kurd bûye astengek. Di vê hindamê herweha di mekaleya xwe ya li ser Komara

Muhabatê nivîsandî de gotineke bi vî rengî kiribû; “ divê ji serokên şoreşgerên Kurdan û ji serokên eşîretên Kurdan encaman derbixin da ku carekedin nekevin rewşekedin wisa nebaş. Yanî bila neşibin wan.” Bangawaziya Hikûmeta Iraqê yên di derbarê Mele Mistafa de hebû. Mele Mistefa konferansek li dar xist. Dixwest komîteya merkezê bejdarî konferansê bibe. Di vê konferansê de daxwaza xwe ya bi hikûmeta Iraqê re hevdîtinê çêbike anî ziman. Celal Telebanî jî yek ji endamên wê demê bû.Wê demê Mele Mistefa çû Baxdayê ji wir jî çû Misrê. Li ser vê pirsgirêkê bi Nasir re axivî.

Di wê demê de ji me re nameyeke ya Komîteya Merkeza Partiya Baas ê hat. Tişta ecep jî, bi salan bû kesek dixebitî, ji bo Kurdan jî sîxûr bû,weke mirovê nebaş dihat nasîn. Kesê ku name şandî, di nameya xwe de vê digot: Wê Hikûmeta Iraqê di 1’ê Hezîranê de hêrîşî ser Kurdistanê bike, gundan bişewitîne û hêza xwe bi cî bike.” Heke ne ji agahiya ku wî kesî dabû me bûya,dibûya ji windahiyên me dane deh qet dîtir me windahî bidabûna. Me Kurdistanê ji sedî not bidest xistibû. Nêrînên me jî di vî alî de bûn. Dema hikûmet dît ciwanên Kurdan amadekarî dikin, wan jî hêrîşê hinek dereng xwist. Ji ber vê sedemê hêrîşê ne di yekê mehê de di nehê mehê de pêkanîn. Ji ber me berê agahî girtibû windahiyên me kêm çêbûn. Piştre dest danî ser Kerkukê. Tevî ku hikûmeta Iraqê gihiştibû daxwaziya xwe jî şer nesekinî. Ev bûyer hemû 1963’an qewimîne.

– Ket pêvajoyeke nû, ne wisa?

–Na.

– Ji bo pêvajoya nû, hîn çiqas heye?

– Gelemşeyek din heye. Yanî Qasim çû, Ebdulselam hat.

– Yanî we dixwest Ebdulkerîm Qasim li ser îqtîdarê bimîne. Hûn bi serê xwe serbixwebûn.

– Rast e, em bi serêxwebûn. Wê demê ji derve de ji me re telefon vekirin gotin; “şertên xwe bêjin.”Me jî xwest vê rewşê bikar bînin. Bi taybet me dixwest li ser rewşa îqtîdara ku komkujiyan çêdike û komînîstan tine dike bisekinin. Ji ber vê sedemê me Celal Telabanî şand Ewrupa. Bi taybet me got divê tu biçî Moskovayê. Bi riya Almanên Rojava bi Moskovayê re pêwendî hat danîn. Bersiva Moskovayê bû ev: “ger hûn dixwazin bi me re pêwendiyan dênin, divê Îbrahîm Ehmet bê gel me.” Min ji komîteya merkezê re got, ji bo çûyîna min biryar hat girtin û ji bo çûyînê min emadekariyên xwe kir.

Di heman demê de Mele Mistefa ji me, ji bo em ji komîteya merkezê Seyît Alî derbasî Ewrupayê bikin alîkarî dixwest. Seyît Alî, weke nûnerê Mele Mistefa, wê bi Moskovayê re pêwendiyan pêşbixistiba. Wê demê çûyîna Moskovayê gelek zehmet bû. Em ji Fransayê derbasî Almanya bûn ji wir jî çûn Moskovayê. Ji bo ez bûbûm mîvanê partiya Sovyetê xawên dibûm. “Gotin em amadene ku alîkarî bidin gelê Kurd, di heman demê de weke hikûmeta Sovyetê wê BM jî ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd bixebite.”Piştî hinek hevdîtinan û şûnde dema ez vegeriyam Almanyaya Rojava, min agahiya hilweşandina rejîma Iraqê bihîst. Partiyên din jî bi partiya Baas re tevgeriyabûn.

Min li Fransayê bi Kamuran Bedirxan re hevdîtin çêkir. Xwest ez biçim Emerîkayê. Du nameyan nîşa min da. Hinek peyamên senetorên Emerîka jî hebû. Vana beriya du meha bi xwe re anîbû Parîsê. Got; “ger hûn dixwazin ji van karan sût wergirin, divê li ser navê partiyê yek berpirsyar biçe Emerîkayê.” Dema ez li Moskovayê, Rusan jî vê gotin: “Ji bo qeder û mafê gelê xwe hûn azadin

pêwendiyan bi hemû cihên cîhanê re deynin. Rast e, hûn di pêwandî danînê de azad in. “Lê xaleke ku hûn li ber çavan bigirin heye, ew jî bercewendî û têkoşîna gelê we ye. Xala sereke ku hûn bişopînin ev e. Hêzên ku hûn bi wan re pêwendî daynin şartê we yê yekem ku hûn nîqaş bikin divê ev be;” min li Almanyayê bi Emerîka, Almanyaya Rojava û Almanyaya Rojhilat re pêwendiyan çêkir. Li ser vê reqema telefona min girt, got em ê di nava pazde rojan de agahî bidin we û çûn.

Piştî rojek li Konsolosa Emerîkayê bangî min kirin. Elçiyê Emerîkayê bi awayeke vekirî, di demeke ku dixwest di navbera Kurd û Iraqê de pêwendiyan bide avakirin, got ku di demeke wiha de daxwaza te ya çûyîna Emerîkayê wê ziyanê bide vê têkiliyê. Jixwe di demeke ku pêşkeftin li gor daxwazên Emerîkayê pêş diket de pêwîstî bi çûyîna min nebû. Lê na, ger weke tê xwestin çênebe, gotin ku mafê te yê çûyîna Emerîkayê heye. Ez jî bi awayeke lezgîn çûm Îranê. Me li Îranê kesê bi navê Şûkrû Akrevî dît. Li ser navê meclîsa partiyê li wir digirtin. Ebdulkerim, ji wî re got; “ez emademe navbertiyê di navbera rejîma Iraqê û Kurdan de bikim.”Ji Şûkrî Akrevî xwestibûn ku bi Mele Mistefa û partiyê re pêwendiyan deynin û daxwazên xwe ji Cemal Ebdulnasir re bişînin. Radyoya Iraqê, digot ku ti pirsgirêkeke Mele Mistefa bi rejîma Iraqê re nemaye.

Dema ez vegeriyanKurdistanê, ji bo ez pirsa ka me ji encam ji van hevdîtinan derxistiye bipirsim çûm gel Mele Mistefa. Min dît ku di van hevdîtinan de ti tişteke ku Kurdan sûd jê girtibin nîne. Îtîraf kir ku wî daxwaza dewleteke mezin bi Iraqê re pêwendiyan deyne kiriye. Min jêre got; hewceye em li hember rejîma kral û Ebdulkerîm Qasim şer bikin, ma di vê meselê de li gor daxwaza wan bû, min xwest li gor daxwaza wan be. Mele Mistefa aciz bû, got; “ ez pêşengê partiyê, Kurdan û pêşmergeyanim, mafê min heye ku ez

her tiştî bikim."Min jî got, di vir de tu xwe pêşengê Kurdan û pêşmergeyan dibînî, ez maf didim te. Lê xwe serokê partiyê dîtin qebûl nakim. Tu ne serokê partiyêyî; ger tu aliyê din bigirî, bêguman wê biryara yên din derbazdar be û min got ev jî rastiyeke." Min tehdît kir, "got ez ê te bixim girtîgehê."

Bi mantiqê eşîrî serkeftinê bidest xistin zehmet e.

Bi vê mantiqê eşîrî re gihiştina me ya serkeftinê zehmet e. Dibûya ku ger ev mantiqê eşîrî nebûya, me dîsa serkeftinên mezin bidest nexistibaya; lê em bin biketiban jî wê bi vê şerefê bibûya. Komîteya merkezê ji bo nîqaşa me civîn li dar xist. Min jî biryara Mele Mistefa ji serokatiya partiyê xistin girt. Dîsa ji bo îtîfaqan me belavokeke bilav kir.Di belavokê de me diyar kir ku Mele Mistefa ji partiyê hatiye avêtin û divê ti talîmateke wî neyê guhdarkirin, ji ber têkiliya ku bi Iraqê re daniye pêwendiyeke teslîmiyetê ye.

– Li vir em dikarin li ser Mele Mistefa gelek tiştan bêjîn. Tiştên ku heya niha we aniye ser ziman vê dide îsbatkirin: Serokatiya Mele Mistefa weke reîsê eşîrê dihat meşandin. Ev rastiyeke ku di civaka Kurdan de partî û partîtî tişteke zehmet e. Lê xebata we baş meşiyaye. A rastî bi îqtîdara Ebdulkerim Qasim re we dikarî gelek karan bikin. Lê şoreşa Barzanî hîn di destpêkê de xira bûye. Bi Emerîkayê re pêwendiyên xwe pêş dixin. Dîsa di dema Qasim a dawî de Seyît Salih û Cebbar bi komûnîstan re îtîfaq çêkirin xwestin Ebdulkerîm Qasim bixinîn. Halbikî lewaziya Qasim tê wateya îqtîdara Kurdan. Tiştek din jî, ser Qasim de diçin, Qasim jî helwesta xwe dide guhertin. Ev jî ji bo Kurdan nebaş bû û bi vî rengî Qasim çû, yên din hatin. Dîsa jî Barzanî nexwest rast bimeşîne. We dixwest şoreşê çêkin, wê pêwendî pêşxistinê esas girt. Ev ne aşitiye, teslîmkariye. Di dema ku hewcebûn hêza xwe bihêz bikin de, lê her tim tesfiye kirin heye. Di vir de dema ku we xwest şer bikin li pêşiya

we bûn. Dema we xwest aşitiyê jî bikin dîsa li pêşiya we bûn. Li gorî dîtina min ev helwest ti pêşkeftineke hedef nake. Mînak, dişebe terzê Mistefa Kemal. Mistefa Kemal jî di dîtinê de weke ku li hember Yunanan û emperyalîzmê şer dike, lê ev karê li ber çav ango dîtinêye; di rastiyê de jî li hember jêr şer dike. Heqîqeta Mistefa Kemal ev e. Wiha rewşa Mele Mistefa jî heman e. Di dîtinê de şoreşê çêdike, lê di bin de xira dike.

– Dîtina serok gelek di cîh de ye, tespîtek rast e. Têkiliya Mele Mistefa ya bi hikûmeta Iraqê re tenê û tenê ji bo ziyan dayîna doza netewe bû.

– Ji ber vê pirsgirêk bi dewletê re aşitî pêşxistin nînbû, pirsgirêk hûn bûn. We weke hereşeyeke(tehdit) dibîne. Ji dewletê zêdetir ji we direve ango hesaban dike. Ji ber vê sedemê tenê tirsa wî hûn in. Divê hûn vê xalê fam bikin. Rewşa Mistefa Kemal jî bi vî rengî ye. Tirsa wî ne Yunan in, ne jî Ingilîz in. Tirsa wî jî ji Çerkez Ethem e. Ji ber ku Çerkez Ethem serbixweyî bûn. Dîsa komînîst hebûn, Kurd hebûn. Di dîtinê de şer jî aşitî jî kir. Lê dema tên ser îqtîdarê tevgerên demokratîk û komînîstan tasfiye dike. Em li Mistefa Barzanî mêze dikin, ew jî heman tiştî dike.

Hawar: Ev, rastiya Mele Mistefa ye. Kes ji gel nizane, tenê rewşa çend hevalan dizane. Ez li vir gel sûçdar nakim, lê ravenekirina rewşa Mamoste ji gel re berpirsyartiya wî ye.

-Hîn jî rastiya hinek welatparêzên li bakur nizanin. Meseleya Faîk Bucak hebû. Faîk Bucak sekreterê giştî yê T-PDK’ê ye. Kurê wî hat vir, nizane çawa li bavê wî hatiye xistin. Min jê re vegot. Digot,“raste bavê min wisa çû.” Lê piştî sîh salan rastiyê fêm dike. A rastî Barzanî di şerê çînî de usta ye. Tenê ne ev, Qazî Muhemmet jî heye. Qazî Muhemmet li gor wî di serokatiyê de pêşdetir bû, di warê çînî de jî pêşdetir bû, xwezayî wî ji bo xwe asteng

didit. Dixwaze partî ava bike, ji wî dihesi de, jê hez nake. Mezinbûna Qazî Mihemet naxwaze. Ji ber vê sedemê Barzanî Kurdên li bakur xiste bin venêrîna xwe. Ji ber ku nedixwest tevgereke ya Kurdan li wir jî çêbibe. Nedixwest kes fêrî partî, rêziknameya partî, şerê partîzanan çiye bibin. Tenê dixwest vê bizanibin: serok heye û xwe weke serok ferz kiriye.

Barzanî komplocî ye, lê ne xafil e. Ew karê xwe bi komployê re rêve dibir. Hûn dirûst in, di heman demê de saf in. We yek du caran dît, zilam tiştên nebaş dike, wê demê we yê hesab jê bipirsîbaya.

Bi qasî ku min fam kiriye, Barzanî ne tenê di Başurî Kurdistanê de, di hemû Kurdistanê de ji bo Kurdan di keseyeta xwe de eşîrtiya paşketî temsîl dike. Gelek eşîran bi xwe ve daye girêdan, serokatî jê re kiriye. Ji 1945’an heta 1946’an mûnafiqtiya xwe meşandiye. We, yan jî mamoste xwestibû partiyeke netew demokrat û hemdem bidin avakirin. Ev daxwaz rabûna Kurdê nû ye. Lê li pêşiya we astengeke mezin heye. Li hember disekine û ev jî heya dawî hatiye îzbatkirin. Mesele bi awayeke vekirî tê famkirin. Şerê bi Qasim re li ser bingeha teşîrkirina we bû. Daxwaza wan ya lihevhatinê jî ya rastî ji bo lewazîkirina we bû. Bi vî helwesta xwe dixwaze vê îzbat bike: Zêde pêşde neçin! Dîsa partiyê resmen bê erk dike.

Tabî we xwest 1964’an hinek tiştan bikin. Heya 1970’î çibû? Hûn dikarin di derbarê vê de hinek biaxivin. Dîsa hûn dikarin qala çûyîna xwe ya Iraqê bikin. Ji bo pêşdebirina pêwendiyan, nedixwestin li Iraqê bi awayeke tendûristî pêwendî bi yêkitiya sovyet(SSCB) û DYE re bimeşe. Her tim şerê çînî da meşandin. Em dixwazin ser vê mijarê jî rawestin. Şerê ji bo kurdîniyê nedixwest.

Serokatiya wî ya eşîrî lewaz bû. Partiya Barzanî ne partiyeke netewe bû. Mamoste vê dizane. Dixwaze bi Iraqê re pêwendiyan dayne, li pêşî asteng e; diçe Moskovayê, li pêşî asteng e; diçe Emerîkayê li pêşî asteng e. Ji ber sedema ev serokê eşîrî, serokeke hemdem û pêşkeftî derneket. Ji bo serokê netewa demokratîk pêşnekeve gelek tişt dikin, lê di dawî de bixwe jî winda dike. Baş e, li vir Kurdan çî winda kirin, ji destê wan çi çû?

Kurd nebûn hêz. Kurd weke berê bûn eşîr, ketin rewşeke nebaştir. Di Kurdan de fikir û stratejî pêş neket; nebûn hêzek, textîkên şoreşê çênebûn. Di holê de partî û pêwendî neman, rêxistinbûyîn nema. Baweriya min heye we dixwest gelek tiştan bikin. Di wê deme de we xwest hinek tevgeran û pêwendiyan pêşbixin. Dîsa hinek derfet jî derketin holê. Lê dîsa li hember we propaxandeyeke wî ya bihêz hebû. Ji we re digotin cehşên 1966’an. Lê bi xwe komplo û hwd. vê bi awayeke herî baş dike. Cehşbûna te nîne. Te xwestiye ji bo Kurdiniyê partiyeke ava bikî, şoreşê çêbikî, te ji bo eşîrtiyê nekiriye. Jixwe ez bawer nakim eşîretbûyîna te jî hebe. Jixwe malbateke wisa mezin jî nîne, ne wisa ye? Te bawer dikir ku tu yê bi eşîrî hinek tiştan bikî? Bi mîsogerî na. Hemû daxwazên te bi temamî demokratîk, pêşverû û xwe dipesart fikrê netewe. Naveroka şerê we bi temamî netewe bû.

Niha jî em bên pêvajoya YNK’ê. Em ê bi Celal Talabanî re jî baxivin. Bi taybet piştî 1975’an yanî beriya her tiştî em ê ser salên 1965-75’an bisekinin. Pêwîstî zêde bi hurgûliyan nake. Barzanî di salên 1975-70’an de çikir, we dixwest çibikin? Dîsa di bin serokatiya we de salên 1970-75’an tê çi wateyê? Keremkin em we guhdar dikin mamoste.

– Dema çûdahiya fikrên me yên li hember Mele Mistefa zêde bû, hêjmarek mezin welatparêz û mirovên baş ketin navberê û

xwestin çareser bikin. Mêzandina Mele Mistefa ji min û partiyê re weke mêzandina miroveke ji rêzê bû. Wî serokatiya xwe ferdî dimeşand. Li min mêze dikir, biryarên ku me di nava partiyê de digirt di cî de nedidît. Di kesayeta min de partî didît û tine dihesiband. Bi navbertiya hinek kesan re ez çûm serdana Mele Mistefa. Ji bo çareserkirina van pirsgirêkan min xwest kongreyek çêbibe. Di wê demê de sekreterê partiyê yê giştî li Ranyayê bû. Wê demê me ji bo kongrê amadekariyên pir baş dikir. Hevaleke partîlî hebû. Ji min re got Mele Mistefa li Behdînan e û nameyeke da min û xwest ez bixwînim. Name wiha hatibû nivîsandin: "bila hemû merkezên partiyê xebatên xwe ji bo kongreya taybet a li herêma Behdînanê bidin meşandin." Min jê re got çima name daye te. Got, "kesek vale nebû."Di aliyê din de jî ji bo hawirdora xwe çêbike, dixwest em li hev bikin.

Konferansa ku min qal kiriye Barzanî û serokê hinek eşîran jî amede bûn. Piştî hingê me qutbûna di nava merkezê de danî holê. Barzanî got, "ez biryara yên ku li vîr in qebûl dikim, ez ev pirsgirêkên we- yên di navbera min û merkezê de-dixwazim çareser bikin. Biryarên ku hûn bigirin em ê herdu jî qebûl bikin, yê ku nepejirîne hûn dikarin di derbarê wan de biçin biryarê. Ji min re got, "nêrîna te çiye? Min got ez qebûl dikim. Digotin reyîsên eşîran jî di nava mijara çek û peran de ne. Min xwest mîqtara çek û pereyan ji ku tê û çawa tê bidestxistin bikeve bin lêpirsînê. Dema Mele Mistefa vê bihîst rengê wî zer bû, ji min re got, "ma ne şerme Îbrahîm, çi hewceye yeke din bikeve navbera me." Em jî wisa difikirin; divê di navbera me de ti pirsgirêk û nakokî derneketiba. Komîteya merkezê nedizanin ka Barzanî çi dixwaze. Destê min girt bi xîtabeke nerm,ji min re got, "di dema pêşiya me de wê ti pirsgirêkeke me bi hev re dernekeve." Em ji civînê derketin. Omer Xetabî nû ji Îranê vegeriya bû. Rêveberiya Îranê bîst dînar ji bo bide partiyê dabûyê.

Çante radestî Barzanî kir. Ez vegeriyam Sûleymaniyê. Ew jî li cihên diyar belav bûn.

Hikûmeta Iraqê dîsa dixwestin bi Barzanî re pêwendiyan deynin. Ji min û çend hevalan re gotin ku biçin Bexdatê bi rêvebe-riya Iraqê re hevdîtin çêbikin, di mijara meseleya Kurd de rê û rêba-zan bigerin. Em çûn bajarê Ranyayê. Heyeta hikûmeta Iraqê hat. Serokê hikûmetê û li gel wî du wezîr hebûn. Mele Mistefa jî di wê civînê de emade bû. Mele Mistefa ji wan re got, "ev e hûn û Îbrahîm Ehmet" me berda û çû. Ev heyet ya ku bi Barzanî re pêwendiyan danî û di derbarê mafên me de ev têkilî aşitiye, yan jî teslîmyete ku me di derbarê wan de belavok nivîsandibûn endamên hikûmetê bûn. Di kêliyên hevdîtina vê heyetê de di mijara navên gelê Kurd û mafê wan de me gelek nîqaş kir, lê daxwazên me red kirin, civîn bivî rengî bi dawî bû.

Dema em hîn li Ranyayê bûn, ew ji bo îtîfaqeke din çêbikin çûn gel Mele Mistefa. Piştî çend rojan, me bihîst ku Mele Mistefa li Qeledizê civîneke mezin li dar dixe. Me ji komîteya merkezê Elî Ebdulla û Seyît Ezîz rêkir wir. Dê ji wî re bigotibane ku "çima li ser navê partiyê ji bo tevlîbûna civîneke wiha we gazî me nekir." Herdu endamên ku me şandibûn hema dest didîne ser herduyan. Endamên ku Mele Mistefa li wir kom kiribûn ji sedî 90 ne endamên partiyê bûn. Mele Mistefa wan komkiribû. Tiştên ku digot anîna rewşa biryarê û bi biryara komîteyê hemû merkezê ji partiyê diqewitandin. Ji bo derxistina endamên nû yên merkezê diçe hilbi-jartinê û civîn wê şevê bidawî dibe. Piştî çend rojan û şûnde me bihîst ku Mele Mistefa bi rejîma Iraqê re îtîfaq çêkiriye, wê êrîşî ser me bikin û bi me re şer bikin.

Me jî weke komîteya merkezê, ji bo em çi bikin çi nekin me endamên xwe yên amade kom kirin û civînek lidar xist. Me nîqaş

kir ku em li hember rejîma Iraqê û Barzanî şer bikin,yan dev ji şer berdin û yan jî em pêşmergeyên xwe serbest berdin bû? Yê ku dixwaze dikarin rûnin û yên dixwazin jî dikarin biçin gel Barzanî bû. Li pêşiya me ev hebû diviyabû mebiryareke bidabana. Nêrîna Celal Talabanî' ew bû ku em şer û şerê biçekan berdin bû. Celal alîgirê têkoşîna siyasî bû. "Digot; ger hikûmet destûra xebata me ya siyasî bide, em ê jî weke berêxebata xwe veşartî bidin meşandin." Di encam de biryara ku em gihiştinê, li hember hêzên Iraqê û Mele Mistefa li berxwe bidin derket. Ji aliyekê ve artêşa Iraqê, ji aliyê din ve Mele Mistefa û eşîretên di herêmê de li hember me şer kirin. Ji hinek serokên van eşîretan bi min re ketin nav pêwendiyê,dixwestin ji bo şerê ku bi Barzanî re bikin em alîkarî bidin wan. Bersiva me ya ji van re bû ev; ger yên ku dixwazin ji bo peran şer bikin hebin, em ê wan di nava xwe de qebûl nekin bû.

Hêzên me yên pêşmergeyan, li hember Barzanî û hêzên Iraqê li ber xwe nedan. Piştî vê me ji hevalên xwe yên ku di nav şer de cî digirtin pirsa ka em çibikin kir. Pêşniyar kirin ku em biçin Îranê. Beriya wan ez çûm Îranê, min bi perpirsyarê leşkerî yê wê qadê yê Îranê re mijarê çareser kir. Wî jî meseleyê ji Tehranê re ragihand. Şartê ku dan pêş, "gotin em ê we weke mişextiyên siyasî qebûl bikin, hûn ê hemû çekên xwe radestî me bikin û şêst kîlometre ji çiyan dûr bisekinin."Hevalên me şertên Îranê red kirin. Min care-kedin serî li rayedarên leşkerî da, min daxwaza di asta herî jor de hevdîtin pêkanînê kir. Bi vî rengî me bi rayedarên herî jor yên li Kurdistanê diminin re civînek li dar xist. Dema min dest bi axiftina xwe kir, min got ev komploya, em ê mafê xwe li Iraqê bidest bixin. Fermardareke Îranê got, "hûn li Îranê rêxistinê ava dikin, weke ku we li Başurî Kurdistanê jî hinek tahrîbatan ava kiribû, dixwazin li Îranê jî ava bikin." Min ji wan re got; ger hûn bixwazin em ê li hember Iraqê şer bikin, Başurê Kurdistanê xilas bikin û dikarin li

parçeyê Rojhilatê Kurdistanê yê di bin venêrîna we de jî şer bikin. Got; “ Ev tiştên te gotin cewherî pirsgirêkê bixwe ye.

Min got ez jî ji tiştên ku min gotine şaş mam. “Peyveke Şahîn heye, di pirtûka wî de derbas dibe; dibêje ez bazê hemû gelên Arî me.” Kurd jî Arî ne. Ev herêm jî herêma gelên Arî ye. Min got; em naxwazin ji Îranê parçeyek qut bikin, dixwazin parçeyek din bixin ser.” Wan jî ji me re gotin; “ev helwesta we komployeke. Hûn dixwazin li Îranê hêjmara Kurdan zêde bikin û tevgera şoreşgerî belavî nava Kurdên Îranê bikin. Dîsa hûn dixwazin têkiliyên me yên bi Tirkiyê re xira bikin. Hûn ê piştî du meh an jî salek din, bixwazibin parçeyê Kurdistanê yê di bin bandora Tirkiyê de xilas bikin û bi imparatoriya Îranê ve bidin girêdan. Ev jî wê bibe sedema şereke di navbera me û Tirkiyê de. Ger em li hember Tirkiyê bigihin serkeftinê jî, împaratoriya ku bê avakirin wê nebe împaratoriya Îranê, dê bibe împaratoriya Kurdan. Got; tiştên ku hûn dibêjin xeyal in.” Bi rastî jî ev gotin, gotinên Şah bûn. Leşker jî ji min re radigihand. Di encam de bi şertekê me qebûl kir ku em çekên xwe radestî wan bikin. Wê Şahê Îranê çekên me carekdin bidabûna me û me bişandiba Iraqê. Wan jî vê qebûl kirin. Ez li Tehranê mam. Çarsed hevalên bi min re birin bajarê Hemedan. Ji derveyî Ebdullah Elî û Seyît Ezîz- kî Mele Mistefa van girtibû- yên din hemû hatin.

Têkiliyên Îranê yên bi me re pir eceb bûn. Carna baş carna ne baş bûn. Xwestin bi me re civînek çêbikin. Li ser navê komîteya navendî ez, berpirsiyarê leşkerî yê Kurdistana Îranê û ji rêxistina îstixbaratê (SAVAK) berpirsiyarek em çûn Mahabatê. Em birin meydana Çarçira( cihê ku Qazî Muhammed hatibû darvekirin.) haqaret li me dikirin. Dema me dest bi hevditinan kir- ji me pirsîn “hûn çi dixwazin.” Me got em ji dewleta Iraqê mafên xwe dixwazin. Dîsa pirsîn gotin, “hûn ji Îranê jî tiştekî dixwazin?” Celal Talabanî jî ji wan re di dema qraltiya Iraqê de çi maf ji bo Kurdan hatine

dayîn hûn jî wan mafan bidin Kurdan û em derbasî mijareke din bûn û gotin civîn qediya. Hevalên min çûn Hemedanê ez jî vegeriyam Tehranê.

Mehek piştî vê civînê li Îranê her tişt veguherî dijî me. Mam Celal xwest biçe Ewropayê. Em jî çûn me xwest ku ji bo me jî cihekî îltîcayê bibîne. Dema ku me xwest ji Îranê pasaportê bixwazin jê re gotin ku qedexe ye. Serokê Sawakê xwest bi min re hevdîtinê çêke. Serokê Savakê guherîbû. Bi awayekî vekirî “ ji ber ku tu bi cihekî ve biçî divê hemû hevalên te li cem me bimînin. Hevalên te bê gotina te dê bi cihekî ve neçin.” Min pirsî, sedemên vê guherînê çi ne? Piştî civîna Mahabatê hem berpirsiyarê Sawaqê û hem jî berpirsiyarên leşkerî hemû çûbûn Piranşarê. Hem ji bo wî û hem jî ji bo civîna Mahabadê du rapor amade kiribûn û pêşkêşî Şah kiribûn. Piştî ku Şah van herdu raporan dixwîne biryara piştgiriya Mele Mistefa û derve hiştina me dide. Serokê Savakê bi awayekî eşkere ev ji me re got.

Xwesteka Mele Mistefa ya yekemîn ev bû ku, Îran me bigire û vegera me ya Iraqê asteng bike. “Jixwe hûn penaber in û ti tiştekî we tineye, hûn ji bo Kurdên Îranê çi dixwazin. Hebûn û tinebûna partiya Berzanî ne girîng e, em kengî bixwazin dê di xizmeta me de be. Em texmîn dikin ku sê hezar şervanên eşîra Berzanan hene. Hêzê we bi qasî Mele Mistefa tineye, hûn tenê ne, di cihê xwe de rûnin.” Niha tê fêmkirin ku çima ji bo PDK’ê piştgirî hatiye dayîn û bi wan ewle bûne. Me xwest em careke din bi Mele Mistefa re têkîlî deynin. Ji ber ku di navbera wan û Iraqê de pevçûnan dest pê kiribû, ji bilî min vegera hemû hezên me ya Iraqê qebûl kir. Dema ku hevalên me vegeriyan Iraqê di komiteya navendî de qet cih nedan wan. Ne peywirek dan peşmergeyên me û ne jî hevalên me yên din. Tenê ji wan re gotin biçin. Talabanî û endamekî din komîteya navendî di gundekî de davêje zindanê. Mehek bi şûnde

Abbas Axa bi Mam Celal re hevdîtinek pêk tîne û dibêje Mele Mistefa gotiye “ Ez wan serbest berdidim. Dixwazin biçin ku bila biçin. Ez berpirsiyariya wan digirim ser xwe.” Vegeriyan Silêmaniyê û serî li hikûmeta Iraqê dan. Hiqûmeta Iraqê wan qebûl kirin. Bi vî awayî navê “Cahşên 1966’an” li me kirin.

Di navbera rêveberiya Iraqê û Mele Mistefa  de pevçûnan dest pê kir. Îsraîl û dewletên din alîkariya berzanî dikirin. Samî Ebdurahman ji iraqê reviyabû hatibû cem me. Me ew negirt komîteya navendî û şand cem Mele Mistefa. Tiştê ku bû sedema pêşdederketina vî şexsî bi Îngîlîzî zanebûna wî bû. Ji Yahûdiyan re rêbertî dikir ku li hember tesîsên petrolê yên Kerkûka Iraqê çalakiyan lidar bixin. Bi wî awayî deng dida. Muhammed Ebdurahman(Samî Ebdurahman) bi vê taybetiya xwe li cem Mele Mistefa bû kesekî bijare. Di navbera Iraq û Mele Mistafa de şer dijwar bibû. Di wê pêvajoyê de ez li Îranê bûm. Hikûmeta Îranê dixest ez biçim Iraqê.

Ji bo Mele Mistefa û eniya Kurdistanî, ango me dixwest bi awayekî du partî dîsa hevkariyek çêkin. Ji bo wê em vegeriyan Iraqê. Lê belê Mele Mistefa nexwest me bibîne û ev daxwaza me red kir. Her kesî guhdariya me dikir. Peşmergeyên ku ji helwesta Mele Mistefa ne rihet bûn jî, piştgiriya me kirin. Mele Mistefa li hember polîs û arteşa Iraqê şer da sekinandin û êrîşê pêşmergeyên me kirin. Dîsa hin mirovên welatparêz bûn navbeynkar.  Me jî ji wan re got em di vê rewşê de amadene ku bi Mele Mistefa re tevbigerin. Bes li hemberê me şer neke. Lê belê wî qebûl nekir. Me xwest ku ew li hember dewleta Iraqê têbikoşe û li hember me şer neke. Wê daxwaza me jî qebûl nekir. Bi tenê li hember me eniya şer vekir. Di wê demê de Ebdurahman ji hikûmeta Iraqê  hinek mafên Kurdan bi dest xistibû. Piştî wê Baasiyan derbe kirin û bûn desthilatdar. Êdî bi serê xwe îktîdar bûn. Divê ez di vê mijarê de bi zelalî bêjim ku “Ez dema li Bexdayê bûm min di wê hikûmetê de cih digirt. Ji

Kuweytê heyetek hat. Di heyetê de wezîrê parastinê yê Kuweytê jî hebû. Dixwestin bi hikûmeta Iraqê re têkiliyek çêbikin. Di pêşwazîkirina vê heyetê de min jî cih digirt. Di wê civînê de Hesen Bekir jî hebû. Di darbeya 1963'an de serokê hikumetê bû. Ji min re " em du partî, partiya ku dê Baasê temsîl bike û partiya ku Kurdan temsîl bike partiya we bibin yek û li hember dijminan şer bikin. Li hember alîgirên qral piştgirî dixwestin. Piştre ez, Celal Talabanî û komek wek heyet me xwest bi kesên ku şoreş pêkanîne re hevdîtinek pêk bînin û serok-komar bibînin. Me hevdîtin pêk anî. Me got, ji bo ku hûn hem Saddam û hem jî Baasiyan binasin dixwazim hin tiştan bînim ziman. Dema ku em ketin hundir em pêşwazî kirin. Destekî xwe da ser milê min û destê din jî da ser milê Mam Celal. Ji min re "Tu birayê me yî. Fikir û ramanên xwe ji me re bêje." Min mesele fêm kir. Du roj beriya şoreşê civîneke wan hebû, li wir Baasî jî hebû. Mele Mistefa û Kurd dihatin nîqaskirin. Mam Celal li wan ( li Baasê) heqaret kiribû. Li gel vê jî serok-komar bi me re têkîlî danîn li gor berjewendiyê xwe dîtibû.

Ev nedihat wê wateyê ku li hember me nerm bûne. Dixwestin desthilatdariya xwe qewîn bikin. Ji me re digotin "heke em vê carê jî ji desthilatdariyê bikevin, dê heta zarokan jî qetlîamê çêbikin. Ji bo vê em bibiryarin ku îktîdara xwe bidomînin." Me jî got baş e. civîn qediya û em derketin derve. Du kes li derve rûniştîbûn. Ji wan yek bi unîformaya leşkerî bû. Ji me re gotin " ew Saddam Huseyîn e." Ez di koşka serok-komariyê de geriyam. Min odeyek vala dît û heyirîm. Got "dibe ku li wir cihaz danîbin." Yanî rastiya Baasê. Ew girêdayî DYE'yê bûn. DYE'yê ew anîn îktîdarê. Di sala 1969'an de nûnerên Sovyetê hat Baxdayê. Peyvireke wî jî rawestandina şerê di navbera Mele Mistefa û Iraqê de bûn. Bi me re ket nav têkîliyan. Serokomar jî di derbarê mijarê de bi me re axivî. Min tenê tiştek ji wî xwest. "hûn amade ne, hûn dikarin çi bidin Kurdan?

Danezanekê binivîsin û mafên gelê kurd eşkere bikin ku ew jî bigihîjin mafên xwe. Bi Mele Mistefa re li hev bikin û alîgirên wî efû bikin.” Ev xwesteka min qebûl nekirin.

Piştî wê ez nexweş ketim. Xwestin min nexweşxaneyê derxin û bişînin Londrayê. Di devê derî de Saddam bi gulekê ez pêşwazî kirim. Dema ku em gihîştin Londrayê, li Sefaretxaneya Iraqê li benda me bûn. Ez demekê li wir mam. Sefîrê Iraqê her roj dihat cem min. Dixwestin demek zûtirîn dermankirina min biqedînin. Ji ber ku hevdîtinên bi Mele Mistefa re di rewşeke qrîtîk de bû. Du roj bi şûn ve hevdîtin ketin rewşeke erênî. Sal 1970’î bû.

Mehek bi şûn de ji Îranê mirovek hat cem me. Ji rêxistina îstixbarata Îranê bû. Me li Parîsê hevdîtin pêk anî. Şahê Îranê ew şandibû. Got; “em dixwazin şaşiyên ku çêbûne sererast bikin. Mele Mistefa şaşitî kiriye. Niha dixwaze we bike mirovê xwe.” Min got; “Şahê Îranê çima wisa dike? Bila hin mafên Kurdan bide. Mafên ku rejîma Baasê dane, mafê şerkirina bi Baasê re nade kesî. Heke hûn dixwazin alîkariya kurdan bikin, mafên kurdan bidin. Em ji we re koletiyê nakin.” Ji bo ku em rastiya gotinên vî mirovî fêm bikin, me hevalê xwe yê ku li Îranê dima, xwest cem xwe. Seyît Elî hat cem me. Me Talabanî jî qebûl nekir.(dibe ku tevlîbûna civînê tê qestkirin)

Rejîma Îranê jî êdî em li ber çavan digirtin. Me xwest bi Mele Mistefa re li hev werin. Wê demê ketin nav têkîliyan. Gotin komîtiya navendî ya partiya mamoste bi Iraqê ve girêdayî ye. Heta ku ev nakokî çareser bibe em ê li Iraqê sefiriyê bikin. Me red kir û qebûl nekir. Mele Mistefa dixwest bi me re li hev were. Li gorî dîtina wî heke Îbrahîm Ehmed nebe aştî nabe. Ez vegeriyam Iraqê. Bi civînekê me biryar da ku em dest bi xebatan bikin. Partiyê navê xwe guhert. Me got em derbasî eniya Mele Mistefa bibin. Du sal

piştî ku em bi Mele Mistefa re bûn yek, ji bilî heqaretê me tiştek jê nedît û nebihîst. Bi wî awayî em ketin sala 1972'an.

Aliyekî mejiyê gelê Kurd ji hêla Berzanî û aliyê din jî ji hêla kominîstên Iraqê ve hatibû rizandin.

-PDK peşmergeyên we kişandin aliyê xwe, we jî temaşe kir. Piştre çi bû? Barzanî gihîşt 1974'an. Hûn jî jê veqetiyan û wisa bi serê xwe man. Yanî bi wateyeke din şoreş piştî di 1970'Î de diqede. Baasiyan heta 1974'an bi Barzanî re çi kirin? Di vê pêvajoyê de çend peyman çêbûn? Di vê mijarê de hûn dikarin ser gelek xalan bisekinin. Bi taybetî ji salên 1970'Î heta 1074'an we xwest hûn çi bikin? Barzanî çawa bû asteng? We xwest hûn şer bikin, nehat qebûlkirin. Îranê bi we leyîst. We sazûmaniyeke nû çêkir. We xwest hûn bi Îranê re têkîliyan deynin, bû asteng. Hûn hatin cem rejîmê, we xwest hin tiştan bikin, ji bo tiştên ku we dest xistibûn jî bike malê xwe bi Iraqê re îttifak çêkir. Ev rastî di sala 1974'an de hat îspatkirin. Wekî ku tê zanîn di sala 1975'an de jî hişt û reviya. Yanî hûn jî qedandin û bê bandor kirin. Siyasiyên kurd û we rewşenbîran dixwest tiştekî bikin, lê hêza we ya tehlîlkirinê tinebû. Di derbarê Barzanî de çewtiyên we hê jî didomin.

Partiya kominîst wek berê hê jî didomîne. Ez ji bo xeta we tiştek nabêjim. Xeta we rast e. Lê belê ji ber di demê de helwest nîşannedayîna we, fêmnekirina rastiya Barzanî hûn winda dikin. We baweriya xwe bi Barzanî anî û radestî wî kir. Mirov saetekê jî xwe radestî wî nake. Lê belê we çawa xwe radest kir, ez fêm nakim.

-Divê mirov li ser têkçûna tevgerên kurdan ên heta vê demê bisekine.

-Divê mirov nebêje eşiret û derbas nebe. Heta min di nav PKK'ê de jî li hember helwestên eşirvaniyê têkoşineke mezin da.

Tiştê ku hûn dibêjin ji mêj ve bersivên xwe dîtine. Tiştek din hebe em dikarin li ser wê ji rawestin. Tiştên ku hûn dixwazin pirs bikin hebin, hûn dikarin pirs bikin. Barzanî çima wisa kir? Di bingeha xwe de sûcê we ye. We rewşembîr û kominîstên Iraqê çima nikaribûn li hember Barzanî bisekinin û wî asteng bikin?

-Me her tim bi nêrina neteweyî li mijarê nihêrt.

-Ev zêde girîng nîn e. Hûn karan sivik digirin dest. Barzanî xwest bi me jî bilîze. Xwest hevalên me yên ku bi wî re ketin têkiliyan, bêxe bin bandora xwe. Heta hevalekî me jî ket vê kemînê. Min nihêrî ku me teslîmê Barzanî dike, ez mecbûr mam ku mûdexele bikim. Di pevçûnên me yên bi Barzanî re ji ber ku çend kes hatibû kuştin, camêr ji me re digot “çima partî li hember PDK’ê çalakiyan li dar dixe?” Dixwest ku me teslîmê Barzanî bike, yanî Barzanî ew dikişand. Dîsa mirovekî me heye ji komîteya navendî ye. Ew bi Îdrîs re hevdîtinan çêdike. Îdrîs hat, got me tifak çêkir. Heke we li hev kiriye, me jî got temam. Îdrîs dixwaze me jî bikişîne û digot “werin Başûr jî hûn çareser bikin. Bikevin herêma Barzan.”

Bêgûman di nav refên wan de hevalên me yên ku şer kirine û şehîd ketine jî hene. Hevalên me hatin, min rewşa wan nihêrî. Barzanî dixwaze wan bikşîne û me jî bixe rewşa hemû tevgerên din. Lê heke siyaseteke xwedî vîn û azad bihata meşandin piştgirî nedida. Min niyeta Barzanî fêm kir. Min jê re wisa got “hûn wekî şûrên Demokles li ser serê gelên Kurdistan in. Di têkoşîna çînî ya Kurdistanê de xetereya herî mezin in.”Min ev tespît kiribû. Hevalên me gelek şaşî dikirin. Ji bo dostanî û tifaqê tim diçûn cem wan. Ji bo wê ez Barzanî baş nas dikim. Heke me tedbîrên xwe bi pêş nexistana dê me jî tasfiye bikira. Lê ji ber ku PKK politîkayeke aqilane û azad bingeh digire, negihîşt armanca xwe. Em çima neketin kemîna wî? Mesûd her dem derdorên cuda bi ser me de dişand û

dida êrîşkirin. Ji bo ku em lîstokên wî vala derxin em bi şev û roj xebitin. Çima em neketin? Ji bo ku me taktîkên wî vala derdixistin û pê re jî em li Başûr bi bandor dibûn.

Li aliyê din, me li DYE’yê, Londrayê , Îranê û Turkiyeyê jî siyaseta Barzanî bê bandor kir, her wekî me ew fetisand. Bê bandorkirina siyaseta Barzanî tiştekî ne hêsan e. Meseleya Barzanî pir girîng e, ji dijmin zêdetir li ser wî disekinim. Lê belê we xwe nekiriye wekî hêz, ew aniye li pêşiya xwe kiriye asteng. We çi kar kiriye, wî ji xwe re kiriye mal. Heta ku ew te tasfiye bike, divê tu wî tasfiye bikî. Dîsa hûn dixwazin li ser esasekî rast tifaqê çêbikin, lê belê heke hûn tehlîleke rast nekin ew ê we tasfiye bike. Hevalên me jî wisa kirin. Lê belê min ew şiyar kirin. Min ji wan re got “hûn ê bi wî awayî bixebitin.” Ew jî wekî we dixebitîn. Min got bi vî awayî nabe, hûn ê zerarê bibînin.

Camêr tim û tim ji me re digot ji vir derkevin. Heke me tedbîrên xwe negirtana, em ê jî biçûna. Divê mirov şerê navbera me û Barzanî baş fêm bike. Ez wisa texmîn dikim ku ev hê jî baş nehatiye fêmkirin. Bi taybetî Mam Celal dixwaze hin taktîkan bi pêş bixe. Niha ji bo çareserkirina pirsgirêka Barzanî em ê taktîka rast çawa bi kar bînin? Divê mirov vê yekê baş zanibe, pir baldar û hişyar be. Sûcê we ye. Dema ku hûn serokên partiyan in, ew axayê eşîrê ye, lê hûn tînin dikin serokê xwe. 20-30 sal biryarên we nade bikaranîn. Serokatiya wisa dibe? Di dema şer de gotiye werin cem min, wekî zarokan hin tişt dane we û dîsa hûn xapandine. Xwest heman tişt jî ji bo min bike. Wekî ku 40 sal in tîne serê kurdan. Ji min re dibêje “ were bajarê Selehaddînê li cem min bimîne.” Camêr dixwaze min bixe komployê. Lê belê ne ji bo min, ji bo hevalên me yên navendê jî ev hêza wî nîn e. Ji ber ku ez tedbîrê xwe digirim, serê ben di dest xwe de digirim. Ji ber vê ye ku 15 sal in nikarîbû

tiştekî bi me bike. Tiştekî pir eceb e. Ya girîng gihîştina me ya vê encamê ye.

-Nakokiya we ya bi Barzanî re nû ye. Ya me, ji demên borî tê.

-We di têkoşîna bi Barzanî re de çi encam bi dest xist?

-Qet tiştek jî. Wekî we, me li hember wî têkoşîn da.

-Em dîsa li ber xwe didin. Lê hûn perîşan bûn, tasfiye bûn. Ew pir tiştekî ne baş e. Me dîsa ew anî ber lingê xwe. Ev şer mirovan tîne rê.

-Pirsgirêk ne çek e, feraseta li hemberî hev e.

-Tiştê esasî di çek de ye. Mesûd Barzanî çima tasfiye nebû? Di bingeha xwe de Barzanitî rûhek e, di heman demê de çandek e. Di nav gelê me de Barzanitî bûye kevneşopiyeke exlaqî. Ev şer, şerê hemû kurdan e. Di rastiyê de beriya ku şer dest pê bike, Mesûd dixwest paşve gav biavêje. Tarzê me yê şer dîtibû, ditirsiya. Beriya şer dixwest bi me re li hev bike. Lê belê çiqas bixwaze bi me re li hev bike jî me nikaribû vê yekê qebûl bikira. Ji ber ku ev sozek e. Sozeke hezar salan e.Ew çi qas tawîzan bide jî dilê me vê ranake. Divê ev bê temamkirin.

Ango îro zêde li ser PKK'ê disekinin.Em nikarin wek Berzanî bikin. Tarzê me yê şer cûda ye. Ne Başûr ne jî Bakur dê ji vê tiştek fêm neke. Hûn jî nikarin tiştekî fêm bikin. Wekî ku min berê jî got divê ev şerê dawî bi kûrahî bê rawestandin. Nebêjin serok hemû tişt diyar kir.

Niha li hember PDK'ê rewşa leşkerî baş e, mijara aboriyê jî ne pirsgirêk e. Bi giştî rewş baş e. Tenê heta ku pirsgirêka Barzanî

neyê çareserkirin, rewş bi ti awayî baş nabe. Çend sal in, şerê ku tê meşandin heye, lê belê kes nikare encamên mezin jê derxe. Partî û kesayetên din hatin cem me. Pirsa pere hene-tinene kirin. Min jî ji wan re got, biçin. Ev pirsgirêk me hemûyan mijûl dike. Pirsgirêk ne tenê pirsgirêka PKK'ê ye, pirsgirêka hemû kurdan e. Em çima di sibê de guhdariya we dikin? Ji ber ku tecrubeyên we zêde ye.

-Ez dixwazim kesayetiya Barzanî bikim pir û şerê li hember dijminan de heta dawiyê bi kar bînim.

-Mirov çiqas bixwaze vê mijarê veke, ew qas vedibe. Ji ber ku mijareke berfireh e. Mezinkirina Barzanî di destê Şahê Îranê de ye. Turkiyeyê jî li hember we şer dida meşandin, lê belê têkiliya wan a bi Turkiyeyê re pir baş e. Te qet behsa wan nekir. Têkiliyên bi Turkiyeyê re pir girîng in. Wekî mînak, Baas tê, qad dikevin destê we. Lê dema ku hêz dikeve destê Barzanî pirsgirêk ser û bin dibe, êdî hûn nikarin tiştek bikin. Dema ku Baasî dixwazin tiştekî bidin li hember tê derketin. Çima? Divê mirov vana fêm bike.

-Hin rewşenbîrên Kurdan gotin ku hûn ji Iraqê çi dixwazin? Me got, ji bo Kurdan otonomî ji bo Iraqê demokrasî. Ji me re gotin; "ev li Ewropayê meseleyeke mijara xwepêşandana nîn e. Eleqeya xwesteka we bi şoreşê re nîn e."

-Ew jî rast e. Derewên mezintirîn hene. Gelek rewşenbîrên Kurd hatin cem me, bi taybetî rewşenbîrên Kurd ên Iraqê. Lê ti kesekî derewê Barzanî fêm nekirine. Derewa herî mezin otonomî ye. Niha dibêjin ji Kurdan re otonomî ji Iraqê re demokrasî. Lê di ser û mejiyê wî de demokrasî tineye. Derewên mezin dikin, ji ber ku ti eleqeyekî wî bi demokrasiyê re tineye. Kesayetiya Barzanî ne kesayetiyeke demokrasiyê ye, ne kesayetiyeke otonomî ye jî. Ji bo wî otonomî, otonomî û serkeftina eşîretê ye, serkeftina malbatê ye, ji

bo otorîteya malbatê ye,ji bo eşîretên din jî otonomî tineye. Di feraseta wî de ji bo eşîretên din dîktatorî heye.

Dema ku serokatî û feraset ev be dê çawa encam bê girtin? Niha divê hûn sedemên sernekeftina xwe baştir fêm bikin. Mirovê Kurd pir derewker e. Bê gûman hin rêvebir hene ku pir sexte û pir xafil in. Heke hûn jî li hember wan tedbîrên xwe negirin, dê tiştek nehêlin. Kurd ketiye, dijmin tiştek jê re nehiştiye, rih nehiştiye. Em vê yekê fêm dikin. Em mecbûr in ku vana fêm bikin û li hember şer bikin. Ev temsîla xwe di Barzanî de dibîne. Mesele ne PKK ye. Piştî ku mamoste ji min re silav şandin, me qebûl kir. Me jî jê re xeber şand ku, pirsgirêka Barzanî ya bi siyasetê yan jî bi şer çareser bikin. Êdî sebra me nemaye. Ji ber ku Barzanî di paşverûtiya kurdan de, Barzanî ekolek e. Tu ewqas biçî cem Îran û dewletên din, ji xwe tu yê zehmetiyan bikşînî. Dê camêr li ser te hesaban bike. Vexwendina qada Çarçira tê çi wateyê? Wekî mînak dibêjin Talabanî pir dilîze. Lê paqij dilîze. Gelekî taktîkzan e. Serokatî çi ye, ev pir teng tê fikirîn. Piştî ku hûn çûn cem Şahê Îranê, divê hûn venegeriyana. Dema hûn tên cem Baasê jî hûn teng dimînin. Di navberê de xetereyeke mezin heye. Bi taybetî jî hûn di sala 1966'an de neçar dimînin ku wisa tevbigerin. Ji bo ewlehiya xwe hûn ji Barzanî direvin. Navê we wekî "cehşên 1966'an" derdikeve. Lê belê tu kesek di rastiyê de cehş kî ye, kî rê li ber vê vekiriye fêm nake. Camêr bixwe cehşitiyê dike, lê belê kes vê fêm nake. Ji kesên ku li hember cehşitiyê derdikevin kî dibêjin " hûn cehşin." Ev dereweke pir mezin e. Lê êdî gel ji vê derewê bawer dikir, ne wisa? Em dikarin îspat bikin ku di wê demê de cehşitî bi awayekî din hatiye kirin. Kesê ku parî zana be, dikare vê rewşê tavilê fêm bike û rihê wî jî nas bike. Di vê de cehşitî tineye, ji bo gelê kurd xwestina hin mafan heye. Gelek şaşiyên te jî çêbûn. Pirsgirêkek din jî heye. Niha camêr dixwaze ji Iraqê hin tawîzan bi dest bêxe. Ku ew nebin tine bibe. Ji vê re cehşitî tê gotin. Kes vê xalê nizane. Di nav têkiliya ku we

bi Şahê Îranê danîbû de hinek welatparêzî heye. Lê belê têkiliya ku Barzanî pêktîne bêrêtî ye. Dema ku hûn bi Baasê re têkiliyan pêk tînin, hûn dixwazin ji bo gelê kurd hin tiştan bi dest bixin. Lê belê têkiliya Barzanî ji bo berjewendiyên takekesî û eşîretî ne. Hê ev rewş fêm nekirine. Li ser van gotinên xwe ez dixwazim bi kûrahî bisekinim. Ne ji bo rabirdûyê ji bo îro dixwazim bisekinim. Gelek kesên kominîst, rewşenbîr û hunermend tên cem me, lê qet tiştek nizanin. Nizanin siyasetê jî bikin. Hema dibêjin pere, pere ji bilî wê tiştek nabêjin. Bi feraseta bazirganiyê şoreş û şoreşgerî nayên kirin. Em ne dikarin pere, ne jin û ne jî mêr bidin. Ti tiştek ji wan re namîne.

Hawar= Dîsa hinek dîroka berxwedanê ya partiya kominîst hebû. Hîmên kurdîtiyê kominîstan nîşanê kurdan da.

Abdullah Ocalan= Çawa? Li gorî min wan Kurd asteng kirin.

Îbrahîm Ehmed= Eşhedû bîllah rast e.

Abdullah Ocalan: Niha Moskova ket çi halî? Li cem we ket çi halî? Li cem me, li Turkiyeyê ket çi halî? Li Tirkiyeyê bazirganê xwedî sermîyanê mezin Cem Boyner heye. Tevgera demokrasî ya nû ava kir. Hemû endamên polîtbûroya partiya kominîst a Tirkiyeyê niha ji sedî sed li cem wî politîka dimeşînin. Di kesayetiya kominîstên Iraqê de zêde tiştek nabînim. Aliyekî mejiyê gelê kurd, ku ji aliyê Barzanî ve hat rizandin, aliyê din jî kominîstên Iraqê rizandin. Pêkane ku hin mirov derketibin. Lê belê gelek kesên bêedep, bêexlaq û siyasetê fêm nedikirin ji dibistana Barzanî derketine. Li aliyê din ji Barzanî zêdetir partiya kominîst bi mejiyê kurdan lîst. Mamoste ji min fêm dike ku ez çi dibêjim.

Dema ku kominîst li ser pirsgirêka Kurd diaxivin, hin tiştan biçûk dibînin. Neteweyîtî tine, demokrasî tine. Dibe ku li Iraqê ligel PDK’ê partiya kominîst jî xwest hin tiştan bike. Bi aliyê xwe yê ideolojîk û siyasî ve tevgereke marksîst e. Wekî mînak, Barzanî dan kêleka xwe û xwestin wî bikşînin feraseta neteweyîtiyê. Ev baş e. Lê mixabin nikaribûn ser Barzanî bandor bikin. Ji ber ku nikaribûn feraseta wi ya eşîrtiyê biguherînin. Wekî ku ji Barzanî re bibêjin bi axatî û bi diktatorîtiya xwe bimeşe. Tiştên ku fikirîbûn karibûna bikirana baş dibû, lê belê nebû.

Ya duyemîn: Ti siyasetmedar î, rewşenbîr î, camêr hemû tiştî ji te fêr dibe, lê belê xwe wekî serok dide qebûlkirin. Ez ji bo vê yekê mijarê vedikim, ango ev pirsgirêk pirsgirêkeke jiyanî ye, pirsgirêka hemû Kurdan e. Barzanî di bazirganiyê de gelek bi hêz e. Dijminên me dê li hember kurdan çawa tevbigerin, dê bi kê re têkiliyan deynin dizanin. Çima hemû dijminên kurdan bi Barzanî re têkiliyan datînin? Ji bo ku Barzanî di hevkariyê de û di radestkirina vîna xwe, ya dewlet û hêzên din de rista xwe pir xweş dilîze. Kesê ku ewqas bi dijminê xwe re be, dikare her tiştî bike. Camêr bazirganiya xwe jî li ser vî esasî dide meşandin. Niha ev kiriye, ew kiriye mirov ecep dimîne. Tê fêmkirin ku di wî warî de ev camêr ji berê ve xwedî hêz e. Wekî mînak: Hevkarî û bazirganiya xwe dixe stûyê Mamoste Îbrahîm Ehmed.

Niha mirovek wisa çawa dibe pêşengê kurdan? Gelek neyîniyên ku li Kurdistanê derdikevin ji bin serî wî derdikevin. Ev rastî îro jî derdikeve holê. Ango hakîmiyet tineye. Ji ber wê, niha derewên herî mezin di ser me re dike. Gelê Iraqê jî vî ya dibihîze. Dibe ku we jî guhdarî kiriye. Ka pirs bikin, tenê derewên ku di ser Mam Celal û Apo re gotine çi ne, ew ê ji we re bibêjin. Her roj di radyo û televizyonên Barzanî de çiqas derew tên kirin, diyar e. Niha

kurdên dirust ên ku dixwazin tiştên baş bikin jî hene. Lê belê fersend nade wan û ciwanan. Naxwaze rê li ber kesî veke.

Hawar: Sedema vê çi ye? Camêr Kurdistanê difroşe û naxwaze kes jê re bibe asteng.

Abdullah Ocalan: Bê guman pereyan ji bo şexsê xwe û malbata xwe distîne. Niha dibêjin, em ê hikumetê damezirînin û em serbest in. Ji min re jî peyam şandiye gotiye “bila bê.” Bê guman em biçin dê me biqedîne. Kesekî weke Barzanî heke dikare hikumetê damezirîne, tu dikarî tiştên mezintirîn bikî. Em ê li ser vê mijarê hîn bisekinin. Ez bawerim dê sûdwer be. Em ê dîtinên te jî bigirin, hûn ê jî bibin alîkar. Em ê serî li dîtinên mamoste jî bidin. Em êdî naxwazin berdewamkirina derewan serwer bibe,dixwazin ev derew bên sekinandin. Bila serweriya derewan bi dawî bibe, rastî derkevin holê. Mirovê kurd, ciwanê kurd û rewşenbîrê kurd bila rastiyan bibînin. Bila ronahiyê bibînin ku kes riya xwe şaş neke. Li holê derewên mezin hene, divê em wan ji holê rakin. Hin rastî hene divê herkes wan bibîne. Mamoste, ji bo berbihevanîna mijarê mirov dikare ji bo salên 1970-75’an çi bibêje? Rola Barzanî çi bû, we dixwest hûn çi bikin?Peymana 12’ê  Adarê hebû ku di 1975’an de têk çû. Barzanî reviya çû. Ez vê revê revek mezin dibînin. We jî tiştek nekir. YNK hat damezirandin lê pir bêhêz bû, gelek tişt ji dest çûn, gelek tişt hatin windakirin. Sedemên vê çi bûn? Çima ev sedem derketin holê? Ji bo analîzkirina rewşa Kurdistanê pêvajoya 1970-75’an girîng e. Di vê dîrokê de PKK’e çêbû. Di pêvajoya 1970-75’an de xala ku li hemû Kurdistanê were esasgirtin çi ye? Kîjan serdem hat girtin, kîjan serdemê dest pê kir?

Gelê Kurd helwesta xwe li aliyê têkoşîndayînê, diyar kir.

Îbrahîm Ehmed: Piştî ku em gihîştin sala 1975’an me rewşa partiyê tehlîl kir. Di sala 1970’î de ez û ji komîteya navendî hevalek

em çûn biryargeha Barzanî. Me li wir bi Barzanî re civînek pêk anî. Di serî de Barzanî tinê bû. Lê piştre hemû komîteya navendî ya Barzanî di civînê de amade bû. Bi vî awayî civînê berdewam kir. Hin endamên komîteya navendî yên wî li hember derketin. Mele Mistefa ji wan re got; “ Ev sûcê we ye, ji bo kuştina wan min pere da we, hêz da we, hemû tişt da we, mixabin we nikaribû ew bikuştana. Niha ez wan qebûl dikim. Dîsa hin dewletên bi hêz ên herêmê dixwazin ez bi wan re li hev bikim. Êdî ez nikarim van qebûl nekim.”

Tiştên ku Barzanî digotin ne rast bû. Tiştek wisa tinebû. Hinek kes alîgirên li hev hatinê bûn. Digotin; “Divê bi Mamoste Îbrahîm û alîgirên wî re lihevkirin pêk were.” Barzanî bixwe axaftinên kesên ku li Iraqê sixûriya Îngilîzan kiribûn û piştre reviyabûn hatibûn, zêdetir bi ber çavan digirt. Zêde guhdariya kesê welatparêz nedikir. Xeyaleke me ya ku ya em biçin bibin cehşê Îranê yan jî li gel Barzanî bimînin tinebû. Me danezana 11’ê Adarê baş didît. Me ji Mele Mistefa re got: “ Tiştên ku tu dibêjî em qebûl dikin.” û di wê çarçoveyê de tifaq(lihevkirin) qebûl kir. Min mayîna hemûyan a li ber Barzanî û venegerîna xwe ya ji herêmê qebûl kir. Kesên ligel min hebû. Barzanî endamên komîteya navendî yên ligel min qebûl kirin. Talabanî bi hinceta temamkirina perwerdehiya xwe çû Ewropayê.

Wê demê hikumeta Iraqê jî piştgirî dida Barzanî. Herêmên ku di bin kontrola Barzanî de bûn li wan deran otorîteya xwe bihêz kirin. Heta, li herêmên wekî Silêmaniyê ku kontrola Barzanî nebû jî xist bin kontrola Barzanî, piştgirî da û çavên xwe jê re girt. Wî jî wekî wezîr di hikumeta Iraqê de cih girt. Heke Barzanî nebûya bi lihevkirina me ya bi hikumeta Iraqê re dê ji sedî pêncî xwesteka me bi cih bihatana. Hikumeta Iraqê dirust tevdigeriya. Heke Barzanî

mirovek dirust bûya û di nav îxaneta neteweyî de nebûya dê xwestekên me pêk bihatana. Astengî ne ji hikumeta Iraqê, ji Barzanî bû. Di peymana 11’ê Adarê de cara yekemîn şoreşa Kurdistanê dihat naskirin.Ne tenê hikumeta Iraqê dewletên wekî DYE, Îsraîl, Îran û nûnerên hin dewletên biyanî ku di maseyê de rûnistîbûn jî hebûn.Armanca Iraqê jî ev bû ku, bi vê peymanê têkiliya kurdên Iraqê ya bi DYE,Îsraîl û Îranê re qûtkirin bû. Lê belê Mele Mistefa ev xala girîng nedît û tevlî peymanê nebû. Di wê demê de Mir Kamûran Bedirxan hat Iraqê. Hikumeta Iraqê jî ew qebûl kir û wek serokekî Kurd nas kir. Mîr Kamûran Bedirxan ji bo dîtina Mele Mistefa çû herêma Barzan. Piştre çû Îranê û ji vir jî derbasî Parîsê bû. Ji vir cara yekem Mele Mistefa peymana 11’ê Adarê bin pê kir, bi Îranê re têkilî danî. Halbûkî di peymanê de şertê bi derve re têkilî nedanînê hatibû danîn. Têkiliyên Mele Mistefa yên bi Îranê re hatin asteke ji berê bihêztir. Bi taybetî jî têkiliyên aborî, leşkerî û siyasî bi hêztir bûn.

Kurdistana Başur bû herêma kaçaxçiyan. Têkiliya Mele Mistefa ya bi Îranê re ji têkiliya bi Iraqê re pêşdetir bû. Hikumeta Iraqê di destpêkê de pirsgirêk ji nedîtî ve hat. Dît ku nabe. Bi ser de jî di nav partiya Baasê de kesên li hember vê rewşê hebûn. Dijberiya Kurdan her ku diçe zêde dibû. Çareserî di tifaqa bi Îranê re de dîtin. Di wê demê de di navbera hêzên Iraq û Barzanî de cih bi cih pevçûn pêkdihatin. Hikumeta Iraqê Barzanî wek tehlûkeyeke mezin dît û ji bo kuştina Barzanî ket nav plansaziyan. Têkiliyên Mele Mistefa û Iraqê bi temamî qût bûn.

Piştî xirabûna bi tifaqa Iraqê re heyeteke Îranî ku tê de endamên istixbarat, leşkerî û aborî pêk dihat, hat. Wê demê têkiliyên dewleta Iraq û Sovyetan baş bû. Di navbera wan de protokolek hatibû îmzekirin. Hikumeta Iraqê jî di nav rêvebiriyê de cih da komînîstan û tifaq çêkirin. Ji partiyê xwest ku tevlî eniyê bibe. Partiyê

ev red kir. Partiyê ji bo lihevhatinê navbeynkarî pêşniyaz kir. Bi taybetî jî di mijara Kerkûkê de êdî gav bi gav hikumeta Iraqê jî peymana 11'ê Adarê bin pê dikir, lê belê sedema bingehîn îxaneta Barzanî bû. Bi herdu aliyan re jî ti lihevkirinek me çênebû.

Di wê demê de ji Sovyetan heyetek hat. Çûn mala Barzanî û ew ziyaret kirin. Prîmakov(Serokê Heyeta Sovyet) ji Barzanî xwest ku nûnerek xwe bişîne Moskovayê. Soza çêkirina peymanekî di navbera kurdan û Iraqê de da. Heyeta Sovyetê ji bo ku xwestekan bide qebûlkirin soz da. Heta wê demê politîkaya wî ya hevgir a bi Emerîkayê re veşartî bû. Dixwest ku hem ji DYE'yê û hem jî ji Sovyetan piştgiriyê bigire. Di wê demê de bi Sovyetan re têkiliya xwe qut kir û wek mirûdekî bi DYE'yê re hat girêdan. Heke nesihetên Sovyetan qebûl bikirana, dê mafê gelê Kurd ên ku bi peymana 11'ê Adarê re hatibûn bidestxistin, mîsoger bibûna û biketana bin xarantiyê.

Armanca DYE û Îranê lewazkirina hikumeta Iraqê bû. Yek: Iraq li herêmê dewleteke bi hêz a ereb bû û bi wê re girêdayî li gor berjewendiyê dewletên din dijber dihat dîtin. Dudu: Bi Sovyetan re di nav tifaqê de bûn. Ji bo vê ji bilî balafirên şer hemû cûre çek dabûn wan. Di navbera Mele Mistefa û Iraqê de pevçûnên dijwar hatin jiyîn. Dema ku hikumeta Iraqê ket tengasiyê bi alîkariya Tirkiyeyê DYE û Îran ketin nav têkiliyan. Bi vî awayî heta ku peymana Cezaîrê (06 Adar 1975) pêk were hevdîtinan domand. Hikumeta Îranê li hember piştgirî nedayîna kurdan ji rejîma Iraqê tawizên mezin bi dest xistin. Şatul Ereba ku berê mijara ne lihevkirinê bû dan Îranê. Mele Mistefa difikirî ku di şerekî navbera wî û Iraqê de em ê piştgiriya Iraqê bikin. Tim û tim di vê fikarê de bû. Wê demê ez û Fûat Mehsûm li Îranê bûn. Em vegeriyan Kurdistanê. Em beriya nûnerên Mele Mistefa gihiştin wir. Navê nûnerê wî Sitqî Mûtnî bû.

Ku em gihîştin bajarê Xanî yê ser sînor, em bi meş û xwepêşandanên kêfxweşiyê hatin pêşwazîkirin. Hemû gelê Kurdistanê li hember danezana ku ji aliyê komîteya navendî ya Mele Mistefa ve hatibû derxistin xwepêşandan li dar dixist. Di danezanê de dihat gotin ku “ya hûn ê teslîmê rêveberiya Iraqê bibin yan jî hûn ê çekên xwe teslîmê Îranê bikin û wekî penaber li Îranê bijîn.” Gelê Kurd jî digot; “ji derveyî van herdu vebijêrkan rêyeke sêyemîn heye û ew jî berxwedan e û têkoşîn e, em bi ti awayî teslîm nabin.” Sedemên vegera min bi hin hevalên welatperwer re têkilî danîn û li dijî tifaqa Îran û Iraqê derketin û kirina tiştên pêwist bû. Em difikirîn ku herî hindik ji vê tifaqa Cezaîrê ji bo gelê Kurd hin tiştan bi dest bixin û şoreş pêk neyê jî em bigihîjin hin mafan. Li gorî peymanê diviyabû heta 13’ê Adarê hemû çek bihatana teslîmkirin.

Di vê demê de Mele Mistefa li Tehranê bû. Li gorî tiştên ku me ji kesên tevlî civînê bibûn bihistin, Şahê Îranê bi awayekî vekirî ji Barzanî re wiha gotibû “me bi Iraqê re têkilî danîn, ji vir û şûn ve ne pêkan e ku em piştgiriyê bidin tevgera Kurd” û daxwaza belavkirina tevgera Kurd kiriye. Mele Mistefa jî bersiv daye Şah û gotiye; “ tevgera ku li gorî berjewendiyên Îran û Şah bin em bawer dikin ku dê li gorî berjewendiyên me jî bin.” Dema ku Mele Mistefa ji cem Şah diçe, SerokêSavak’ê(iran gizli serfisi) gihîştiye wî û gotiye: “tu çima wisa bi lez biryar didî? Divê te biryara xwe wisa bi lez nedabûya. Tu vegeriya Kurdistanê û bi heval û hogirên xwe bişewiriya.” Serokê Savak’ê ev ne ji ber hezkirina gelê Kurd, ji ber fikarên dibe ku Iraq van biryaran pêk neyne, dibêje. Ji ber ku heta şert bi cih werin dixwestin qerta Barzanî bi kar bînin. Tiştên ku dihat dîtin Mele Mistefa ji wan bi leztir tevgeriyabû.

Me bi hin kesan re hevdîtin pêk anî. Tişta ku derket holê piraniya daxwaza gelê Kurd berdewamiya têkoşînê bû. Şoreşa me,

şoreşeke ku wisa erzan were destgirtin nebû. Ji bo serkeftinê mirovên me yên biryardar, bi her awayî rêbaz bi hezaran çek û pêşmerge dîsa piştgiriyeke mezin a gel hebû. Tenê kêmasiya me 20.000 dolar bû. Ji bilî tiştê ku Mele Mistefa veşartibû. Hikumeta Îranê heta 19'ê Gulanê topên xwe li Kurdistanê hiştibûn. Pevçûnê heta vegera Mele Mistefa ya 13'ê mehê domand. Min dixwest ji bo ku mijarê pê re nîqaş bikim Mele Mistefa bibînim. Mirovek hat got: tu çi dixwazî? Min jê re got ez dixwazim Mele Mistefa bibînim. Ji min re got: kar qediya min bi berpirsiyarê Savak'ê û dîplomatekî DYE'yê re hevdîtin kir. Min ji wan re got: Em ê li derveyî peymana ku bi Iraqê re hatiye çêkirin tevnegerin û dê tevgereke neteweyî ya Kurd çênebe. Piştî vê axaftinê min bi komiteya navendî ya wî re hevdîtin kir.

Tekane kesê ku piştgirî dida vê peymanê Samî Ebdurahman bû. Ji min re got: " Em ê tenê bi hevkariya Îran û Iraqê re nemînin di heman demê de li hember kesên ku bixwazin vê peymanê bin pê bikin jî şer bikin." Piştre min Salih Ûsiv û Dara Kûfî dîtin. Ew endamên komîteya navendî bûn. Di roja yekemîn a îmzekirina peymanê de teslîmê rejîma Îraqê bûn. Endamên komîteya navendî yên din jî ji bo teslîmbûnê amade bûn. Êdî ne partî ne jî komîteya navendî hebûn. Her tişt di destê Barzanî û kurê wi yê biçûk de bû. Ez wê demê li Tehranê bûm. Rejîma Iraqê dixwest ku ez vegerim Iraqê, ji ber ku nikaribûn min qanih bikin, vê carê ji Îranê re digotin: "Ev mirov pirsgirêk derdixe, dixwaze tevgereke nû bide destpêkirin, divê hûn wî nehewînin." Wê demê rêveberiya Îranê ji min re got "ya tu yê biçî li sînorê Efganîstanê rûnê yan jî tu yê xaka Îranê biterikînî." Min Îran terk kir û ez çûm Îngilîstanê.

Abdullah Ocalan: Baş e, derketina Elî Esker û wan çawa bû? Çima tasfiye bûn?

Hawar: Piştî peymana Cezaîrê û 11’ê Adarê hin welatperwer û ciwanên Kurd ev peyman qebûl nekirin û derketin çiya. Kom bûn û hin rêxistin saz kirin. Ji van yek jî Şehîd Elî Esker bû. Wî û hevalên xwe şert qebûl nekirin û heta ku ji aliyê dijberên xwe ve hatin tasfiyekirin, têkoşiyan. Piştî şehadeta Elî Esker û koma wî Resûl Mamend derbasî Kurdistanê bûn. Li dora xwe hêz kom kir û pêşmergeyên xwe çêkirin. Tevgereke baş ava kir. Hikumeta Iraqê dixwest wî bi pereyan ji doza wî vegerînin. Heta sedhezar dînar lê hat teklîfkirin. Lê belê wî qebûl nekir û berxwedana xwe domand. Di wê demê de gelek rêxistin û partî ku partiya komeleyan jî ji van yek bû, hatin cem hev û Partiya Yekîtiya Niştimanê Kurdistan damezirandin. Gotin ku ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd dê têbikoşin û mafê wan heye ku ji bo gelê Kurd têkoşînê bidin diyarkirin. Hinek ciwanên bajaran tevlî partiyê bûn. Gelê Kurd helwesta xwe li aliyê têkoşînê diyar kir.

Tevgera Kurd bi xwîneke nû, bi rihekî nû û bi şêweyeke hêzdar ket bin kontrola ciwanên welatperwer. Piştî şerê Kendavê yanî şerê Kûveytê gelê Kurd bi serhildanan hêzên Iraqê ji Kurdistanê derxist. Hêzên yekîtiya welatperweran jî di nav serhildanê de cih girt. Piştî ku rejîma Iraqê bi hovitiyeke mezin êrîşî Kurdistanê kir û koçberiya mezin dest pê kir. Gel ji bajaran derket ber bi çiyê ve reviyan. Ev encama politîkayên dewletên hevkar a li ser Iraqê bû. Piştî ku dewletên hevkar Iraq dan sekinandin, Kurd hatin cihên ku ji aliyê hêzên Iraqê ve hatibûn valakirin, bi cih bûn û hikumeta federal ava kirin. Wekî ku mirovê gewre, serokê tevgera Kurd Îbrahîm Ehmed jî bi awayekî dîrokî li ser wê rastiyê disekine, divê mirovên welatperwer baş bizanibin ku: Çima serhildanên me yên berê negihiştin serkeftinê, sedemên wê çi bû û çima hatin şikestin? Divê wekî ku di mînakan de jî tê dîtin, baş fêm bikin. Dikarim gelek serhildanan mînakan bidim. Wekî mînak: Serhildana mezin a Be-

dirxan Beg her çendî li Bakur dest pê kiribû jî, têkoşîna xwe li Rojhilatê Kurdistanê geş kirin. Armanca wan ev bû. Îran lewaz e, divê em destpêkê li Îranê şoreşê pêk bînin û piştre em ê vegerin Bakurê Kurdistanê. Şex Ûbeydûllah jî ket heman şaşitiyê û ji Kurdistana rojhilat dest bi serhildanê kir.

Di wê dîrokê de rastiya dîrokî ev îspat dikir ku dewleta Îranê hem ji aliyê Çaritiya Rûs û hem jî ji aliyê DYE'yê ve xwedî girîngiyeke mezin bû. Dîsa ji aliyê kendavê ve jî pir girîng bû. Perçekirina axa Îranê karekî zehmet bû. Şaşitiya serokên kurdan jî li ser axa Îranê pêkanîna şoreşê bû. Divê berî ku şoreşgerên Kurd dest bi şoreşê bikira vê rastiyê jî fêm bikira. Di wê demê de împaratoriya Osmaniyan lewaz bû. Wekî mirovên nexweş bûn. Ji ber vê sedemên ji berjewendiyên eşîretî û herêmî zêdetir divê serhildana neteweyî li Kurdistana Bakur bihata destpêkirin. Lewaziya tevgerên Kurd a din jî pirsgirêka rêbertiyê bû, ku rêber çû, ew serhildan jî têk diçû. Di vê mijarê de tiştekî girîng jî gelê Kurd hê jî dost û dijminên xwe nas nake. Ji bo xwe dê dostên çawa çêbike, nizanîbû. Dîsa nizanîbû ku çawa gel bixe nava tevgerê. Serhildanên ku ez behsa wan dikim bi piranî herêmî û serhildanên xwecihî bûn. Ez dixwazim gelek mînakan bidim. Di serhildana Şex Seîd de, di ya Gazî Mûhammed de jî di şûna serhildaneke neteweyî ya berfireh de serhildaneke xwecihî pêk anîn. Di vir de divê em ji dîroka serhildanên Kurd dersên eceb derbixin. Divê ti partiyek vê neke pirsgirêka şexsî û xurûrî. Divê pirsgirêkên ku di serdema me de jî tên jiyîn çareser bikin. Ev di heman demê de peyvireke mirovî ye.

Abdullah Ocalan: Kesayetiya Barzanî xwedî taybetiyeke çawa bû, rihekî çawa bû û çiqas hat fêmkirin?

Îbrahîm Ehmed:Barzanî axayekî eşîrê bû. Wekî hemû axayên eşîra. Tenê bi vê dikaribû jiyana xwe bidomîne. Tenê bi

şertê ku divê tevlî siyasetê nebe. Ji xizmeta siyasî pirtir bi şertê ku di xizmeta malbata Barzaniyan de be. Bênerazîbûn û bêhişmendîbûn û wekî axayekî eşîretê tim jê re were gotin "Bêje, sêhit be, bêje" jê re îteet were kirin. Barzanî bi temamî berovajiyê Şêx Mehmûdê Berzencî bû. Şex Mehmûd her dem li pêş bû. Di şer de di çalakiyê de di nav komên êrîşê de cih digirt. Eskerên wî hewl didan ku em ê çawa wî biparêzin û nehêlîn bi ser leşkerên dijmin de êrîşan pêk bîne. Lê Barzanî dûrê mijarên eskerî bû. Ji şer nefret dikir. Mele Mistefa xwe pir baş diparast. Bi roj li cihek, bi şev li cihekî bû.

Ez li vir tiştekî diyar bikim: Ji bo ku di derbarê artêşa Iraqê de bibin xwedî agahî û bi lezginî têkiliyê çêbikin, me hinek bêtêl bi dest xistin û hinek cihaz ji Mele Mistefa re şandin. Li ser vê wî ji derdora xwe re gotibû: "Hûn dibînin ku Îbrahîm Ehmed di çi astê de li hember min dijminatiyê dike? Sedema şandina van cihazan ew e ku, ez ê bi bêtêlê biaxivim, dê balafirên Iraqê cihê min kifş bikin û li min bixin." Li ser vê cihê axaftina cihazan bi qasî şeş saetan ji xwe dûr diyar dike. Ji ber wê jî agahiyên ku dihatin bidestxistin piştî rojekê digihiştin wî.

-Fikirîna wî ya ideolojîk çawa bû? Neteweyî bû, eşîretî bû yan olî bû? Komîteya navendî çend kes bûn?

-Barzanî bi serê xwe eşîretek nebû. Perçeyek ji eşîreta Zibariyan bû. Tenê Barzanitî pirtir dişibiya mezhebekê. Ji terîqeta Neqşîbendî bû, digihiştin Xalid. Di mijarên olî de birayê Barzanî Şex Ehmed dihat hezkirin. Ev ne ji ber ku birayê mezin bû. Şêx Ehmed wekî xwedayê Barzan dihat naskirin. Siya xwedê ya wê herêmê bû.

-Baş e. Dibe ku malbata Barzanî ji malbata Qureyşiyan be? Dibe ku hatibe wê herêmê û tevlî eşîretê bûbe. Yanî dibe ku endamê

terîqetê be û hatibe wir. Li gor texmîna min rewşa malbata Barzanî wisa ne, ne eşîreteke bi serî xwe ye.

-Ez di vê mijarê de ne xwedî zanîna dîrokî me.

-Li gorî texmîna min ne ji eşîretê ne. Mirîdekî terîqeta neqşîbendî ne. Ji Bakur, ji Şemzînanê hatine. Geriyane geriyane gihiştine herêma Barzan. Divê wisa be. Li aliyê din mirov nikare bêje ew eşîret e, taybetiyên wî yên eşîrî jî zêde ne bihêz in. Eşîreteke ne mezin e jî.Tenê mirov dikare bibêje pêkhatineke melatî û eşîretê ye. Ev di nav rastiya Kurdistanê de heye. Li Kurdistanê axatî, meletî û eşîratî bi hêz e. Mirov dikare bibêje Bedirxan axayek bû. Serokê eşîrê bû, taybetiyên axatiyê temsîl dikirin. Şêx Seîd pêşengê meleyan e. Yê herî mezin û dirust e. Mirov nikare ji bo wî tiştekî bibêje. Seyîd Riza bi temamî serokeşîr e. Lê yê Barzanî tiştekî cihê ye, di melatiyê de jî wisa ne bi hêz e. Him di axatiyê de û him jî melatiyê de bingeha wî teng e. Ev jî rastiya Kurdistanê ye. Ji bo wê kesayetiyeke wisa bi meletiyê, eşîrtiyê û axatiyê dilîze. Ev kirine.

-Kesayetiya Barzanî di Kurdistanê de kesayetiyeke eceb e. Kesayetiyên wisa ku fersendê bibînin, bi olê dilîzin lê wekî oldar tevdigerin. Bi serokeşîrtiyê dilîzin lê axayan bi xwe ve girê didin. Divê di vir de mirov xalekê destnîşan bike. Ev kesayetiyeke pir tirsonek e,pir lîstok û kesayetiyeke ku di her kêliyê de diguhere. Ji ber ku bêbingeh e. Wekî serokê eşîretê, kesên wek Bedirxan Beg û Seyît Riza ne wisan in. Lê belê Barzanî ya bi eşîretê ya bi meletiyê yan jî bi axatiyê dilîze. Kesayetiya wî wisan e. Di Barzanî de zelalî tineye. Ez kurdîtiya wî napejirînim. Gelê Kurd çiqas wî nas dike? Ez wisa texmîn dikim ku bi wî re netewperestiya kurdî qet tineye.

-Di siyasetê de pir nezan bû. Heta ku min wateya otonomiyê bi wî da fêmkirin demeke dirêj derbas bû.

-Jixwe zanîna wi ya siyasî û aliyê wî yê netewperestî pir lewaz e. Ez bawer nakim ku ji civaka Kurd tiştek fêm kiriye. Gelo di derbarê civaka Kurd de tiştek zanî bû? Na, tiştek nizanibû. Dibe ku hin tiştên olî zanibû.

-Dema ku Barzanî hat Silêmaniyê hemû zanînên xwe yên olî ji Şêx Baban Elî digirtin. Tişteke din jî yek-du ziman zanibû.

-Barzanî? Ziman zanîn zêde ne pirsgirêk e. Texmîn dikim ku bi Îngilîzî jî zanibû.

-Dema ku Barzanî gihîşt Rûsyayê di belavbûna derdora wî de tenê ne yê Rûsya sûcê wî hebû. Serbazek Sovyetê li Azerbeycanê dema ku wan pêşwazî dike, jê dipirse: “Tu bi îngilîzî dizanî?” Ew jî dibêje: “Li Rûsyayê hewce nake. Ez ê ji balyozxaneya DYE’yê re nameyeke bi îngilîzî binivîsim. Berê li Tehranê ji me re gotibûn. Em wê demê li Tehranê bûn, me nizanibû dinya çawa ne. DYE’yê derfet da me, em neçûn. Tenê niha ez ê ji bo çend kesên derdor û nasên xwe daxwaza mafê penaberiyê ji DYE’yê bikim.” Dibêje: Ji ber vê ji Stalîn jî hêrs dibe û wan belav dike. Kesê ku ev digotin mirovê duyemîn bû. Dema ku em çûn Barzanî bînin, ew jî hat. Sixûrên Sovyetê di derbarê têkiliyên Mele Mistefa yên bi dewletên din re hîn dibûn û pêşkeşî hikumetê dikirin. Hikumetan jî bi vî awayî helwest nîşanî wî didan. “Vê mijarê li ser min pir bandor kir. Ez biçûk bûm, min birin nexwesxaneya dînan. Du salan li wir mam. Me singê xwe da ber ewqas zehmetiyan û ji bo gelê xwe me biryara berxwedanê da. Lê bi hinceta sixûriya DYE’yê em hatin darizandin.” Digot. Hevalên li cem wî got: “ Mele Mistefa ji min ferhenga Îngilîzî- Erebî xwest. Ez şaş mam, Mele Mistefa dixwaze Îngilîzî fêr bibe.”

-Di vir de tiştê girîng derket holê tengbûna nêrîna wî ya siyasî bû. Sedema hînbûna çend peyvên bi îngilîzî ji bo xizmeta

Emerîkayê bû, nîşana wê bû. Di vê pêvajoyê de xwesteka fêrbûna îngilîzî ne ji bo kirina hin tiştan, ji bo koletiyê bû. Di serî de ji bo naskirina Sovyetê ti rewşek wî tinebû. Bi ti awayî Sovyet nas nedikir. Stalîn nihêriye ku camêr li Emerikayê digere ew casûs dîtiye û belav kiriye. Ev rastî ye. Li aliyê din siyasî û zanyarî jî nîn e. Di dilê wî de neteweya Kurd tineye. Di wî de aliyê eşîratî giran e. Heta ne eşîretî jî, malbatî. Fereseta wî û zarokên wî ev in.

-Dema ku em li Îranê bûn Barzanî hin hêzên xwe şandin herêma Pencewîn ku li sînora Îranê ye. Me sedemên anîna vê hêzê lêkolîn kir. Ev derket holê: Li bendê ye ku em sînor derbas bikin. Dema ku em ji sînor derbas bibin, me tine bike. Dîsa li gundekî herêma Pencewîn kesekî bi navê Mistefa Mecîd û dîsa hin kesên ku ji gundên din dihatin hebûn ku sempatîzaniya Barzanî dikirin. Ji Barzanî re digotin: “Serokê me, serbaz û leşkerên we dest diavêjin namûs, jin û keçên me. Hûn çi dibêjin?” Barzanî jî ji wan re digot: “Lê çi dibe, tiştekî nabe. Em dixwazin zarokên we jî wek me bibin Barzanî. Ez amade me ku ew yên ku jina wî hatibe revandin sed dînar, keça wî hatibe revandin jî pêncî dînar bidim. Ev mirov jî piştî ku ji dîwana Barzanî derket dibêje pir ne baş be jî, em li pey tirkekî bimeşin, lê li pey Barzanî neçin.

-Di vê rewşê de tiştekî din îspat dike. Ev malbatparêzî û parastina derdora xwe ye. Malbata wî pir ketiye. Wî her wext zêdebûna Barzaniyan xwestiye. Heta ji derdora xwe re dibêje biçin jin û keçên pêşmerge û gundiyan ji wan bistînin. Ez bawer im ku vê rewşê hê jî didome. Barzanî zarokan peyda dike. Di bingeha xwe de ev îdeolojiyeke. Îdeolojiyeke pir paşverû ye. Di destpêka mirovahiyê de klan hebû. Ev îdeolojî, îdeolojiya klanan e. Bêriya ku komên mirovan çêbibin malbat wisa pêk dihatin. Pir paşverû ye û nafikire. Ev kesayetî ne di civaka koledar de, ne di civaka feodal de

û ne jî civaka kapîtalîst de heye. Di vê kesayetiyê de tenêtiyeke mezin heye û paşverû ye. Tenê gotina camêr a “Tiştên ku pêşmerge dikin baş e heta teklîfkirina pereyan, bila malbat û derdora Barzanî zêde bibe, ne malbatîtî, ne eşîratî, ne axatî û ne jî melîkîtî ye. Ew Barzanîtî ye. Ji bo wê pêdivî bi hin tiştan heye. Di hundir de bi herkesî dilîze. Ji bilî Barzaniyan ku ew jî ne eşîret e malbat e. Kî hebe heta dawiyê bi wan dilîze. Bi komployê bi pere û fersendkeriyê, tu çawa bibêjî wisa van karan dike.

Li ser dewletan dilîze. Dewlet gelek baldar in. Ecêb e zêdetir jî dewletên mezin guhdar dike. Ka li vê dewletê çi pêk hat, bi baldarî dişopîne. Wekî ku we jî behs kir, dewletan zêde digire ber çav. Ku dewletek tiştekî got, gava wî ya yekemîn qebûl kirine. Tim û tim li cem hêzdaran e. Wekî mînak, Îran hêzdar e, dibêje peymanê xira bike, tevilê xira dike. Di pêkanîna gotinên dewletên hêzdar de û xwe bihêzkirinê de her rêbazê rewa dibîne. Hemû tiştê ji bo xizmeta malbata xwe qebûl dike. Heta pere jî dide. Heke di xizmeta malbata wî de nebe, bi awayekî bêsûc mirovan jî dikuje.

Li ser mijara mirovkuştina Barzanî divê mirov bisekine. Kuştin ne li ber sûcên neteweyî yan partiyê ne. Dinihêre ku zerarê dide malbatan û bêhêz e jî bi awayekî bêsûc dikuje. Ev nêzikatiyeke pir hov û nêzikatiya îdeolojiya klanan e. Kesê ku endamê vê kabîleyê nebe tavilê tê kuştin. Ev tiştekî pir qirêj e.

Mamoste we çawa ev rewş nedît? We çawa ev kesayetî tehlîl nekir? Dîsa ez dikarim îspat bikim ku Barzanî malbatek e. Kesayetiyeke pir hov û paşverû ye. Dema ku civak çêdibe klan û qebîle pêk tên. Vana jî di Kurdistanê de ji xwe re qebîle afirandin. Derveyî xwe bi hêzdayîna van derdorê kontrol dike. Di sedsala 20. de ji bo kurdan ev tê çi wateyê? Tu qebîliyeke tinê li ser serê kurdan dikî

serok. Ev tê wateya qedandina kurdan. Mirina kurdan ji ber vê rêveberiyê ye. Hûn dibêjin me pirsgirêkan bi awayekî zanistî çareser kir. Lê di camêr de siyaset tineye. Niha Stalîn di 1942'an de tiştekî wisa qebûl dike? Jixwe dê Stalîn te tasfiye bike.Yanî siyaset qet tineye.

-Di Barzanî de rihê mirovahiyê jî tineye. Wekî mînak, ji bo xalê xwe û sêzdeh zarokên wî fermana kuştinê dide û zarokek 6 salî heye, ew jî tê kuştin.

-Sedemek vê hebû? Pirsgirêk ne tenê zalimbûna Barzanî ye. Pirsgirêk, ji bilî nêrîna wi ya qebîletiyê tiştteke din e, ne zanîn e. Eşîret mezin e. Qebîle mezin dibin, sedsal şûnde dibin eşîret. Eşîret jî mezin dibin û gelek eşîret tên cem hev û gel pêk tînin. Gel bi hatina cem hev a gelek eşîran li ser heman ziman û çandê pêk tê. Pêkhatina gelan demeke dirêj digire. Piştî pêkhatina gelan netewe çêdibin. Netewe xwe dispêre yekîtî û yekparetiya axê.

Niha Barzanî çi ye? Ji aliyê eşîrtiyê ve, kesayetiyeke mezin a eşîrê tineye. Mehmûd Berzancî kesayetiyeke mezin e, axa ye, serokekî mezin ê eşîrê ye. Her wiha Bedirxan Beg axa ye. Mezin e, wek dewletê ye. Şêx Seyîd melayek mezin e, ramyarekî îslamê ye. Di ûmmetbûyîna îslamê de neteweyê înkar nake, dirust e. Li dij kemalîzmê derdikeve. Ev tarzeke rast e. Em li Barzaniyan binêrin: Seroktiya eşîrê ne wek Mesûd Barzanî ye. Serokeşîr mirovên xwedî soz in. Eleqeyeke Barzanî bi wan ve nîn e. Ne axayekî mezin e jî. Bedirxan Beg axayek zana ye û wekî dewlet e. Tu zarokên wî dinihêrî zana ne, heta pirê wan pirtûk nivîsîne. Ji vê malbatê kesayetên mezin derketine. Çima? Ji ber ku axayek mezin bû. Ev ji aliyê civakî û siyasî ve bi pêşketîbûna wan ve girêdayî ye.

Şêx Seyîd mele ye. Lê meleyekî dirust e. Ew jî neqşîbendî ye. Niha kurekî wî heye. Gelekî zana ye. Ji vana hezar bêtir siyasî

ne. Di tehlîlkirinê de pir bi hêz in. Di Barzanî de meletî tineye. Yanî kesê ku hîmê meletiyê nizane li Kurdistanê dibe serok. Jixwe di vir de winda dike. Wekî mînak: Dibêje biçin jin û keçên gundiyan ji wan bigirin. Bila zarok çêbibin, Barzanî zêde bibin. Pereyan dide. Di kevneşopiya eşîrtiyê de ev tineye. Ne pêkan e ku reîsê eşîretê ji bo eşîra xwe tiştê wisa bike. Di eşîrtiyê de jî di axatiyê de jî tu nikarî vana bikî. Di melîktiyê de qet nikarî bikî. Ev zagon, zagona klanan e. Ev tişteke pir ecêb e, we li hember vê şer nekir. Ev zagoneke çar hezar sal berê ya ji serdema baviksalariyê paşverûtir re. Di vir de sûcê zarokek pênc salî çi ye? Bi camêr re wûjdan tineye. Gelek kes ji aliyê Barzanî ve hatin kuştin. Gelek eşîr talan kirin. Di vê îdeolojiyê de ji bilî malbat û klana wî mafê jiyana yên din tineye.

We çima ev qebûl kir? Ez vê xalê ji we re vekim. Kurd ne bi tevahî ketin binbandora axatiyê û ne jî karibûn konfederasyona eşîran pêk bînin. Di dema Medan de tiştên wisa hebûn lê hilweşiyan. Ji bo çêkirinê kesek wek Hz. Mihemmed jî nehat. Barzanî dikare wek Mihemmed bike. Xwe pêxember, xweda îlan kiriye. Şêx Ehmed xwe wekî xweda dibîne. Lê belê pêxember ne wihan in. Xwedayek sexte, pêxemberek sexte ji kurdan re pêşengiyê dike.

Xwedêtî û pêxembertiyek sexte ji ber ku eşîratiya çar hezar sal berê esas girt û şovenîst bû û nikaribû tiştekî bike. Kî ji wê re alîkariyê dike ew jî sexte ye. Niha mirov nikare ji bo Barzanî bibêje meleyekî mezin e, ew jî şaş e. Çiqas mezin û welatperwerên kurd hebûn hatin cem me. Diyarkirina min a van rastiyan û meşandina min a siyasetê ya li hemberê wî nayê wateya ku ez li hember wî îdeolojiyekê diafirînim. Tenê dema ku em Barzanî tehlîl dikin, em rastiyekê datînin holê. Ew nikare serokatiya eşîretekî bike. Ji ber ku hêzeke wi ya wisa tineye. Serokek divê xwedî wûjdan be. Wûjdana wî tineye. Melatî û axatiya wî sexte ye, di vê rewşê de çima serokê

kurdan? Li ser vê divê mirov baş bisekine. Bi gelek aliyan ve kurdan fêm nake. Wekî mînak: Eşîrên ereban hene û pir asî ne, lê girêdayî qewmên xwe ne. Niha di kurdan de ev jî pêk nehat. Di kurdan de hestên desthilatdariyê pêş neketine. Ji bo vê perçebûne. Barzanî ekolek e.

Wekî mînak gelo çima oldarên kurdan sexte ne? ji ber ku dixwazin wekî dijmin bikin. Ola îslamê li Îranê ji bo berjewendiyên gelê Îranê Şîa birêxistin kiriye. Tirkan îslamiyet û axatî bi awayekî ecêb bi hev ve girêdane. Li ser vî esasî dewletên mezin ava kirine. Di nav Kurdan de berovajî vê hatiye jiyîn. Ji biyaniyan re rewşa xizmetê heye. Ol ji bo mirov hatiye çêkirin. Lê kurd bi vî awayî nafikirin. Di wî de felsefeya kurd ji bo ol hatine çêkirin esas e, ji ber vê ye ku Kurd di xizmeta sûltanên Ereb û Farisan de ne. Lê heke bixwestana karibûn artêşa xwe jî çêbikin. Li gorî min aliyên neteweyî yê Bedirxan Beg hebû, dixwest hin tiştan bike. Di îdeolîjiya Ehmedê Xanî de neteweyîtî hebû. Dixwest neteweya Kurd bigihîne hev. Dibe ku di serdema Bedirxan Beg de dikarîbû gaveke mezin bihata avêtin.Heke Şêx Seîd biserbiketa dikarîbû li gor berjewendiyên kurdan gavekî biavêta. Heke biserbiketa mecbûr bûn ku vê bikin. Lê têk çûn. Em hinek jî li ser tevgerên civakî yên siyasî û nûjen rawestin. Di serî de ez dixwazim vê bibêjim ku, civaka Kurd pir ketiye. Em Barzanî û partiyên din li derekî bihêlin, di nav PKK’ê de jî tiştên bi vî rengî hene. Li hember vê ez têkoşîneke bêhempa didim. Hevalek min ê kevn heye, ji hevalên min ên destpêkê ye. Ji aliyê Dêrsîmê hatibû. Rihê eşîriyê jî tê de nemabû. Di dibistanên tirkan de mezin bû. Piştî demekî min nihêrî ku bi fereseta partiyê bi feraseta kurdîtiyê nikare bimeşe. Kar û xebatên siyasî mezin dibin, wî xwe bi malbatê ve girêdaye. Me di salên 1972’an de dest pê kir û em gihîştin salên 1980’î. Min dît ku hevalê min dikeve valahiyê. Çendî bar giran dibe, heval jî ya dixwaze xwe tine bike yan jî xwe malbatê ve girê bide. Me ev xetere dît. Xwe bêhêz kiribû. Bi vê

aliyê xwe zerar dida partiyê jî. Em li ser pir sekinîn û hê jî disekinin. Heke tu pêşî lê negirî, encam dibe wekî ya Barzanî. Yanî ji bo ku yek zarok çêbikim hemû zarokên neteweyê dê bimirin. Ev bi ti awayî nabe. Barzanî çima dest diavêjin jinên gundiyan? Ji bo ku zarok li  malbata Barzanî zêde bibin. Ev mijareke girîng e, berê jî min diyar kiribû. Bê zarok nabe, ez vê tenê ji bo serok dibêjim. Tu serokekî bila zarokên gel bimirin ku yên din bibin zarokên Barzanî. Ma ev dibe?

Tişteke din, ez bawerim birayê wî Dilşad li Ewrûpayê wisa gotiye; “Kurdîtî baş e, lê ev gotinên me di bin lingê Mesûd de wek parçeyekê paç e.” Parçeyê paç tê çi wateyê? Di bin lingê wê de çiye? Nexwe Kurdîtiyekê we ya wisa noqûm(batsın) be. Niha kole nebûya me bipejiranda. Ger ku rêbertiya Barzanî nebûya me bipejiranda. Me bigota ha ji te re weke paçekê paqij bike. Lê belê zilam zebûne(düşkün). Disa, ji her tiştê gel re dest davêje, zorbazî(zorbalik) dikin. Ev xal girîng in. Kesekî ji jinan re destavêtinê ji bo ku Barzaniyan zêde dibe pesend dike; ya din jî dibeje; kurdînî di bin lingê Mesûd de paçeke. Vaye nirxê gel vê rengî dizan in. Ger ku rêbertî wisa be, ger ku nirxê gel wisa bê xistin li wir netewetî diqede.

Mijareke din ji mijara bazirganiyê ye. Ger ronakbîrek bî, ji bo pêşxistina pêwendiyên bi gel ve dikare te bikire. Ma tu dîplomatî, ma ziman dizanî?  Bi DYE’ê ve,  ji bo avakirina têkiliyên bi dewletên din re te dikire. Mijara din êku ez li dijî vê derdikevim mijara jinê ye. Hevalê min ê ku min qala wê kir jê re vê got: te çima ji bo çend jin û zarok partî binpê kir? Min jê re, got birûne. Yanî ma nepêkane ku tiştên wisa di nava partiyê de pêşbikeve? Min jê xebatek siyasî dixwast, min dixwas bibe netewî. Êdî mala me hemû welat e, gelê kurd malbata me ye. Yek jî me partî ava kiriye. Ji wê

xebateke partî, xebatên rexistinbûnê dixwazin. Ew çûye bi çend meseleyên zarokan ve mijûl dibe. Me heval kişand û derxist, lê belê jin bi malbata xwe ve çûn dijmin. Dijmin, digot; “bila bê em ê jê re avahî çêkin.” Min jê re name nivîsand got; ‘Tu nikarî ew qasê xirab bî. Min jê re got; “Ji bo jinek mirov nikare wisa bike, berde.”

Ji jinê re rêz nîşan bide, lê belê wê neçarî tiştên ji dorhêl xirab bike dûr bikevî. Xwe di xebatên rêxistibûn û siyasiyê de bihêz bike, lê xwe bernede. Divê ne ji bo malbat, jin, zarok, ji bo partî kar bikî Mezinbûna wê heye, ev mezinbûna PKK’ê ye. Endamtiya PKK’ê giring e. Ji malbat, êl û ji zarok pêş tê. Ger ku di PKK’ê de bêjî ‘zarok, kur, jin û malbata min’ wê demî serkeftin nabe. Ev xal girîng e. Di civaka kurdistanê de ev pir in. Bingehê Rêbertiya min ev e.

Divê xelet neyê fêmkirin malbat zarok û têkiliyên zayendî mandel(înkar) nakim. Mesele têgihîştina bîrdoziyê ye. Bîrdozî pir girîng e. Ma bîrdoziya Barzanî çi bû? têgihîştina bîrdoziya Barzanî pir girîng e. Min li vir jî ji hevalan re, got; dikarin biçin bizewicin. Ma niha ev bîrdoziyê dikuje? Piştê kuştina bîrdoziya Barzanî, kî çi dike bila bike, çawa dizewice bila bizewice, çawa hes dike bila hes bike. Şêwazê min wisa ye. Ji bo malbat, zarok û jina xwe tu yê nikarî bi parti bilêyîzî. Lewra di vê xale de hatiye windakirin. Malbatgeriya Barzanî bîrdoziya barzanî bû sedama parçebûna gelê Kurd. Xayîn bûn û nebûna wê ji bo me ne girîng e. Astengbûn û nebûna wê ji bo me ferq nake. Îxaneta wî ji bo me pir girîng nîne. Serokê êlekê(kabile) ya sî, çil, heta beriya sedsalan ji xwe re rêber kiriye. Ma bi vê re dewletbûn û pêkanîna rizgariya neteweyî pêkan e? Na. Di xwe de raman û hîzra dewletbûnê tine ye, ramanê êl û ol jî, ti tişt nîne. Yek tişt difikire çiqas malbata xwe fireh bike ye. Dibêje her tişt ji bo min. Malbata wê çiqas mezin bibe ew qas Rêbertî dike.

Ji ber vê jî ez di PKK’ê de li dijî vê derketim. Lewma ev bîrdozî vê dixwaze. Di Kurdan de ev zal e (hakimdir). Ne tenê di Barzanî de, ev taybetmendiya karekterî civaka Kurd e. Bi giştî ev tinê di nav we de derneketiye. Di nav me de tiştên bi vî rengî çêbûye. Ev mijar pir girîng e û yek ji pirsgirêkên bingehîn ên ku pêwîste bê çareserkirin e. Ger ku me pêşî negirtiba em ê şepirze bûbûna. Lewma li ser vê pir radiwestim. Ev li ser me jî derbas bû. Ji bo me bikişinin têkoşinê têkilî ava kir. Lê belê me ji bo ku têkiliya wê bi dewletê ve heye bi baldarî tevgeriyan. Li vir xaleke din heye. Ger ku min ê malbat û jin bingeh bigirta wê xebata min a siyasî bisekinîba. Ji min, xistina mesele û doza netewî ya Kurd, wê reşkirina hevalên min bê xwestin. Wê ji min û malbata min hêdî hêdî xistina bin xizmeta dijmin bê xwastin. Dê ji min hêdî hêdî ji jintiya wê re girêdanbûn bê xwestin ango tê xwestin. Malbata xwe bilind bike wê hevalên min bixe. Wê partî bixe û paşve bide. Wê weke berê Kurdistan cardin radestî dijmin bike. Rizgariya Kurdistanê, tenê bi girêdanbûna kesayet a bi welat re dibe. Bi tişteke cuda re nabe. Heskirina herî mezin heskirina welat e. Zêdekirina jin, mêr û zarokê kurd zêdekirina hêjmarê kole ye. Lewra gelê Kurd kole ye. Dema ku hêjmar zêde dikin, hêjmara koleyan zêde dikin. Divê girêdanbûn ji welat û rizgariya welat re bibe. Piştî rizgariya welat dikarin her tişt çareser bikin. Evîna rastî ji bo azadkirina van koleyan evîna welat e.

Bê guman, rast e Mamosta. Dev ji barzanî berdin ev di nav PKK’ê de jî pirsgirêkeke giran e. Min nêrî her kes weke jiyana berê jiyanek dixweze. Keç û xortan ji bo kêliyek kêfiyeta xwe ketina partî dixwazin. Mînak min meseleya hevalê me vekir. Ji bo jineke welat, partî, meseleyî şer çû. Dev ji meseleya van hevalan berdin xwestin min jî bînin vê rewşê. Min nêrî, Fatma bi kîneke mezin ve li dijî partî derdikeve. Ji têkiliyên partiyê re bêmafêyên mezin dike. Misogere ne Kurdistanê tim takekesiyê derdixe pêş. Hama yekser

min got ev ne serkeftina me, neserkeftina me ye. Dixwest min jî bi xwe ve bide girêdan. Bê guman me jî bergiriya(tedbir) xwe wergirt, min her roj hesab kir. Ev jin çi ye? Bi malbatê re têkiliya wê çi ye? Têkiliya vê malbatê bi dewletê re çi ye? Encamê ku ez gihiştim ew bû: ger ku ez zilamti û mêriktiya berî ya Kurd di xwe de nekujim, zilamtiya klasik nekujim nikarim PKK’ê bi rê ve bibim. Meşandina Kurdîtiyê ne gengaz e. Min li dijî jinê pêwîstiya bihêzkirina PKK’ê dît. Bêyî şkandina zagonên kevn ên jinê ne partî ne jî Kurdîtî dibe.

Vaye Barzanîparêzî ew e: Dîsa em dev ji Barzanî berdin hevalekê me, birayê min jî dixwaze tiştên wisa bike. Hevalê ku min qala wê kirî di 1980’î de vê kir, birayê min jî di 1990’î de dixweze tiştên wisa bike. Min nêrî partî ji dest diçe. Hevalti û biratiya min fêm nake. Ya rast, min got min serhildana xwe li hemberî bav, bira, malbatê da destpêkirin. Ji bo xwe dibêje “ez di nava şer de mam, her kes navê min bihîstiye û mezin bûme.” Ji bo min jî dibêje; “ew di rewşeke nefes negirtinê û zorê de ye. Çû, ket bin venêrîna Barzanî. Ez jê re dibêjim: “li gel Telabanî yî. Pêwîste nirxê vê bê zanîn. Pêşxistina hin rêkeftinan, pêwîstî bi xurtkirina têkiliyan heye.’ Lê belê ew dixweze bi Barzaniyê re rêkeftin pêş bixe. Barzanî jî dixwaze li ser wê bilêze. Dema ku em hişyar jî dikin dibêje; “çima tu nexwazî ez xwe mezin bikim?” Di me de derxistina bîryarê ku rê ji zewacê re vebike, dixwaze zagonê kurdîtiya kevn bisepîne. Barzanî dixwazê vê bixapîne, li gorê xwe kesayetiya xwe pir bihêz didît.

Bê guman em ser sekinin. Barzanî li ser vê dibêje: “Li cihanê tiştekê wisa nehatiye dîtin; Apo dixwaze birayê xwe bikuje.” Bê guman tişteke wisa tine ye. Em tenê li ser mijarên partî radiwestin,hewl didin netewbûnê xort bikin. Ew jî têkiliyên feodal, têkiliyên malbatê disepîne. Ji yekê re dibêje: “Were em bi hev ve birevin.” Me yekser vê dahûrand.  Me got; ev Kurdê kevn e. Her tişt

derket holê. Bi kurdê kevin re di navbera me de cudabûn ew bû: dema ku me rêxistin dikir me têkiliyên xwe bi keç û xortên malbatên ku dijminê hevûdu bûn re saz kir. Me xwe wisa mezin kir. Di encam de disa em fêm nekirin.

Dema ku birayê min wisa kir, min jê re got ‘biratî û hevaltiya te dîtinê civaka kevn e û min got di PKK’ê de metirsiya(tehlike) herî mezin ev e. Min got besbûna zar û zêc, zarokek wisa weke bacanê sor di erdekê şorax de(çorak arazî) digihêje bibe. Hûn dizanin, dendikê bacanê sor ê ku di erdekî şorax de digihêje pir dibe. Weke ku mamoste jî got ev zêdebûna kole ye. Nirxê kole tine ye, jin rêka ku diçe îxanetê ye. Hevalê Alî Heydar pir dirûst e. Tiştekê ku tanî ziman hebû: “Hz Îsa, ger ku tu ji Îsa hez bikî, divê tu dev ji hezkirina jinê berdî.” Niha me di PKK’ê de bûyera hezkirinê pêşxist. Di PKK’ê de hezkirin mezinbûn e, bi siyasetê ve mezinbûn e; şêwazê mezinbûna Barzanî ya êl û klan nîne; bi lehengiyê ve mezinbûn e, bi netewbûn û welatparêzêye ve, bi evîna gel ve mezinbûn e. Ger ku kesek di xizmeta gel û welatê xwe de be, nirxê wê dibe û partî jî jê re nirx bide.

Lewma min got çemka(anlayış) heskirina kevn çemka zilamtî çemka mezinbûnê bê derbaskirine. Jixwe piştî pêkhatina vê bûyera heskirina mezin metirsî bê derbaskirin. Wê demê tu bibî welatparêz, general û heya dawî dikarî leşkerê xwe hes bikî; bibî êgîd heya dawî bi partiyê re bibî. Di vê de êlparêzê, ahbap û çawîş, herêmparêzî tine ye; neteweyîtî heye. Di partiyê de êlparêzî û herêmparêzî nabe. Di partiyê de gel, netew, mirovayetî heye. Yek jî di şer de lehengbûn heye. Dema ku te kurdîtiyeke wisa afirand, dikarî Kurdistan rizgar bikî. Dema ku tu rastî kir zal(hakim) kî çi dibêje bila bêje çi dike bila bike wê êdî bi rastiyan re bimeşe. Dema ku te ev çar babetê girîng pêkanî wê serkeftin bixwe bê.

Barzanî çima li dijî me şer dike? Heta çima di nav partiyê de têkoşineke wisa heye? Ev têkoşina civaka nû a bi civaka kevn re ye, wate şerê çînî ye. Em ê hewl bidin civak nû bikin û kesayetên nû biafirîn in. Di PKK’ê de di vê hêlê de avêtina hin gavan misoger e. Serkeftina Rêbertî û endamtiya PKK’ ê girêdayê vê hêjmartinên min e. Naxwe çend kes ji me re piştgirî dide, diravê(para) me çi qas e, çekê me çi qas e, vana ne girîng in. Çiqasbûna têkiliyên me jî ne girîng e. Ya girîng Rêbertî ye; ew jî dema ku derket holê vana çareser bibe.

Havar: Serokê min hin pirsên min hene. Vana ne pirsên min in, pirsên gel in.

Abdullah Ocalan: Berî ku em derbasê pirsan bibin, gelo Mamoste Îbrahîm ji bo piştî 1975’an dikare çend tişta bêje? We Qala YNK’ê kir. Ez bawerim ev pêvajoyekê nû ye. Pêvajoyeke xwedî aliyeke netewe, gelparêz û siyasî ye. Rêbertiya YNK’ê di pêvajoyekê pir teng de derdikeve holê. Aliyek DYE’ê, aliyek Sovyetan, aliyek Îran û yên din. Vaye di pêvajoyekê wisa de derdikeve holê. Rêbertiya YNK’ê ne rêbertiyeke feodal û olê ye. Di nav de welatparêzî heye, sosyalîzm û netewbûn heye. Di nav de demokrasî jî heye. Lê belê qada tevgerê teng e. Barzanî YNK’ê bi herêma Soran re mehkûm û darazxwar kiriye. Di aliyekê de pergala Îranê di aliyeke din de jî komûnîstan heye. Li vir rojane meşandina taktîkê dijwar e.

Ger ku mirov Mamoste û tevgera Mam Celal nasneke dikare biçe nirxandinên pir xelet. Çima wisa hat tevgerandin? Tê fêmkirin, derfetên objektîf dest nade, heya pileyekî (derece)neçare wisa tevbigere, lê belê piştî pileyekê tengbûn çêdibe. Li vir tiştek kirin xwezayî ye. Dema ku pir tengav bûne xwestine derbasê Kurdistana Bakur û Rojhilat bibin. Lê belê derfetê wan tine ye. Weke mînak

Elî Esker ew li Qilabanê tên qetilkirin. Baş e ma ev welatparêzî ye? Hatina wan a Behdînanê ji bo netewbûna Kurd bi armanca kirina berxwedaniyên mezin bû, armancekê wî ya cuda nebû. Rastî ev e. Dema ku axa Îranê bûne ji bo Kurdan tiştên baş xwestin, lê belê li wir ji we re destûr nedan. Hatin Behdînan hatin lêdan. Çûn Îranê mehkum bûn.

Ew derdikeve hole: Rêbertiya YNK’ê nedikarî yekîtiya Bakur û Başur ava bike. Ger ku şoreşa Bakur nebe hûn nikarin tiştek bikin. Çiqas baş û rast bikî jî li Başur bi tena serê xwe nikarin tiştekî bikin. Hûn van ji min baştir dizanin. Ev rastiyeke û pêwîste bi berfirehî li ser vê bê rawestandin. Ger ku li Bakurê Kurdistanê şoreş bostek pêş bikeve, li Başur pênc bost pêş dikeve. Ger ku Bakur şoreş serkeftî bibe, hûn dewletin ango heya dawî serkeftin heye. Vana nêrinên rast in. Êdî li kurdistanê têkiliyan rêkeftinan pêşdikeve. Bêgûman hin rexneyan jî dibe. Ger ku rexne, pirs û nakokî nebe pêşketin jî nabe.

Kesayetiya kurd nû tê avakirin. Netewbûn demokrasiya kurd nû tê avakirin. Ev xalên girîng in. Ez ji peyvên biratiyê zexm(pek) heznakim. Her tişt bi biratiyê ve nayê çareserkirin. Di yekîtî û têkoşinê de jî rêkeftin û şer jî heye. Kî di kîjan pevajoyê de dostînî saz bike, di kîjan pêvajoyê de şer bike divê vê baş bizane. Divê em li ser aliyê welatparêziyê baş rawestin. Divê ji pirsgirêkê re bi çavê şerê birakujî ve neyê mêzandin. Carna heya dawiyê rêkeftin saz dibe, carna jî rêkeftin sazkirin zirar dide. Li gorê berjewendiyên gel binirxîne. Carna rêkeftin me hemûyan û gelê Kurd bihêz dike. Carna jî weke rêkeftinên ku Barzanî bi dewletin din re dike gelê kurd dixe. Divê ew neyê gotin: di Kurdan de heya dawiyê biratî bibe! Na wisa nabe. Zilam, dibêje; “beriya malbata min hûn bimirin”. Dibêje ez û malbata min, tiştekê cuda nabêje.

Erkekê din a kongreya neteweyî jî kêmkirin cudabûnên bîrdoziyê ye. Divê têkiliyên bi dewletan re li gorî berjewendiyên gel be. Tu berjewendiyên xwe çi bikî? Ger têkiliyan li gorê berjewendiyên gel be rast e. Em li vir neteweya Kurd diafirînin. Wê demê her tişt li gorî berjewendiya wê bibe. Ev têkiliyan bi tenê ne sûdê gelê Kurd e, divê bibe sûda hemû gelan. Têkiliyan pêş dixin; ev têkilî dikeve xizmet û sûda gelê Kurd. Ev jî meşandina kongreya neteweyî ye. Kongreya neteweyî divê li ser çi raweste?

Li ser stratejiya Kurdistanê raweste. Dîroka kurdistanê, li ser dîroka netewî rawest e. Ne li ser dîroka caşîtî, axatî, êltî meletî, wê li ser dîroka gelekî rawest e. Mele derketiye, ferman derketiye axa derketiye, lê belê ramanên wan pir teng e. Her yek ji wan li parçeyekî derketiye, nekarîne bibin netew.

Hê jî dîroka gelê Kurd ava nebûye, nû nû ava dibe. Kongreya neteweyî wê berjewendiyên gelê kurd daxuya bike û biparêze. Berê wî li Kurdistanê begtî, emîrtî ava bûye, lê belê dîroka me ava nebû ye. Ramanên me çima ne teng e? Ji ber ku her kes xwe weke navendî Kurdistanê dibîne. Kurdistana ku hatiye çar parçekirin û navendin cuda cuda li pêşiya netewbûnê astengî ye. Weke gelek, canek, qewimînek e. Ji vê qewimînê re mejiyek pêwîst e. Niha ti kes nikare Kurdan mandel(înkar) bike. Gelekî heye, lê belê mejiyê wan, wate navendekê wan ê ku wan bi rê ve bibe nîn e. Ango weke hin zarokên pir rûgirtî (şimarik) bibin her yekî wan dengek derbixe.

Bi hev re karkirina me, ji bo avakirina Kongreya Neteweyî ye. Wate weke mêjûyê Kurdan bibe. Berjewediyê vê gelê li cihanê û li derve çiye? Berjewendiyên gelê Kurd û sûdê wê ya ji cihanê re çi ye? Ev pirsgirêkek stratejik e. Bi tenî bi daxwiyakirina stratejiyê ve zelal dibe. Stratejî meseleyekê neteweyî ye. Naxwe ne mesele-

yekê hêzeke leşkerî û siyasî ye. Li kongreyê biryar derxin ango biryar bikin. Civata Kurd ango bi navê din ve yekîtiya netewa kurd bivê biçûk bivê mezin divê bigihêje biryarên di cih de û serbixwe. Wê biryarên ku bê wergirtin bibe biryarên gelê Kurd. Ê ku li dijî vê biryarê derbikeve, dijminê netewa gelê Kurd e. Divê yên ku dost in li gorê berjewendiyên gelê Kurd tevbigerin. Wê kongreya xwe bigihêne biryaran û van biryaran derbasê jiyanê bike. Xistin û nexistina biryaran a jiyanê venêrin bike. Piştî sê meh di ser biryaran re derbas bû, wê dest bi civînan bikin.

Kongre ji bo netewa Kurd, ji bo biryarên neteweyî xistina van biryaran a jiyanê pêwîstî bi hêzeke leşkerî heye. Wê li vê derê her kes biryar bigire. Ti kes nebêje ez Rêber im. Ger ku her kes bêje ez Rêber im yekîtî nabe, ji bo wergirtina biryarê piştgirî nabe, yekparetiya neteweyî pêş nakeve û tevger nameşe; ev jî ji gel re zirar bide. Wê demê êltî, herêmtî, kesayetên dijmin xort bibe, ev jî wê ji dijmin re sûd pêş bixe. Encam dûbarebûna her tiştê ya jidestçûyînê ye. Bi vê sedemê ve ez dibêjim ku, pêwîst e ev yekîtiyê hemû Kurdistanê, heta heya belavê, gundan jî bikin. Divê ji bo ku her kes li gorî xwe tevnegere pêwîstî bi hêzeke leşkerî heye. Piştê wergirtina van bergiriyan(önlem) têkoşina neteweyî bigihêje serkeftinê. Mirovên me yên çar parçayan jî di nava vê de cih bigire û xwe bigihîne yekîtiya neteweyî. Bi vê rengî pêşiya nebesiyên ku heya niha derketine jî bê girtin.

Mamoste hûn van karan hîn baştir dizanin. Hawar jî dizane. Ev daxwaziya we ye jî. Hûn di vê mijarê de çi dibêjin?

Civîneke wisa(kongreya neteweyî) pir rast û girîng e. Him kirina nûnertiya gelê Kurd, lewra dengê wê ji derve re dane bihîstin, têkiliyên gelê Kurd a bi derve re pêşxistin, pêşxistina tiştên ku bikeve xizmeta rizgariya neteweya Kurd; him jî ji bo li dijî tiştên

ku li dijî berjewendiyên Gelê Kurd disekine, ketî û nediyar e di nav welat de jî pêwîstî bi nûnertîkirina gelê Kurd heye. Kongreyek, partiyên kurd a wisa, di nav rêxistinan de navbeyînkarî kirin, nêrînên xwe nêzî hev kirin, têkilî avakirin, di hêla çareserkirina pirgirêkan de girîng e. Divê nûnertiya neteweya gelê Kurd him li hundir him jî li derve de bike. Pêwîste ristên xwe yên stratejîk bileyîzin. Divê ji bo Kurdan bibe hêzeke otorîter. Li gorî berjewendî û sûdê gelê Kurd, pêwîstî bi parastina meşandina biryarên ku werdigirin heye. Divê her tim xwediyê biryarên xwe derbikevin. Yek jî kêmasiyên girîng ê ku min dîtiye ji 1940'î û vir ve bêparmayîna gelê Kurd ji avabûneke wisa ye. Niha dema wî hatiye, pêwîste em bilêzginî li ser bisekîn in.

Di 1940'an de avanekirina kongreyekî wisa ji bo tevgera neteweya Kurd kemasiyeke mezin e.

Dijminên gelê Kurd di 1937'an de dema ku di navbera xwe de hevpeyman dikirin, diviyabû Kurdan jî tişteke wisa bifikirîbana, rêxistin, tevger, êl, serokên kurd bi kombûnê ve li dijî vê rêkeftinên dijmin rêkeftinek avabikirana.

Belê, ev nebesiyeke mezin e, lê belê niha jî bûyîna tişteke wisa nikarin bêjin.

Hewceye gelek lez bikin.

Ez nêrînê Rêbertî ji sedî sed parve dikim. Ev nerîna wî sedî sed di cih de ye. Niha ya bê kirin, ger di navbera wan de nakokî û nerînên cuda bibe jî, çi qas kesayet û partî hebe hatina wan a kongreya neteweyî  ye. Divê mirovên welatparêz jî di nav de cih bigirin. Divê tu kesî binpê nekin. Divê em jî ji tu kesî re îxanet nekin. Erkekê vê kongereyê jî cudabûnên bîrdozî kêm kirin û nêzî hev

bûyîne. Divê wan bîne li gel hevûdu û ji nakokiyên di navbera xwe de çareserî bînin.

Ger ku armanc azadî be û ger ji bo gihiştinê taktîk ev be, wê demê divê hemû partî, kesayetên li pêş tên, heta hemû welatparêz û êl tevlî vê bibin. Divê di derbarên xwe de bibin xwedî biryar dayînê. Bêyî civatê ti kes ji me re nirxek nade. Bêyî civatê ne pêkane ku bi çavên mezin li me binêrin. Ev kêmasî pirsgirêkên rastî yên Kurdan e. Jixwe gelek kes dixwazin gaveke bivî rengî bê avêtin. Lê belê hin kes jî dibêjin şerê PKK’ê bi Barzanî re heye. Ev ne rast e. Gelek car min got, ger hûn dixwazin di navbera kurdan de şer bê rawestandin, wê demê kongreya neteweyî ava bikin. Lewra ev şer şerê PKK’ê bi Barzanî re nîne,

Şerê hemû Kurdan e. Şerê YNK’ê ye, şerê Başûr, PDK’e, Îran û şerê Bakur e.

Biryara kongreya neteweyî bigire, ger di vê alî de be ez ê piştgirî bidim. Bila Barzanî li ser biryar bigire. “Barzanî bi faşîzma Tirk ve çi dikî? Bila bêje têkiliyên te yên bi faşîzma Tirk re ne sûda gelê Kurd e” û Barzanî jî vê bipejirîne. Wê demê em çima şer nedin sekinandin? Ger ku di derbarê kongreyê de biryar bê girtin û ger ku ji min re bêje “Apo, divê karê te wisa bimeşe, şer bide sekinandin, ji Kurdên Başûr re wisa nêz be” ez dikarim tavilê vê bipejirinim. Ger ku ji min ketina xizmeta federasyona Başur bê xwestin, ez dikarim bi xwestekeke mezin ve xizmet bikim. Ger ku biryarên wisa bê girtin ne pêkane ku Kurdên Başur bibin dostê faşîzma Tirk.

Bira hewcedarê bira ye. Ma gelo pêkane ku genarelekê faşîzt a Tirk were li Başur li dijî dijminên Kurd şer bike? Jixwe ew dijminê gelê kurd in. Li dijî Kurd şer dikin, şerê taybet dimeşinin. Destûr nadin ku Kurd di bin serweriya wan de derbikevin. Bi wan re têkiliyan danîn ne dostanî û rêkeftin, dijmintiye. Netewbûn li dijî

vêbûn dibe û ji vê re destûr nayê dayîn. A rastî ev ne şerê bira ye, şerê Kurdan bi dagirkeriyê re ye. Nexwa li dijî Kurd di şer de gavek jî avêtin ne pêkan e. Ne pêkane ku canê kurdekê jî biêşinin. Ma hûn çima Barzanî neçarî kongreya neteweyî nakin? Avabûna kongreya neteweyî, federasyona Kurdan naxweze. Tim dibêje malbata me, li pêy berjewendiyên êl e. Çemkê wî ya êl çemka sî-çil hezar sal berê ye.

Divê ev xebat bigihêjin serkeftinê. Em ji bo Barzaniyekî nikarin sî-çil milyon Kurd feda bikin. Ma ji bo çil milyon mirov, neçûyîna biryarê pêkan e? Ger biryar neyên girtin berpirsê wî Barzanî ye. Sekinandina şer jî girêdayî vê ye. Ez dixwazim hemû Kurd tevlî vê bibin. Min berê jî da diyarkirin. Min ji kemal Bûrkay re jî got; “ger tu dixwezî şer bisekinînî rêka vê kongreya neteweyî ye. Kongreya neteweyî bicivîn in, di nav du rojan de şer bidim sekinandin’ ez ji her biryarên ku kongreya netewî ya Kurd di derbarê min de bigire amademe. Divê ji bo Barzanî û Talabanî jî çi bê gotin hemû amade bin. Ê ku ji vê re ne amade ye kî ye? Yê ku napejirînin, yên dijminê vîna gelê Kurd in. Tu kes nikare vîna gel mandel (inkar) bike. Min got,ji dadê û mafê re were. Kî ji xebatên kongreya neteweyî û ji yekîtiya Kurdan direve? Ger ku biryarên Kurdan pêktînin bila enî, parlemanto, federasyon ava bikin. Heya dawî derfetên vê heye. Nekêm (tam)dema wî ye û ev neçari ye.

Di 1992’an de ez û birayê xwe Hawar axivîn, me got divê kongreya neteweyî bê kirin. Lê belê partiyên Kurd, kesayetên li pêş tên nehatin gel hevdu, nekarîn yekîtiyeke ava bikin. Nerîna birayê min Apo jî di 1992’an de bi rêka Talabanî fêr bûn. Me nerînên we yên di derbarê kongreya neteweyî de wê demê fêr bûn. Me ji Mam Celal pirsî û got; “Nerînekê me ya wisa heye. Gelo PKK tevlî vê biryarê dibe an nabe?”Mam Celal got û bersiv da; “Ji sedî sed wê tevlî bibin. Jixwe ev biryar biryara PKK’ê ye. Ger em nekin jî wê

PKK’e bike. Ez dibînim, PKK’e ji me zêdetir ji bo vê kar dike. Niha berdewama vê dixwazim. Ev pir girîng e û lezgîn e. Kongreya neteweyî, ji pêvajoyekê nebe nabe re derbas dibe. Di xebatên PKK’ê de serkeftinê dixwazim.

Sosyalîzma ku em didin çêkirin, sosyalîzma zanistî ye.

-Mamosta mercên cîhanê jî ji vê re guncav in. Berê nebaş bû.

-Helbet, berê mercên cîhanê ne guncav bûn. Niha ku pir guncav e û em vê gavê navêjin, em ê li hember gelê Kurd suç bikin.

-Hem mercên li nava Kurdistanê, hem jî mercên cîhanê ji tiştekî wiha re neçariyê ferz dike. Ger ev gav neyê avêtin, dê bibe kêmasiyekî pir mezin. Berê me dikarî bêjî dibe ku ji vê gavê re destûr nayê dayîn. Lê niha heta dawiyê derfet hene. Îro bi hezaran rewşenbîr, akademîsyen, welatparêz, yanî bi giştî Kurdewarî êdî ji bo gaveke wiha derbasî tevgerê bûye û demê wê ye. Wê demê çima em dereng bidin xistin? Em nêrîna Mamosta parvedikin. Mamosta dibêje; “Pêwîst e ji 1940’î û vir ve me ev gav bavêtiya.” Ger tevgera Kurd ji 1940’î ve negihîştibe serkeftinê, ji ber ne avakirina vê stratejiyê ye. Her kesî got taktîk e, lê di taktîkê de ketin ji rê derketinê. Ji ber ku taktîkên wan ne li gor stratejiyê bûn. Dema ku ev nebû, dijmintî bi hêz bû û di encam de gihîşt roja îro.

Nîqaşên me yên li ser Tevgera Neteweya Kurd, Kongreya Neteweye, rêbertiya Barzanî û li ser Rêbertiya min bes in. Niha em dikarin bigihîjin encamekê. Tevgera Kurdistana Başur dixwaze gavekê bavêje. Li Bakur jî di 1920’î de ji Koçgirî dest pê dike, heta 1940’î dixwastin gavan bavêjin. Lê belê ev ya gavên klasîk bûn. Çawa ku yên radibin raperînê di her tevgera klasîk de dikevin, ew jî ketin. Di Kurdistana Îranê de di salên 1975’an de xwestin gavê

bavêjin, nebû. Bi navê PDK’ê xebat hatin kirin. Sekreterê yekem (sereta) Mamosta bû. Qasî ku dixwazî welatparêz, demokratîk, heta çêkerekî mirovahiyê bingeh gir bû. Xwest gav bavêje, lê belê ya ku di kesayetiya Barzanî de şênber bûyî –ez nabêjim neteweperest jî-ji ber sedemên hizrên pir paşketî ev firsend negihîşt serkeftinê.

Tevê ku dema hat salên 1975’an bi sed hezaran pêşmergên wî, pereyên wî yên bi mîlyonan dolar, bi sed hezaran çekên wî heyî, ji ber ku Şahê îranê xwestiye, Barzanî bi destê xwe tasfiye bû. Di encamê de wiha şoreşa klasîk a dawî jî rûxiya û YNK çêbû. Şertên wê pir bi teng be jî, xwest hinek tiştan bike. Ji aliyekê ve rejîma Iraqê di bin rêveberiya Saddam de bi hêz dibe, li aliyê din jî Rejîma Îslamî ya Îranê pir zêde derfet neda. Alî Asker û hevalên wî xwestin li ser Colemêrgê re derbazî Behdînanê bibin û têkoşînê bikin. Lê belê ji aliyê PDK’ê ve hatin şehîdkirin. Ew şehîdên Kurdistanê ne.

Kesê ku vî şerê dawî daye meşandin dîsa Samî Abdurahman e. Samî Abdurahman, ya ku di salên 1975’an de li serê Alî Askeran aniye, niha dixwaze bîne serê me. Dixwaze me jî di Colemêrgê de bixeniqîne. Jixwe ev şer hîn berdewam dike û bi giştî şerekî Kurdistanî ye. Ev ne şerê du hêzan e. Hûn Alî Asker û hevalên wî baş dinasin. Li aliyekê yên welatparêz in, li aliyê din ji aliyê eşîreta Barzanî û helîkopterên Tirk ve wan dorpêç dikin û îmha dikin. Li hember van welatparêzan şerê ‘nebirakujî ye’ îxanet e. Dîsa nikarin bêjin ku şerê li hember YNK’ê bûyî jî ‘birakujî ye’. Li aliyekê tevgerekî welatparêz, demokratîk û yên ku dixwazin tiştekî bikin, li aliyê din jî yên ku firsendê ji vê re nadin û Barzaniyê ku ji vê re rê nade! Pêwîst e mirov ji vê re nebêje; “birakujî”. Şerê me û PDK’ê ne şerê birakujiyê ye.

Ji bo ku federasyon bê çêkirin derfet li hûndir û ji derveyî Kurdistanê hene. Di tevayî parçeyên Kurdistanê de derfetên gavên

dîrokî avêtin hene, ne weke berê ye. Şoreşa ku em li Bakur didin pêşxistin firsendeke. Barzanî dibêje; “bila federasyonekî demokratîk çênebe”, dîsa dibêje; “berjewendiyên Barzanî.” Dibêje; “Bila her kes di xizmeta me de bin”. Tirkiyê jî wê dixwaze. Dibêje; “Bila li Başur jî federasyona gel çênebe.” Dibêje; “PKK’e ya ku şoreşa bi îtîfaqan li Bakur bide çêkirin bila bilind nebe.” Barzanî jî ji vê re dibêje; “temam.” Li gorî ku di van demên dawî de nûçeyên em digirin de, Barzanî ji Tirkiyê 48 panzêr kirîne. Her wiha ev şer ne şerê Kurdaye, şerekî bi faşîzma Tirkan re tê kirine. Aliyekê vî şerê faşîzma Tirk û Barzanî ne, aliyên din jî welatparêz in. Pêwîst nake ku mirov zêde li ser bisekine.

Netenê ji bo vî şerî, ji bo pirsgirêkên Kurdan giştî, pêwîst e gavekî wiha bê avêtin. Ev gav gavekî netewî ye û li ser partiyan re ye. Ji giştî stratejiyên partiyan bilindtir e. Gava Kongreya Netewî, tê wateya gava stratejî ya neteweyî. Heta niha gelek partî bi serê xwe tenê man û zerar dîtin. Ger neyên yêkîtiyê dê darbeyên hîn mezintirîn jî bigirin. Ger Barzanî jî neyê biryarên Kongreya Netewî ez bawerim ku dê darbeyan bixwe. Ji bo gavekî wiha bê avêtin, dem pir guncav e. Sê çar dewlet jî çêbûna gavekî wiha ji niha ve dipejirînin. Pêdiviya gelê Kurd ji çêbûnekî wiha re heye. Gelê Kurd bi şoreşê rabûye li ser lingan. Bi mîlyonan Kurd, ji bo Kongreya Neteweyî amadeye ku raya xwe bide. Ji ber van sedeman kes nikare bêje ku şert û merc nedestdayî ye.

Mantiqê “şer bisekinînin, li hev werin, piştre em kongreyê çêbikin” ne rast e. Giştî pirsgirêkên heyî, astengî, nakokî di Kongreya Netewî de wê bên çareserkirin. Kongreya Netewî ji bo çareserkirina van e. Ez jî tevlî banga Mamoste dibim. Ew bixwe jî ji bo Kurdîtiyê ji salên mêj ve kedê dide. A niha em hatin li gel hev. Ji bo gelê Kurd ev pevrebûna me gavekî girîng e. Ez bawer dikim ku

li ser vê em ê Kongreya Netewî biafirînin. Di encamê de cihê me tevayî Kongreya Netewî ye.

-Ji Kongreya Netewî hêviya min a mezin heye.

-Em bi hatina Mamoste gelek kêfxweş bûn. Mamoste wek ciwanekî di hijdeh saliyê de ye. Ez vê kêfxweşiyê di Mamosta Hawar de jî dibînim. Ev jî giyanekî netewî ye, giyanekî şoreşgerî ye. Ez ji ber vê sedemê nirxek mezin didim hatina we û ez pir spas ji we re dikim.

Hawar: Hinek xeta partiya we û bûyîna we ya Marksîst rexne dikin. Bi taybetî dewletên berjiwendiyên wan di vê herêmê (Rojhilata Navîn) de heyî, dibêjin; "partiyekî Marksîst e" rexne dikin. Ev dewletan her tim (dem) û bi her awayê rêbazan li hember dewlet û partiyên Marksîst şer dikin. Hûn li hember van rexneyan helwest û bersivên we çi ne?

Abdullah Ocalan: Ya ku di PKK'ê de pêk tê Marksîzma zanistiye. Sosyalîzma li Sowyetan pêkhatiye ne girêdayî wê pêşket. Sosyalîzma ku em didin çêkirin, sosyalîzma zanistiye. Em ji vê sosyalîzmê çi fêmdikin? Wekî zanistî civak di vê sosyalîzmê de çawa tê pênasekirin? Zanistî, li ser civakê çi dibêje? Me ev daxistin xweseriya Kurdistanê. Em wekî zanistî li ser dîrok û şoreşa Kurdistanê sekinîn. Fereseta sosyalîzma me ev e. Ger meyzandinekî zanistî nebe, ne gengaze ku dîrokê binasî, civakê dahûrîn bikî, pêşketinê bidî çêkirin. Sosyalîzma zanistî em ronî kirin, rê nîşanî me da. Ji me re got, hûnê dîroka xwe wiha binasin, hûnê pêşketinê wiha bidin pêkanîn. Ji bo me hinek dibêjin, PKK Marksîst-Lenînîst e. Dibêjin, Stalînîst e û Maoyî ye. Çi dibêjin bila bibêjin, taybetmendiya girîng ev e: Di şert û mercên roja me de zanistî nebe tu ti tiştekî nasnakî. Em îro di civakê de her tiştî bi zanistî rêve dibin û em wiha pêşdikevin. Polîtîkayekî zanistî nebe, di Kurdistanê de pêşketin

nabe. Bi taybetî şert û mercên di roja me de ev qet ne gengaz e. Ya ku em îro dimeşînin sosyalîzma zanistiye. Me kesayetiya Kurd û civaka Kurd vekir. Me nêrîna ji Kurd û Kurdistanê re hem jî bi awayekî zanistî sererastkir. Di encamê de ev PKK avabû. Ev nêrîn di vê derê de zanistiye ku derdikeve holê. Dîsa rast e. Çima rast e? Ji ber ku zanistiyê. Em çawa dikarin zanistiyê mandêl (înkar) bikin. Ger em zanistiyê mandêl bikin, em nagihîjin serkeftinê. Ji ber van sedeman wê dewletê vê gotiye, vê dewletê vêya gotiye, negirîng e.

Berê Partiya Komûnîst a Tirkiyê ji me re, digotin; "Netewperestên Kurd." Gelek dewletên Ewrûpayê ji me re, digotin; "Komûnîstên ortodoks." Hinekan ji me re digotin; "Olperest." Herkes tiştekî dibêjin. Ev zêde negirîng in. Me xwe nespart van nêrînan û kar nekir. Em heta niha bi zanistî dimeşin. Em him zanistîne him jî netewîne. Ji ber ku şert û mercên Kurdistanê vê dixwazin. Em ê heta pirsgirêkên civaka mirov, civaka Kurd hebin bi şêwazekî zanistî li ser bisekinin. Di şert û mercên roja îro de zanistî derbazdar e û ev yek mafê me ye. Jixwe zanistî nebe, tu nikarî tiştekî bikî, tu nikarî Şoreşa Kurdistanê jî pêkbînî. Em ji vê re sosyalîzma zanistî dibêjin. Çareseriyekî din a me jî nîne.

Gelekî ne bûyî xwediyê biryara xwe

Gelekî ji mejiyê feqîr dimîne

-Pirsa min a duwemîn ev e: Wek tê zanîn parlamenter, nûnerên gel in. Gel wan bi rayên xwe hildibijêrin. Parlamento bi vîna gel tê çêkirin. Bi rêbazekî demokrasî çêdibe. Parlamentoya Kurd a li mişextê (sürgün) a niha li mişextê ye. Ji ber hinek sedemên rewşên taybet, endamên wê di bin şert û mercên zor de hatin hilbijartin. Gelo parlamenterên li mişextê erkên xwe pêktînin? Dikarin di nava qada navnetewî de beşên agahiya wan ji rewşê tineyî, dengê gelê Kurd, rastiya Kurd bigihîninê?

Xebatekî din a cuda heye. Çêkirina parlamentoyekî netewî, bi awayê Kongreya Netewî tê hizirîn. Wê kesayetiyên ji her parçeyî di nav vê de cih bigirin. Ev Kongre, dikare cihê Parlamentoya Kurd A Li Mişextê bigire? Nêrîna we ya di derbarê Kongreyê de çî ye? Wê rista xwe ya di vir de çiqasî bilîze? Partiya we di kîjan astê de alîkariyê dide vê kongreyê?

-Niha çima Kongreya Kurd A Netewî? Ev rastiyeke ku hîn gelê Kurd nebûye xwediyê biryarê. Gelekî nebûyî xwediyê biryarekî, gelekî ji mejiyê xwe feqîr dimîne û gelekî bê mejî nabe. Di sedsaliya 20. de ew mejiyê gelê Kurd ê heyî jî tê belavkirin. Kurdistan hat parçekirin. Dijmin ji ber ku di her parçeyî de desthilatdarî û vîna xwe hakîm kiriye, mejiyê Kurd nema. Heta roja me jî her ku çû biçûk bû û gelê Kurd bê rêber (serok) ma. Ji bo ku karîgeriya mejiyê Kurd bê avakirin, pêwîst e Kongreya Netewî bê çêkirin. Dest, çav, ling û guhê gelê Kurd heye, lê mejiyê wî nîne. Negengaz e ku mirovên ji sih-çil mîlyon bêmejî bimînin. Mejî hiziran e, mejî biryar e, mejî kontrol e. Va ye ji bo gelê Kurd jî mejiyekî wiha pêwîst e. Wê bihizire, biryar bigire û biryara xwe derbasî jiyanê bike. Piştî salên 1940 û 1950'î ji bo gelê Kurd meclîs û mejiyekî wiha nehat çêkirin. Neçarî bû, lê nehat çêkirin. Ger hatiban çêkirin û meşiyaban, wê şert û mercên Kurdistanê yên îro pir cuda bana.

Wek tê dîtin stratejiya Kurdistanê nîne. Stratejî çî ye? Dirêj û kûr hizirandine, bûyîna xwediyê biryarê ye. Niha ev nîne, herkes li cihekî ye û herkes xwediyê biryarekî ye. Li cihê ku herkes biryarekî digire şoreş nabe û ev gel jî ji bin bandoriya mîtîngeriyê rizgar nake. Gava bingehîn, biryara ku tê girtin kî li gor wê dimeşe, kî nameşe, kontrolkirina wê ye. Êdî pêwîst e herkes hesabê xwe baş bike. Êdî kî li gor biryara şaş, kî li gor biryara rast dimeşe wê ew bixwe bizane.

Xalekî din ev e: Berê şert û merc pir tengbûn, derfet destnedidan. Negengazbû ku çend mirovên Kurd hatibana gel hev. Lê niha dewletên jiderve heta bê xwestin hatin vekirin. Li Kurdistanê şert û merc çêbûn. Fereseta Kurdan jî ji vê re heye. Pêvajo pêvajoya Kongreya Netewî ye. Dereng xistin ne rast e. Pir jî pêwîst e. Êdî giştî parçeyên Kurdistanê bi hev ve girêdayîne. Şoreşa parçeyekî parçeyên din bandor dike. Biryara parçeyekî parçeyên dîtir bandor dike. Têkiliya partiyekî partiyên dîtir û parçeyan têkildar dikin. Heta yêkitiya Kurdan ji bo serkeftinê firsandekî herî mezin e. Nebûyîna yêkitî serkeftin jî nabe.

Ez ji bo van sedeman dibêjim ku; "Kongreya Netewî ji beriya her tiştî û ji beriya xebatên her partiyê tê." Ev pirsgirêka sereke ye. Ger tu dixwazî pirsgirêk bên çareserkirin, tu yêkitiyê dixwazî, dewlet dixwazî, pêwîst e beriya her tiştî Kurd xwe bigihîjinin biryarekî. Riya vê jî Kongreya Netewî ye. Tu yê xwe bigihînî stratejiya Kurd. Ji bo gihandina stratejiyê jî tu yê xwe bigihînî Kongreya Netewî. Parlamentoya ji derveyî welat ji bo vê gava yekemîn e. Wê Kongreya Netewî parlamentoya mişextê tamam dike. Kongreya me çêbibe, ez bawer dikim ku dê endamên Parlamentoya Kurd a Li Mişextê bibin ji her yek endamên wê. Wê cihên xwe di nav de bigirin. Ji bo Kongreya Netewî bingeheke, wê hev tamam bikin.

– Weke tê zanîn gelê Kurd yê ku li Kurdistanê dijî bi salan e di bin mêtîngeha zilma Tirkan de nin. Rewşa wan gelek nebaş e.Cîhana derve ji vê re deng dernexistin, di encama têkiliyên wan yên bi rejîma Tirkan re, gelê Kurd ji zimanê wê bêpar hiştiye. Ji salên 75' an ve gelê Kurd ji mafên wan yên mirovahî, yanî di pêşxistina ziman û çanda wan de, ji mafên wan yên weşan-çapemenî û ji her tiştî bêpar hiştine. Li gorî nêrîna min mirov dikare ji bo pêşxistina ziman, çand û weşana gelê me ji Kurdên li derveyî welat de dijîn ev xebat bide destpêkirin. Lê ev jî rastiyeke ku ew jî

di mijara bikaranîna zimanê xwe de zehmetiyan dikişînin. Li gor we ji bo pêşxistina ev tiştên ku me hêjmartine, yanî ev astengiyên li pêşiya gelê Kurd yên ku li derve dijîn em ê çawa van astengiyan rakin?

– Pirsgirêka zimanê Kurd bi pirsgirêka Kurdan ve girêdayiye û girêdayî pirsgirêka Kurd a neteweyiye. Di warê giştî de pirsgirêka Kurd û pirsgirêka netewa Kurd çareser nebe, pêşnekeve, ji bo pêşxistina ziman gav avêtin ne pêkan e. Ji bo zimanê kurdî bi akademiyan re hinek gav avêtin gengaz e. Lê wê ev ji gel re nebe mal. Bi vê ve girêdayî şoreş pêkanîn û divê destkeftiyên te yên siyasî hebe. Heya niha li ser ziman gelek hat sekinandin. Lê bandora wê zêde çênebû. Ji ber ku meseleyên siyasî nehatin çareserkirin. Ger meseleyên siyasî neyên çareserkirin, wê zarokên Kurdan nikaribin biçin dibistanê û wê nikaribin dibistan ava bikin. Dema ku pirsgirêka netewe hat çareserkirin, wê meseleyên siyasî jî bên derbaskirin û wê zarok biçin dibistanê. Wê demê dê mamoste çêbibin, pirsgirêka Kurd jî dê bê çareserkirin û wê ziman ji xwe de pêş bikeve.

Ger meseleya siyasî çareser nebe, tu yê çawa bikaribî meseleya civakî û ziman çareser bikî? Tu yê dibistanan li kur çêbikî? Heta di welatên li Ewrûpa de dibistan avakirin nepêkan e. Ji ber vê sedemê pirsgirêka ziman çareser nabe. Ji derveyî welat nave. Di roja me ya îro de pirsgirêka ziman pêş dikeve. Ji ber ku şoreş pêş dikeve. Xaleke din ku em baldar bin ev e: divê pirsgirêka ziman li ser pirsgirêka netewe neyê girtin. Dîsa pirsgirêka ziman ne pirsgirêkeke ku di rojek de bê famkirine, pirsgirêkeke ku demeke dirêj dihewîne nava xwe. Ger meseleya siyasî neyê çareserkirin, pirsgirêka ziman, nabe ji derveyî pirsgirêka siyasî be, ji derveyî wê nikarî çareserî jî bidest bixî. Ev jî demek dirêj dixwaze.

Tinê ne meseleyên siyasî,meseleyên taybet jî hene. Ji ber meseleya çand, zimanê kurdî weke çar zarava hatiye cudakirin; heta di nava her zaravayekê de cudahiya herêman jî heye û gelek dewletên ku cîranên Kurdanin jî serweriya zimanê wan li ser kurdan çêbûye. Gelek peyvên Erebî, Farisî û Tirkî tevlîhev bûne.Tiştek din jî gelê Kurd di navbera xwe de tenê bi zimanek pêwendî bi hev re nedanîne. Yek bi Erebî re, yek bi Tirkî re û yek jî bi Farisî re têkiliyan danîne. Ev taybetmendî jî tişteke di rewşenbîrên wan de tên dîtine. Ev jî ji bo mijara ziman gelek zehmetiyan derdixe. Çawa ku mifteya her tiştî şoreşe, ez di vê baweriyê de me ku mifteya ziman jî şoreş e. Bi serkeftina şoreşê re, wê pirsgirêka ziman jî bê çareserkirin.

Hîn ji niha de hinek derfet hatine bidestxistin. Mesele televizyon, radyo, rojname ji bo pêşxistina zimanê kurdî gaveke mezin e. Ger ku di dema pêş de herêmên rizgarkirî bên bidestxistin, li wan deran ji bo zimanê Kurdî dê akademî bên avakirin. Gelek zaravayên wê hene, lê dema şoreş çêbû û mirov bi şoreşê re bûn yek wê zarava jî nêzî hev bibin. Wê Kurmancî biçe gel Soranî; Soranî bê gel Kurmancî û Zazakî bikeve nava Kurmancî. Kurmancî jî bikeve nava Zazakî. Wê zaravayên din jî bikevin nav û wê bivî rengî zimaneke netewî derkeve holê. Ev jî dem dixwaze. Dema aborî bi siyasetê re bibe yek, wê ziman jî roj bi roj bibe yek. Ji ber vê pêwîste ev pirsgirêk bingeh neyê girtin. Ev pirsgirêk çareserkirin, girêdayî çareserkirina pirsgirêka siyasî û neteweyî ye. Lê pêwîst e ji niha de zimanê Kurdî di televizyon, radyo, rojname û kovaran de bi awayeke xurt ser bê sekinandin. Divê alfabeya wê bê avakirin û ji bo zarokên Kurdan dibistanên seretayî bidin avakirin. Di bangeşiyan de giranî bidin zimanê Kurdî. Bi vî rengî wê zimanê Kurd yê netewî cihê xwe bigire û pirsgirêk bê çareserkirin.

Tarzê Rêbertî tarzê çareseriya demokratîk e.

– Em dikarin bêjîn ku dijminê we û partiya we, di heman demê de dijminê gelê Kurde jî. Biryarên ku partiya we girê didin, heman biryar gelê Kurd jî girê didin. Ev di bin serokatiya we de derdikevin. Hûn van biryaran bi hevalên xwe yên partiyî re bêyî ku rawestin digirin. Niha hinek dijberên we ev rewş weke qoz bikar tînin. Di nava gel de propagandeya ku di nav PKK’ê de demokrasî nîne, dîktatortî heye dikin. Nêrînên we di derbarê vê mijarê de çi ne?

– Tarzê Rêbertiyê tarzê çareseriya demokratîk e. Xebata Rêbertiyê, xebata di dilê gel de ye, mêjûyê gel e, xebata zimanê gel e. Yên ku van îdîayan tînin ziman, ehmeqên gelek mezin in. Heta ez ji yên wisa re dibêjim ehmeqên ku guhê wan du sê bihostan dirêjin. Berê ku ez derkevim kesî nedigot ez Kurd im. Bi Kurdî fikirîn û Kurdî sitran gotin ditirsiyan. Çend Kurd nedikarîn bên gel hev civînekê lidar bixin. Lê niha bi milyonan mirovê Kurd bi şoreşê re dimeşin. Di hindirê welat de dibe, ji derveyî welat dibe bi tevlîbûna sed hezaran ve meş çêdibin. Berê jina Kurd nedikarî gaveke biçe mala cîranê xwe, niha li ser çiyan tije dibin.

Di demake ku gundiyên Kurd nedikarîn li hember axa û şêxan devê xwe vekin de, niha her kes bêyî şoreş bigihe serkeftinê, ber bi azadiyeke mezin ve dibezin. Berî dengê gelê Kurd nedihat bihîstin, niha her kes hebûna çil pêncî milyon Kurd qebûl dikin. Niha televîzyon heye. Em berdin televîzyonê, berê kesê nedikarî straneke bêje. Me her tişt weke ku em bi serî derziyê bîro bikolin kir. Gelê Kurd êdî di cîhanê de cihê xwe girtiye. Ger ev ne demokrasîbe se, wê demê demokrasî çî ye? Dibêjîn bergêrî(Şeflik)heye dîktatorî heye. Hemû derewin. Demokrasiya herî mezin ev e. Demokrasiya herî mezin geleke bi vî rengî rakirina ser lingan e û wê wisa dana afirandin e. Di cîhanê de demokrasiya herî mezin ev e.

Di nava partiyê de ji derveyî serokatiyê yê ku nêrîna wê hebe nîne. Ez jî ji vê şêt dibim. Nikarin biaxivin, dijmin li çavê wê xistiye kor kiriye, li guhê wê xistiye ker kiriye. Ez jî rojê hezar kêr lê didim, dixwazim çav û guhê wê vekim. Tenê xebata demokrasiyê nakim, weke şûrê demokrasiyê me. Li ser vê meseleyê, yên ku dixwazin ser bisekinin bêjîn serokatiya Apo çiye, wiha serokatiya Apo şûrê demokrasiyê ye. Mesut Barzanî ji min re got: "tu şûrê demokrasiyê yî." Werin em demokrasiyê bikin demokrasî, bi şûrê demokrasiyê biçin ser.

Xaleke din giring jî ev e: Ger gelek daxive se, bûbe xwedî hêza îradeyê ev demokrasiya herî mezin e. Ger fikir nebe, siyaset nebe demokrasî nabe. Demokrasiyeke bê siyaset jî nabe. Geleke bê siyaset dihêle. Ma demokrasî ev e? Demokrasî îradeya gel e. Îradeya gel hêza siyasî ye. Ji ber vê siyaset pêwîst e. Ji bo siyasetê jî serkeftin pêwîst e. Cuda jî çênabe. Ev hemû ava bûn. Ev jî demokrasiye. Ji ber ku ev hemû ji bo gel hat avakirin.

Li Kurdistanê ji derveyî me jî partî hebûn. Li hember van rêza min heye, lê wan van tiştan nedan avakirin. Weke ku me niha jî anî ser ziman, demokrasî kareke herî mezin e. Yên ku heya duh nedikarin du gotinan baxivin me niha kirine şoreşger. Ev jî yek ji karên şoreşê yên herî mezin e. Di ciheke ku kesî cesaret nedikir bêje ez Kurdim de, me hemûyan kir welatparêz. Ev demokrasiye. Tiştek din jî, di nava partiyê de dixwazim hevalên min ji min zêdetir di nava partiyê de cî bigirin. Min şêt dikin, dibêjîn "em ne layîqê tiştekîne." Ez jî dibêjim haydî heval hûn mezin bûn, temenê we gihişt sîh çil sal, endamtiya xwe ya komîteya merkezê bikin. Na, dibêjin. Ji bo wan, ji bo zimanê wan vebe min nêzî hezar pirtûk nivîsandin. Lê naxivin. Ji bo wê jî şêt dibim. Mesele vegeriya mîsala keça min ji te re dibêjim, bûka min tu fêm bike. Em van hemûyan ji bo ronîkirina Kurdan û hemû cîhan jî di mijara meseleya Kurd de ronî bibe

dikin. Ji ber vê sedemê ev xebata me ne xebata serokatiyê ye, xebata şûrê demokrasiyê ye. Ji ber vê em ser mijara pirsgirêka demokrasiya Kurd wisa disekinîn.

Li Kurdistanê demokrasî di haman demê de zanist e. Dengê demokratan jî bihêz e. Demokratên mezin şûr e. Di şoreşa Fransî û Îslamiyetê de jî wisa ye. Demokrasî heye û şûr jî demokrasî ye. Ji bo ku çend kes hat xistin tu kes kesî fêm nake, nêzî fêmkirinê nabe. Ev ne demokrasî ye. Dema ku çend kes ji bo demokrasiyê xebatên mezin dikin, bi hezaran kes bi navê demokrasiyê demogojî dike. Anîna van a ser ziman ji bo Kurdan girîng e. Hîn zêdetir pêwistî li ser demokrasî û demogojiyê rawestin heye. Pêwîstî bi demokrata rastirîn re cudakirina demogogê û ev e ku bi demokrasiyê re li hev tê û ev e ku demogojî dike derxistina wan a holê heye. Ev, ji bo fêmkirina pirsgirêkê jî girîng e. Ez pir naxwazim ser rawestim.Tenê karê em dikin mezintirîn karê demokrasî ye, şûrê demokrasiyê ye.

Radiyo û televîzyonên Tirk her roj ji bo partiya me, dibêjin dixwazin ji Tirkiyê cuda bin dewletekê serbixwe ava bikin. Dîsa hin sazî û dezgehên medyayê yê ku dijmintiya gelê Kurd dikin jî heman tişt dibêjin. Bi vê re dixwazin dewletên herêmê jî bitirsin in. Vê jî we dabeşker nîşan didin û dikin. Bersivê we ji vê re çi ye?

Xebatên me yên destpêkê heya niha ji bo serxwebûn û azadiya gelê Kurd û Kurdistanê ye. Xebatên min a heya niha ne ji bo dabeşkirinê ye. Min tiştekê wisa negot. Berûvajiyê wê arîşeyê (mesele) serxwebûn û azadiyê navendbûn û yekîtiya gelan e. Di haman demê de jî di roja me ya îro de mafên gelê Kurd ji Îran, Iraq û Tirkiyê dixwaze çi ne? Azadî ye, mafên siyasî ye, mafên pêşvebirina civak û aboriyê ye. Bê ku veqetandina xêzikên tixûban jî ew dikarin pêş bikevin. Mafê gelê Tirkiyê çi qas hebe, ji gelê Kurd re jî ew qas bê dayîn. Di nav welatên xwe de jî dibe, pêwîstî bi veqetandina

tixûban nîne. Heta em vê gavê di vê qonaxê de guhartina tixûban guncaw nabînin. Heta derfet hebe jî naxwazin. Lewra ji vê zirar dibînin. Ji gelek aliyan ve ne sûdê me ye. Em di her warî û mercî de alîgirê guhartina tixûban nînin. Heye ku li gorî sûdê me be em dikarin bi hev re bimînin. Em dikarin berjewendiyên gelê Kurd biparêzin.

Bêguman niha vê jî napejirînin. Wê demê em ê jî heya dawiyê şerê xwe bidomînin. Jixwe ev e ku dewletan Kurd anîn vê rewşê. Me jî heya dawiyê biryara meşandinê wergirt. Ev kar bi zorê nabe. Biratiya di navbera gelan de bidin selmandin (îspat), wê demê em dikarin bi hev re bijîn. Em ji vê re jî hene. Lê belê ne wisa di-pejirînin, ne jî wisa.  Helwesta wan, li hember biryara gelê Kurd dijmintî ye. Li ser yekitî, serxwebûnê ne PKK'ê wê gel biryar bide. Em naxwazin di derbarê parçeyên din de biryar bidin. Gelê Kurd di nav sê netewe de hatiye parçekirin. Vê gavê di nav netewên Tirk, Fars û Ereban de ne. Em dixwazin di nav van sê netewê de federas-yonek, federasyona gelê demokratîk ava bikin.

Ger ku em karibin ji bo vê wê li sê dewletan federasyona Kurd ava bibe, wê Federasyona Rojhilata Navîn jî ava bibe. Fede-rasyona Kurdistanî, Federasyona Rojhilata Navîn e; wate yekitiya gelên Rojhilata Navîn e. Gelê Kurdistanê bi serxwebûn û azadiya xwe ve gelên Rojhilata Navîn parçe nakin, berûvajiyê wê yekpare dike. Azadî û serxwebûna bi vê sedemê jî ev xebat girîng in. Dema ku hemû gelên Rojhilata Navîn azad bûn dê wekhevî derbikeve holê. Bi vê sedemê angaştin (îddîa) dabeşkirin nerast in. Em dabeş-bûnê naxwazin. Ew di navbera gelan de bêwekhevî û koletiyê dixwazin. Em jî li dijî wan derdikevin.

Şerê PKK'ê, şerê li dijî terorîzma ku li dijî mirovatiyê tê pêşxistin e.

Televîzyon, rojname û radyoyên dewleta Tirk her tim PKK'ê bi terorîzmê ve tawanbar dike. Ji bo ku barbarî û hovîtiya ku dewleta Tirk dike veşêre hemû xebatên PKK'ê bi terorîstiyê ve dexm (damgalama) dike. Ez li vir vê encamê derdixim; yekemîn, medyaya Tirk dibêjin partî, şervanên we di nav Kurdan de, di Bakûrê Kurdistanê de çalakiyên terorîstî dikin, bi taybetî li hemberî ev kesên ku ramanên xwe parve nakin çalakî dikin, teror pêşdixin, dîsa li Kurdistanê kujerên nediyar ên ku pêk tên hin çalakiyan di aliyê we de pêşdikevin, wan jî ji we re dikin mal.

Duwemîn, dewleta Tirk bi rêka medya xwe dibêjin hin dewletên biyanî ji partiya we piştgiriyên darayî û arîşî pêşkeş dikin û dibêje,li dijî Tirkiyê sor dikin. Di derbarê van herdu angaştinan de çi dibêjin?

Ev pirsên we pir girîng in. Berûvajiyê wî di roja me ya îro de terorîzma herî mezin a dîrokê terora ku serwerin Tirk û komara Tirkiyê pêş dixîne. Çend gel ji holê rakir? Gelê Ermen, Asûr, Rûm çanda ku bi hezaran sal avabûyî tine kirin. Îşkenceyan ne tenê gelên din ji gelê Tirk re jî hatiye kirin. Îşkenceyên ku ji Elewiyan re kiriye di dîrokê de wekî wî tine ye, ji Elewiyan bihezaran kes zîndî binax kirin û kuştin. Van e Selçûkî û Osmaniyan kir. Mistefa Kemal jî hevalên xwe yên herî nêzik sêdare kir. Çavkaniya serweriya terorîzmê dewleta Tirk e. Ev hemû cîhan jî dizane. Li cîhanê barbariya herî hov ya Tirkan e. Niha jî dixwaze gelê Kurd bi terorî ve tine bike.

Berxwedaniya PKK ku li dijî vê radiweste ne terorîst e. Berûvajiya vê cîhadê Îslam çiqas pîroz be, berxwedaniya me jî ji bo gelê Kurd û mirovatiyê ewqasî pîroz e. Ger ji min bê pirsin ez ê bêjim şerê herî pîroz, şerê ku PKK'e li kurdistanê pêşdixe ye. Ev

şerekî pîroz e, şerekê paqij e. Şerê li dijî terorîzma ku li dijî mirovatiyê tê pêşxistin e. Şerê ku bi pêşengtiya rêbertiya PKK'ê ve tê pêşxistin, şerekî wisa pîroz e. Ne hewceye ku ev pir bê ser ziman.Temaşeyê dijiminê me bikin wê bizanibin şerê me çi ye û çi nîne? Gelê Kurd û şoreşgerên wê bi komkujiyê re rûbirû bûn. Gel li pêşberiyê komkujiyê ye. Vê bi cureyekî din çawa rawestine? Kî ji vê re dibêje terorîzm, ew rûreş e, ew bênamûs e. Dibe ku di her şerî de terorîzm hebe, lê belê di şerê PKK'ê de tine ye. Bêguman pergal û çapemeniya Tirk dixwaze şerekî wisa ya pîroz ji cîhanê re weke terorîzm bide nasîn. Lê belê pêwîst e ji vê re derfet neyê dayîn. Her ku roj derbas dibe cîhan jî kî hov, barbar terorîst e fêm dike. Ji bo ku cîhan jî dizane pir girîngî nade.

Duwemîn, dikarim bêjim li cîhanê partiya ku bi tena serê xwe rabûye xwe birêve dibe PKK'e ye. PKK'e roja destpêkê ya ku dayîkbûyî û heya roja me ya îro, bi alîkariya gelê Kurd ve rabû ser piyan. Tu keseke ku alîkariyek dabin, nîne. Dibe ku hin dostan alîkariya takekesî dabin kiribin, lê belê ji sedî notuneh ev alîkariyên gelê Kurd in. Em dixwazin dewlet û gelên din alîkariyê bikin, lê belê nakin. Lewra heya dawî daxwaziya me ya serxwebûn û azadiyê dizanin. Dostên Kurd a ji bo serxwebûn û azadiyê jî kêmin. Lewma alîkarî nakin. Çi dewleta Rûsya çi Îran nêzî tişteke wisa nabin. Bixwazin bikin jî nikarin bikin. Ger alîkarî kiribana, min ê bipejirandibana. Ji ber berjewendiyên xwe naxwazin bikevin nav hewldanekî wisa. Lê belê me alîkariyên ku gelê Kurd dabin kir. Ev jî ji me re bes e,yên din naxwazin. Niha ji rojê bi hezaran kes ji me alîkarî dixwazin. Di vê baweriyê de me ku rojek wê were dê DYE'ê jî ji me alîkarî bixwaze. Niha Îran ji me alîkarî dixwaze. Di pêşerojê de dibe ku Rûsya jî bixweze. Em alîkarî nagirin, berevajiyê wê didin. PKK'e seyrekê wisa seyr dike.

PKK partiyekî Kurdistanî û partiyekî welatparêz e.

Derbasbûna şervanên wê ya ji Bakurê Kurdistanê ya Başûrê Kurdistanê ji bo hikûmeta Tirkiyê hinceteke dafirîne. Vê hincet dike û dem bi dem leşkerên xwe dişîne Başûr û operasyonan dike. Ev jî di hikûmeta federe ya Başûr de bû sedema derketina gelek pirsgirêkan. Niha li herêmê ji bo ku hikûmeta federa ya Kurd nekeve, ji Komara Tirkiyê re hincet nebe, dîsa ji bo di destê hevkaran de keys (koz) nebe,divê pêşgirî (tedbîr) çi bibe?

Şoreşa mezin a Kurdistanê şoreşa Kurdistana Başûr e. Pêwîst e destpêkê ev bê fêmkirin. A duwemîn, Başûr, wisa dihesibîne ku hikûmeta federe ya Kurd ava kiriye. Ya rastî li gorî min ger pêşketinên Bakûr nebe, dev ji hikûmeta federe berdin, wê dijmin tevahiya Başûr veguherîne Helebçe. Ger îro li Başûrê Kurdistanê komkujiyên cureyên Helebçe nayên pêşxistin, sedema wê şoreşa mezin a Kurdistanê pêş dikeve ye. Pêwîstî bi dîtina vê rastiyê heye. Tiştekê din jî, ger xebatên PKK'ê nebe, ne pekane ku hêzên ku ne girêdayî dijminin xebatên neteweyî bikin. Nekarin di şûngehekê demokratîk de rawestin. Heya niha sedema serneketina van, bi dijminên gelê Kurd re hevkarî kirine. Niha li pêşiya me astengî derdixin. Me weke hincet didin nîşandan.

Pêwîst e xwe li vir nexapîn in. PKK'e li Kurdistanê, partiyeke welatparêz e. Partiya demokrasiyê ye; di xizmeta Kurdan, Kurdistan û demokrasiyê de ye. Li Bakur, Başûr li Rojhilat ev erkê me ye. Em bi gelê Kurd re ne, li hemberê wî nînin. Heya ku hêza me hebe ji xizmetê re dewam bikin. Li derveyê wê rêkek jî tine ye. Di 1970'î de dema ku li Başûrê Kurdistanê otonomî ava dibû, YNK'ê bi pergala Iraqê re rêkeftin avakiribû. Çima pergala Tirk alîkarî nekir? Li Helebçeyê komkujî çêbû, çima deng dernexist? Ger ku dijminê te ji Başûr re ev qas girîngî dide, tu yê çi bikî? Rêkeftina te ne bi dijmin re wê bi gel û birayê te re bibe. Ger ku

rêkeftina te bi gelê te re nebe weke Helebçe gelek komkujî wê bê jiyîn.

Ji hemû partiyên Başûr re dibêjim: Her kes li vir neçare jîrdar (akili) be. Va ye ji bo ku PKK'e li Başûr e, artêşa Tirk heya vir tê, ev hemû derewin. Carek ev gelê me ye, welatê me ye. Vir jî Kurd e, Kurdistan e. Em neçar in di nav gelê xwe de bimînin. Pirsgirêka taxtîkî jî cuda ye. wê ji vê re nêzikatiyeke cuda ji wê re jî nêzikatiyekê cuda bê nîşandan. Bi nêzikatiyeke wisa ya taxtîkî ve arîşeyan dikare bê axaftin û çareserkirin. Lê xwe bi dijmin re dane girêdan, li Başûr bûyîna federasyon û li Bakur şoreş nebe, ji bo sergirtina wê hincetên cuda nîşandan… Ev îxanet e. Arîşeya (mesele) bingehîn ev e.

Xebatên me li Bakur jî, li Başûr jî leşkerî û siyasî ye. Xebateke Kurdistanî ye. Di heman demê de jî xebatekî geşepêdanî ye (gelîştîrîci). Ne xebateke ku astengiyê ava dike, xebateke pirsgirêkên bi hezaran sal çareser dike ye. Her kes jî vê dizane. Bi PDK'ê re çend sale di navbera me de nakokiyên ku berdewam dikin hene. Ev bi rêbazên siyasî û leşkerî dikarin bê çareserkirin. Li Başûrê Kurdistanê federasyonê ava bikin em di roja duduyê de bikevin nav. Ger bixwazin dikarin piştgiriyên erîşî û darayî pêşkeş bikin. Em bêyî biryara gelê Kurd û Kongreya Neteweyî nikarin li vir rawestin. Lewra em dixwazin şoreşa mezin a Kurdistanê pêş bixin. Pêwîst e alîkarî bê dayîn, em neçar in ji wan re alîkarî bidin. Ew jî neçar in ji şoreşa Bakur re alîkarî bidin. Ger şoreşa Bakur nebe, federasyona Başûr nikare 24 demjimêr li ser piyan raweste. Çare ev e. Ger tu dixwazî federasyona te 24 demjimêr li ser piya raweste, tu yê wê ji şoreşa Bakur re xizmet bikî. Kîlîd ev e. Bêyî vekirina vê kîlîdê pir wateyeke şoreşa Başûr nabe. Ev jî nêrîna min a bingehîn e. Ger ku li Başûr û Bakur nakokî bên çareserkirin, wê demê şoreşa Kurdistanê jî bi rengekî bihêz digihêje serkeftinê.

Weke pirsa ku me berî vê jî pirskirî dibînin ku hin hêzên xwe ji Bakur ber bi Başûr ve dikişînin. Di demeke nêz de wê di navbera we û PDK’ê de lihevkirin çêbibe. Baş e, gelo ev hêza we ya li Başûr ji bo Komara Tirkiyê hincet nabe? Yanî ger ku pergala Tirkiyê li ser PDK’ê zext bike, PDK’e jî li dijî we biryar bigire. Ma hûn jî wisa nabînin?

Li vir jî arîşe ne PDK’e ye. Di şerê me yê ku bi PDK’ê re heyî de jî çi şerê PDK’ê çi jî şerekê Kurdistanî bû; şerekê li dijî Tirkiyeyê bû. PDK’e çiqas di xizmeta Tirkiye de be, şerê me jî bi ew qasê li dijî Tirkiyê ye. Li Bakur be li Başûr be ti cewaziya xwe nîne. Pirsgirêk ne pirsgirêka PKK’ê ji qadê derxistin e. PDK’e çil sale bi dijminên gelê Kurd re di nav têkiliyê de ye. Hê jî wisa berdewam dike. Serbazên Tirk her roj biryarên cur bi cur digirin, ew jî van biryaran pêktînin. Ev dijmintî ye, em vê nikarin wisa bipejirinin. Dijmineke faşîst e, li ser komkujiya Kurdan biryar digire. Ne tenê li ser Kurdên Bakur, li ser hemû Kurdan biryar digire.

Bila PDK’e ji biryarên dewleta Tirk digire dûr bisekîne, wekî ku ew dibêjin nemeşin, ger van bikin em tenê rojek jî namînin, biçin. PDK’e partiyeke Kurd e. Bila biryarên gelê Kurd, biryarên Kongreya Neteweyî bipejirîne, em li vir rojekî tenê jî namînin. PDK’e biryarên federasyona gelê Kurd pêk bîne, federasyona ku hemû Kurd di nava xwe de dihewîne bipejirîne, em rojekî jî şer direj nakin. Di deqîqa xwe de şer bidin sekinandin. Ev arîşeyên partiyê ne; ne arîşeyê Bakur-Başûr, pirsgirêkekî Kurdistanê ye. Hemû Kurd pêwendîdar dike. Bila PDK’e were tevlî hemû civînên siyasî bibe, bêmerc şer bidin rawestandin. Bila were civînê, ger pirsgirêkên Kurdan hebe li wê derê çareser bikin. Tu na, PDK’e çi qas ji van bireve, ger bi ser me ve werin, em jî heya ku tevlî biryar û civînên gelê Kurd bibim, ew qas biçin ser wî û li ber xwe bidin.

Pirsgirêk ne PDK-PKK'e ye, pirsgirêka PKK-Tirkiyê ye. Pirsgirêk; ne pirsgirêka şerê PDK-PKK'e ye, ev arîşeya Kurd e. Ev pirsgirêk tenê PKK'ê û PDK'ê pêwendîdar nake, di heman demê de hemû Kurdan pêwendîdar dike. Wê ev pirsgirêk her çi be çareser bibe. Wê Bi civînên Kurd , bi Kongreya Netewaya Kurd re çareser bibe.

Hûn carna di rojname, radyo, televîzyon û cîhazên xwe de dibêjin leşker û cendermeyên Tirk cilên peşmerge li xwe dikin di refên peşmergeyan de (PDK) li dijî we şer dikin. Ma di destê we de delîlên ku bikaribe ev angaştina we piştrast bike heye? Ger hebe çima van bi raya giştî û gel re ji bo vegotina rastiya PDK'ê bikarnayînin. Ango di van pevçûnan de cenazeyên leşkerên Tirk ên ku ketin destê hevalên wê hene?

Li vir gelek delîl hene. Jixwe ew bixwe jî dibêjin. Weke mînak Samî Ebdurrahman dibêje; "em bist hezar peşmerge ava dikin. Wê pere û cilên wan Tirk bidin." Yek jî me duh agahî girt: Tirkiyê ji van e re 48 panzer daye. Her roj bi serbazên Tirk re ji bo alîkariyê civînan çêdikin. Dîsa me cil, cente û çek bidestxist. Çek, hemû têkildarê Tirkan e. Her roj li ser van werdigirin. Ji şeş cenazeyê van du ji wan birine Cizîrê. Cerdevanên li Bakur bûn. Ev tiştekî giştiye. Tirkiyê bi her cureyê alîkariyê dike.

Di Operasyona Çelîk'ê de 35 ango 40 hezar leşkerên Tirk bi çekên xwe yên hov ve derbasî Başûrê Kurdistanê bû. Li dijî hêz û hevalên we operasyan kir. Ev operasyon piştî ku ji Başûr hat kişandin, ji ber vê hewldanê we di hin welatan de şermezarkirin, pêş ket. Ev yek. A din jî, berxwedaniya hevalên we ya li dijî leşkerên Tirk nîşan didine. Angaştin ji aliyê ku dema leşkerên Tirk xwe paş ve dikişandin çek, kel û pelên xwe ji bo li dijî we şer bikin ji PDK'ê re hiştiye. Hûn di vê mijarê de çi dibêjin?

Di vê xalê de gotinên we rast in. Di encama berxwedaniyek dîrokî de artêşa Tirk çû. Ne xwe çûyîn ji ber bertekên derve û Ewrûpayê nîne. Çil û pênc roj man. Bangawaziya Ewrûpa kirî şêweyî ye. DYE jê re got bikevê. Li pişt çilûpênc roj piştî ku kişiyan bangawazî hat kirin. Ger nekişiyaba derfetên me baş bûn, derbên hin mezin dikaribûn lêxin. Di derketina wan de rista bingehin berxwedaniya me lîst. Ji cihê xwe re nûnerê xwe hişt.

Li vir, ji wê re balkişandin pêwîst e: Cihê leşkerên Tirk û PDK’ê girt. Çek heman çeke, dîsa alîkariya darayî ji bo wan dikin. Artêşa Tirk di derbarê me de biryar digire. Yê ku van dimeşine PDK’e dibe. Ev girîng e. Tiştekî din jî heye li Zaxo û Dohokê çend serbazên Tirk heye û şer birêve dibin. Tirkiye ji zilamên wekê Samî Ebdurrahman re dibêje; “ha ji te re çek ha pere” dixirikine şer. Her roj peşmergeyan kom dikin, pere û çek didin. Serbazên Tirk li Dohokê her meh pereyên pêşmergeyan dide. Ev çi dide selmandin? Ev a rastî leşkerên Tirk in, ne peşmerge ne. Ev peşmergeyên PDK’ê jî nînin. PDK’e jî nikare li ser van venêrînê pêş bixe. Yên ku Tirkiya pere dideyê,leşkerên Tirk in. Tenê cilênwan cilên peşmerge ne.

## Vîna herî mezin tevlî nav şoreşê bû

Weke tê zanîn hûn jî li Kurdistanê li ser partiyekî, Rêberek kurdistanê ne. Tiştên we ji bo maf û daxwaziyên gelê Kurd ava kirine çi ne? Di pêşerojê de gelê Kurd dê xwe bigihêne çi? Dema ku gelê me bigihêje armanca xwe gavên lez ê ku bê avêtin çi ne?

Berê wê li ser rewşa Kurdistanê bikûrahî rawestiyan. Vê gavê şer her tişt dide diyarkirin. Dema ku şoreşa Bakurê Kurdistanê gihişt çareseriyê wê pirsgirêka kurdistanê çareser bibe. Ger şoreşa Bakurê Kurdistanê bimeşe wê tevahiya Kurdistanê bimeşe; di rewşa sekinandina vê de jî dê ev tenê ne ketina PKK’ê be, ketina hemû gelê mê yê Kurd be. Tu kes nikare vê înkar bike. Ger ku ev şoreş li Bakur bigihêje serkeftinê li wir bostekî pêş ve biçe, Kurdên Başûr û Rojhilat deh bost pêş ve biçin; ger ku Bakurê Kurdistanê bigihêje serkeftinê wê hemû Kurdistan bigihêje serkertinê. Şoreşa Bakurê Kurdistanê kîlîda her tiştî ye, kîlîda hemû Kurdistanê ye. Tenê kîlîda îro nîne, kîlîda hemû dîrokê ye.

Ma tu dixwazî dîroka Kurdistanê fêr bibî, ev di şoreşê de ye. Ma tu dixwazî xwezaya Kurdistanê binasî ev di şoreşê de ye. Ma tu dixwazî li Başûrê Kurdistanê bimînî, divê tu li Bakurê Kurdistanê dewlet ava bikî. Ma tu dixwazî ji bo hemû Kurdistanê tiştên baş bikî, tu yê ji Kurdistana mezin re xizmet bikî. Ma tu dixwazî bi cîhanê re têkiliyên dîplomatîk ava bikî, tu yê li Bakurê Kurdistanê binêrî. Ma tu dixwazî civaka xwe ava bikî, ma tu dixwazî di qada aboriyê de pêşbikevî, tu yê li Kurdistana mezin binêrî. Ma tu dixwazî mirov, jiyana nû ava bike û demokrasî ava bike, tu yê li Kurdistana mezin binêrî. Em li ser vê bingehê dikarin bêjin ku parçeyê Bakurê Kurdistanê yanî yê ku şoreşê dimeşinin kîlîde. Bêyî wê ne dîrok,ne jî jin azad nabe. îro jî nabe. Ne aborî, ne siyaset,ne

giyan û ne jî kesayet tiştek namîne; ev ne gengaz e. Ez ji ber vê şoreşê bingehê her tiştî dihesibînim.

Hemû Kurd û partiyan; ne tenê ji bo mercên roja îro, ji bo pêşeroja hemû Kurdan heta gelên li Rojhilata Navîn jî girêdayî vê şoreşê ye. Li Tirkiyê ji holê rabûna faşîzmê ve, girêdayî avêtina gavên şoreşê ya ku em didin pêşxistine. Dîsa ji bo gelên Rojhilata Navîn meşandina demokrasiyê girêdayî şoreşa ku em didin pêşxistine. Ez bi vê sedemê pir girîngiyê didim. Ji bo ku ez girîngî didim vê, ez xwe pir bihêz tevlî dikim. Lê belê her çiqas mezin be, mirov ewqasî xwe bihêz tevlî dike.

Xaleke din, dema ku tu çend metre erd dikolî, tu xwe digihînî xezîneyên zêr. DYE’yê naxwaze Kurdistan bigihêje serkeftinê. Lewra ji bo wê zêr ji biratiyê hîn girîngtir e. Gelek hevalên me xwe feda dikin, seqet dihêlin. Lewra jiyan bi tenê di vê şoreşê de heye. Ev jî delîla van e. Tevî ku birçî û tîne ecêb liberxwe didin, berê xwe didin dijwariyê. Ev afirandina mirov û jîna me ye. Ne pêkan e ku em bêyî vê li ser piyan bimînin. Vîna herî mezin a mirovî tevlî vê şoreşê bû. Ev jî vê dide selmandin. Ev şoreş her tiştê mirovê Kurd e. We got hûn pêşeroja Kurdistanê çawa dibînin? Bi girêdayî vê şoreşê ve mezin dibînim. Gelê Kurd heya niha li paş mirovatiyê bû. Lê belê ez di vê baweriyê de me ku piştî vê dê li pêş mirovatiyê bimeşe.

Rêberê min tevlî nêrînên te dibim. Bakurê Kurdistanê parçeyê ku rista kîlîdê dileyîze. Tê gotin; “ger Bakurê Kurdistanê rabe ser piyan wê bandoreke mezin bafirîne”. Va ye îro tişta ku Kurdistan dijî; ev e. Bakurê Kurdistanê rabû ser piya û wê pirsgirêka Kurdistanê jî bi tevahî were çareserkirin.

Şoreşa ku em bilind dikin ne tenê ji bo Kurdistanê, ji bo hemû cîhanê ye. Çawa ku Şoreşa Fransayê demeke li Ewrûpayê bû

pêşling, çawa ku Şoreşê Cotmehê li Asya û Efrîqayê bibandor bû, çawa ku Şoreşa Îslamê hejandinek afirandî be; ev şoreş jî dikire hejandineke wisa bafirîne. Derfet û çavkaniya wê heye. Hûn dibînin, ev serdem jî pir zîz e. Gelek dewletên Ewrûpa jî pir zîz tevdigere. Lewra dizanin. Ji ber vê jî pêwîst e ji Şoreşa Kurdistanê re wisa bi çaveke biçûk, ji aliyê awireke teng ve neyê mezandin. Şoreş li Kurdistanê mezin bûye, gel û di herêmên din de jî geş bûye.

Pirsgirêkên mirovatiyê mezin e. Bersiva pirsgirêkên mezin ên mirovatiyê, li Kurdistanê bi şoreşê ve tê dayîn. Ger ku tu dixwazî mirovatiyek nû were afirandin, tu yê li ser şoreşa Kurdistanê rawestî. Îro xweza rûxiya ye. Ger tu dixwazî ji vê re çareseriyek peyda bikî, dikarî di Şoreşa Kurdistanê de bersiv bibînî.

Mirovê nû, -ku, mirov wek morî bûye- afirandina mirovê mezin, ger tu dixwazî mirovatiyê mezin bikî, vê dikarî di Şoreşa Kurdistanê de bikî. Ev rastiyek e. Şoreşa Kurdistanê ne şoreşeke teng e, fireh e û mirovî ye. Nêzikatiya me jî wisa ye. Min vê şoreşê ne bi navê Kurd û Kurdîtiyê da destpêkirin. Ez destpêkê mirov bûm, dûvre min dest bi Kurdîniyê kir. Ger komar jî bê afirindin, wê ne komara Kurd û Kurdistanê be, wê bibe Komara Mirovahiyê.

Xalekek cuda heye. Mirovahî li Mezopatamyayê pêşket. Ajal, li çiya hatin girtin, li Mezopotamyayê hatin kedîkirin. Dexl û zad cara pêşin li vir hat çandin. Afirandina bingeha mirovahiyê li vir avêtin,ev rastiyek e. Îro mirovahî ber bi qedandinê ve diçe, lê belê em ê nû mirovahiyê li Kurdistanê ava bikin. Çawa ku bingehê mirovahiyê li vir hat avêtin, dikarin mafê mirovahiyê, azadî û rizgariya wê jî di van axan de bafirînin. Ez bi vê rastiyê bawer dikim. Lê mercên wê heye, xebat jê re dixwaze.

## Her tim alîgirê çareseriya siyasî ne

Pirsa min a herî dawî, pirsa herî girîng e. Mixabin şerê birakujiyê pirsgirêkeke qat nayê pejirandin e. Di vê şerê birakujiyê de nêrîna gelê me çi ye, çi dibêje? Gelek dewletên cîhanê, yên ku dijminê gelê Kurd in, vê arîşeyê di destê xwe de weke kart digirin. Ji cîhanê re dixwazin vê yekê bidin selmandin: Va ye yekîtiya gelê Kurd nîne, nikarin bi hevûdu re debara xwe(geçinmek) bidin meşandin. Dibêjin; "gelê Kurd nikare xwe bi rêve bibe, el in." Di mercên roja îro de jî gelo ma ev rewşa neyînî ya ku dijî jê re çareseriyek peyda nake? Bi taybetî mercên wê çi ne? Tiştê taybet yên ku di derbarê ev kesên ku dixwazin navbera we û PDK'ê de navbeynkariyê bikin, tişta hûn bêjin heye? Spas.

Ez ev şerê ku berdewam dike dîsa dibêjim ne birakuji ye. Ev şerê ku bi dijminan re tê kirine. We bixwe jî rewş fêm kiriye. Artêşa faşîst a Tirk kişiya, lê çekên xwe ji vane re hiştin. Her serê mehê jî mûçe didin. Xalên bingehin ev in. Ên din jî şerê Kurdan, ne pevçûna biratiyê ye, şerekî ku li dijî gelê Kurd tê dayîne. Ev şerê ku li dijî dijminên Kurd dide, risteke mezin dilîze. Hemû cîhan were gel hev û du jî ji min re nikare biselmîne ku ev şerê birakujiyê ye. Îxanet, îxanet e. Ev e ku barbar, bi dijminê xwînmij re hevkariyê dike, komkujîker, ev ê ku ji dijminên Kurdên xwînmêj re rêkeftî navan dike- ku ne rekeftin e, yekser êrîşkirin e, dijmintî ye- kî? Îxanet jî, dijmintî jî heya astekê dikare bê pejirandin. Mirovahî heya

asteke dikare wate bide. Lê belê yekser bi dijminê faşîst re hevkarî, li dijî gel helwesteke, ji gelê Kurd re dijmintî ye. Ya yekemîn ev e.

Ya duwemîn, gav avêtina mirovê baş e. Barzanî çawa ku tê bila bê, nikare min bide bawerkirin. Tu ji dijminê faşîst mûçe werdigirî, her cûreyê têkiliya te heye. Faşîzma Tirk nikare ji karmendên xwe re mûçe bide; gundî û karkerên wî di rewşeke birçî de ne. Çima ji gundî û karkerên xwe re dirav nade ji te re dide û te li ser her tiştî digire? Ma ji Kurdan pir hez dike? Xala bingehin ev e. Heke ji Kurdan hez dike, Kurdên li Bakur heye çima ji wan re tiştek nade? Dibêjin; "ji bo zarokên xwe yên çiyê xwedî bikin, dirav werdigirin." Ma dibe ku tu debara xwe li ser xwîna Kurdan dayî bidî meşandin? Biçe çandinî, bazirganiya aboriyê bike, bazirganiya esrarê bike, bazirganiya afyonê bike, lê belê bazirganiya xwînê neke. Li ser xwîna ciwaneke temenê wî hevdeh salî,yanî xwîna pakrewanan bazirganî nabe. Li ser ciwan, xort, jinên Kurd bazirganî nabe. Yê ku vê dipejirine, ji mirovbûnê derdikeve. Ev rûreşiyeke mezin e. Rebentiya Kurd di vê derê de ye.

Me dixwest ev tişt bên fêmkirin. Ger bi Tirkan re yeknebûya, ev îxanet nekiribana, me yê jî di xizmeta malbata Barzanî de bûbûna. Dev ji çûyîna li pey faşîzma Tirk berdin, hema sibê şer bidin rawestandin. Ez vê dibêjim: Biçe bêje Apo dixwaze bibe leşkerê te, xwe ji vê re amade dikin! Tiştekê cuda naxwazim. Misoger tiştek naxwazim. Tu ji min re bersivek bîne, şeveke din şer bidin rawestandin. Ez dikarim amadekariyên xwe û hevalên xwe bikim, bikevin xizmeta Başûr. Li dijî dijminên gelê Kurd şer bikin. Misogere şerê birakujiyê çênabe. Ji bo federasyonê alîkarî bikin. Dijminê Kurd Komara Tirkiyê ye, ji bo me hemûyan heman e. Lê Barzanî dibêje: "Tirkan ji Kurdan re çi bike bila bike tenê dest li min nede." Ev tê çi wateyê? Yanî yekî bê, bikeve hemiza dayika wî; ew

jî bêje ev zilam baş e, bikeve hemiza dayika min, ev dişibe mînaka tiştek nabe.

Va ye Barzanî vê berde. Wî merê bênamûs ji mala xwe derbîxe. Gava ku ji vê durûtiyê derket, gava ku ji vê belayê rizgar bû, ez şer bidim rawestandin. Çima rêbertiya PDK’ê van fêm nake. Tiştê em dixwazin du peyv in. Dema bersiv da, îro jî dikarin, şer bidin rawestandin. Çima fêm nakin? Ji bo vê bazirganî û çandinê jî dikarin bikin. Ev dikarin bi dirav têr bikin. Tiştên ez dixwazim ev in. Ger nepejirîne, pir baş dizane ku wê sedî sed di venêrîna serbazên Tirk de bibe. Divê xwe nexin vê rewşê. Zaroktî neke. Ma ewqas xebat da meşandin, ev qas şehîd da, hewl da. Barzanî li hemberê vana tiştek nake. Nikare bêje têkiliya me bi Tirkiyê re li ser bingehê sûdê ye.

Divê bi Tirkiyê re têkiliyên xwe diyar bike. Em nabêjin têkiliyên bi van re qet nabe. Dibe, lê belê li ser xwe bisekine. Ez jî dixwazim têkiliyên siyasî pêş bixim, lê belê ne bi hesabkirina li ser tu kesî be. Em jî dixwazin arîşeyên Kurd çareser bikin. Ger me bi hev re rêkeftinek bikira, wê li Bakur pêşketinên mezin bûbûya. Weke me got pêşketinên Bakur pêşketina Başûr e; wê demê ev bixwe desthilat bûbûya. Divê ev bê çareserkirin. Ew jî arîşeyên Kurd dizane. Lê belê dema ku ji vê re nêznebin çek dikeve dewreyê. Em her tim alîgirê çareseriya siyasî ne; lê belê ger vebijêrkek cuda neyê hiştin neçarin xwe biparêzin. Tenê du daxwaziyên me heye: yekemîn, divê komkujiyên faşîst ên Tirk nedin meşandin; duwemîn, arîşeyê Kurd heye, biratî heye. Pirsgirêkên di civînan de werin çareserkirin. Tiştekî we cuda hebe em amadene. Bawerim me karî bersiva we bidin.

Serokê min bersiva, ku hat dayîn rast e, di ciyê xwe de ye raveker e (açiklayici). Armanca me jî ji bo rastiyê, baş naskirina

rêbertiyê, rastiyan ji gel re birin, nakokiyên di mejiyên van de çareserkirin e.

Rast e. Ez jî van mijaran ji bo gel, ji bo ku gel rastiyê binase, ji bo kesên ku serê van hişke vedibêjim.  Pirsên te yên cuda hene?

Pirsek min a cuda nîne. Lewra nêrînên serokatî ne bi tenê yên ez diramînim, xeyalên min jî bi cih tîne. Spas.

Mijarê sergihayî kir. Vana ne tenê nêrînên me, we ji me re peyam jî da. Karê ku we çil sal berê di bingehê welatparêziyê de kirî, karê me ye. Yanî dibe xwediyê giyanekê, spas.

Îbrahîm Ehmed: Rêhevalên hêja! Bi hemû dilê xwe ve bi we re me. Min pir dixwest li gel we bim, tevlî wê dibistan û hevparê hişê we bibim. Min ji we re waneyên ku bikevin xizmeta ji têkoşîn, welatparêztî, gelê Kurd û ciwanên wê re bidaya. Pêncî-şêst sal berê tiştekî ku min gotiye heye: “Divê ji bo mirinê neyê jiyîn, divê mirin jî ji bo jiyan bibe”. Lê belê çiqas heyfe ku, di nav rêberên me de ji me re wekê we wisa kesî bizane, nebû ku van waneyan jî bide fêmkirin.Ev tişta me gotî ji dûrişmên we re jiyan bide qezanckirin, kesên ku me ji jiyana berê rizgar bike, rêka jiyana nû nîşan bide tine bû. Kesê ku ji me re mirinê ji bo jiyanê, rêyekê di derbarê bûyîna pêwîstiya jiyana rast de nîşan neda. Kesê ku em çawa berxwe bidin, çawa bixebitin fêr bibin tine bû. Dîsa kesekê ji bo jiyanekê azad ji me re wane bide tine bû.

Dîtin, tevlî civîna we bûyîn min pir da şadkirin. Bawer dikim di Kurdistanekî azad de, di Kurdistanekî demokratîk a federal de bi hev re di nav aramiyê de jiyan bikin. Ji we hemûyan re ji PKK’ê û di xebatên wê yên Kurdistanê de serkeftin dixwazim. Dîsa ji tevgerên din ên welatparêz, demokratîk û Kurdistanê re jî serkeftinê dixwazim. Ji we hemûyan re spas dikim.

Abdullah Ocalan: Ez jî ji Îbrahîm Ehmed re û ji Mamosta Hawar re silav û rêzên xwe pêşkêş dikim.

M. Hawar: Daxwaziyên Mamoste Îbrahîm Ehmed ez jî parve dikim. Ez jî helbestvanekî pêncî salî me. Çend sale ji bo xwendavanên dibistanê helbest dinivîsinim. Dema ku ji we serxwebûna gelê Kurdistanê dixwest, ji we hemûyan re serkeftinê dixwazim. Em serkeftinê di we de dibînin. Hêviyên me hûn in. Serkeftin ji rêbertiya birayê min yê hêja Serok Apo re.

Abdullah Ocalan: Mamosta Îbrahîm Ehmed û Hozanvan Mamosta Hawar ji me re hêz dan. Dixwazim çend peyv bêjim. Min jî destpêkê wisa digot: Bimirim lê belê ji bo vala nebe, ji bo jiyaneke bişeref û rûmet, ji bo Kurdistanê bibe. Niha mirina Kurdan ji bo jiyanekê bi şeref e. Ev jî tiştekî mezin e. Dema ku min vê peyvê ji Mamosta bihîst tiştek pê hesiyam. Zarokatiya min çi be, zarokatiya wî jî haman e. Li vir welatparêztiya Kurd gihişt hevûdu. Bakur û Başûr gihişt hevdu. Em li vir li ser van mijaran hemûyan pir bihêz sekinin. Li vir yêkîtiya Kurd, yêkîtiya tevgerên Neteweya Kurd dibînim. Pir kêfxweş im.

Hatina we ya vir ji bo xebatên PKK’ê gaveke mezin e. Ji me re hêviyeke mezin dide. Wisa bawer dikim ku, heya niha xebatên ku me kirî ji Kongreya Neteweyî zexm (perçînleme) bike. Mamoste Îbrahîm Ehmed dikare Kongreya Neteweyî bide avakirin, ez piştgirî didim wî. Em dikarin piştgiriya ku ji bo xebatên Kongreya Neteweyî dixwazin pêşkêş bikin. Hatina van bi rêzdarî peşwazî dikim. Dîsa bawer dikim ku di van xebatên me de ji bo gelê Kurd çareserî peyda bikin. Pir xebat bû, pir ketin çêbûn; lê belê niha di van xebatan de serkeftina di hemû xebatên parçeyên Kurdistanê de nêzbûnê dibînim. Cejna we pîroz dikim xweşî û tendûristî daxwaz dikim.